



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstitûya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Masterê

DESTANA RUSTEMÊ ZAL
(METN-LÊKOLÎN)

Rojbir ÇALIŞIR

16711009

Şêwirmend

Dr. Shahab VALÎ

Mêrdîn 2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “*Destana Rustemê Zal (Metn- Lêkolîn)*” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezin/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

..../..../.....

Rojbir ÇALIŞIR

KABUL VE ONAY

Rojbir alıřır tarafından hazırlanan *Destana Rustemê Zal (Metn-Lêkolîn)*, 21.06.2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak oybirliđi / oyçokluđu ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

Doç. Dr. Mustafa Öztürk (Bařkan)

Dr. Öğr. Üyesi Ayhan Tek

Dr. Öğr. Üyesi Shahab Vali

KURTE

Destana Rustemê Zal di edebiyata Rojhilata Navîn de destaneke epîk e. Ji ber berbelavbûna van destanan, versiyonên wê yên cuda hene. Di edebiyata kurdî de jî li her deverê bi versiyoneke cuda ye. Ev xebata me de li ser versiyoneke Şahnameya Kurdî ye ku bi zimanê kurdî, bi zaravayê kurmancî û bi tîpên erebî hatiye nivîsin. Ji bo ku em hîkayeta Rustemê Zal wekî destan bi nav bikin divê em versiyonên wê yên cuda bizanibin. Ev xebat hewldanek e ji bo temamkirina versiyonên destana Rustemê Zal. Ji ber wê me ev metn transkirîbe kir. Di beşa yekem de wateya destanê û giringiya destanê di edebiyatê de çi ne me rave kir. Me ji aliyê naverok û rûxsarî ve nasandina destanê kir. Di beşa duyem de me wateya şahnameyê çi ye rave kir, di edebiyata kurdan de Şahnemaya Kurdî çi ye me diyar kir û ji aliyê naverok û şiklî ve me beyta Rustemê Zal nirxand. Me di beşa sêyem de jî elîfbeya transkirîpsiyonê diyar kir û metn ji bo elîfbêya Kurdî-Latînî transkirîbe kir.

Kurtebêje: Destan, Helbest, Epîk, Şahname, Rustem, Cihangîr

ABSTRACT

Stories of Rustemê Zal is a heroic epic in the Middle East literature. There are different versions due to spread of the epic and in the Kurdish literature, each region has different versions. This study is based on the version of the epic in Kurdish Shahname and is written in the Kurmanji dialect of Kurdish language and in the alphabet of Arabic. If the story of Rustemê Zal is considered as an epic, all versions should be known. For this reason, this study can be seen as an effort to complete the versions of the epic of Rustemê Zal. In this direction, the text of the epic used in this study is transcribed. In the first part of the study, both meaning and importance of epic in the literature are explained and the form and the content of the epic are described. In the second part, Shahname and Kurdish Shahname are described and the epic of Rustemê Zal is analyzed. In the third and last part, the alphabet which is based on transcription is written and the text of the epic is transcribed.

Keywords: Epic, Poetry, Heroic, Shahname, Rustem, Cihangîr

ÖZET

Rüstemê Zal (Zalođlu Rüstem) destanı Ortadođu edebiyatında yer alan epik bir destandır. Destanın çok yayılmasından dolayı deđişik versiyonları bulunmaktadır. Kürt edebiyatında da her bölgede farklı versiyonları bulunur. Bu çalışmamızda “Kürtçe Şahname”de yer alan bir versiyonuyla çalıştık. Bu metin Kürtçe dilinin Kurmanci lehçesinde Arap alfabesiyle yazılmıştır. Rüstemê Zal hikayesini destan olarak adlandırıyorsak bütün versiyonlarını bilmemiz gerekir. Bu çalışma Rüstemê Zal destanının versiyonlarının tamamlanması açısından bir çabadır. Bu yüzden bu metni transkribe ettik. Birinci bölümde edebiyatta destanın anlamını ve önemini açıklayarak şekil ve içerik açısından tanımını yaptık. İkinci bölümde ise şahnamenin ve “Kürtçe Şahname”nin tanımını yaptık, şekil ve içerik açısından Rüstemê Zal Destanı’nın beyitlerini değerlendirdik. Üçüncü bölümde ise transkripsiyon alfabesi ile birlikte metni Kürtçe-Latin alfabesine transkribe ettik.

Anahtar Kelimeler: Destan, Şiir, Epik, Şahname, Rüstem, Cihangir

NAVEROK

KURTE	III
ABSTRACT	IV
ÖZET	V
NAVEROK	VI
PÊŞGOTIN	1
KURTEBÊJE	3
DESTPÊK	4
A. Mijara Lekolînê	5
B. Armanc û Girîngîya Lekolînê	6
C. Sînor û Çarçoweya Lêkolînê	6
D. Rêbaz û Teknikên Lêkolînê	6
BEŞA YEKEM	7
1. Termînolojî û Derketina Cureya Destanê	7
1.1. Cureyên Helbestê	7
1.1.1. Helbesta Epîk	8
2. Destan	9
2.1. Dewra Destanê	12
2.2. Kevneşopiya Devkî	13
2.3. Bûyer	13
2.4. Hozan/Dengbêj	14
2.5. Tesbît	14
3. Ji Aliyê Naverok û Rûxsarî ve Taybetiyên Cureya Destanê	14
4. Edebiyata Destanî	17
5. Di Destanan de Têgeha Leheng/Qehreman	18
5.1. Derketina Rê	21
5.1.1. Bangawaziya Macerayê	21
5.1.2. Redkirina Bangawaziyê	22
5.1.3. Alîkariya Sersirûştî	23

5.1.4. Derbasbûna Ji Xetereya Ewilî.....	23
5.2. Kamilbûn.....	24
5.2.1. Rêya bi Azmûnan Tijî.....	24
5.2.2. Stendina Dilê Bav / Lêborîn	25
5.3. Veger.....	25
5.3.1. Reva Bi Sêhr	25
5.3.2. Derbasbûna Xetereya Vegerê	26
5.3.3. Azadiya Jiyanê	26
BEŞA DUYEM.....	28
2. ŞAHNAME Û ŞAHNAMEYA KURDÎ.....	28
2.1. Şahname.....	28
2.1.1. Şahnameya Kurdî.....	29
2.1.2. Beşa Mîtolojîk-Lehengî	29
2.1.3. Beşa Dînî.....	30
2.1.4. Beşa Dîrokî	31
2.1.5. Çîrokên Di Şahnameya Kurdî De	31
2.2. Danasîna Metna Rustemê Zal	32
2.2.1. Ji Aliyê Navrokê ve Danasîna Destana Rustemê Zal.....	32
2.3. Epîzodên Destanê.....	32
2.3.1. Pesindayîna Xwedê.....	32
2.3.2. Çûyîna Mazenderanê	33
2.3.3. Zewaca Rustem.....	33
2.3.4. Şerê Rustem û Dêw.....	34
2.3.5. Rasthatina Rustem û Dilêrekî	34
2.3.6. Şerê Welatê Bilxar	35
2.3.7. Ji Ber Nehatina Rustem, Zer'elî Dikeve Rê li Rustem Digere	35
2.3.8. Jidayikbûna Cihangîr	35
2.3.9. Şerê Şahê Tûran û Îranê.....	36
2.3.10. Şerê Evrasyab ji bo Îranê	36
2.3.11. Xweşkerekirina Cihangîr	40
2.3.12. Behsa Xewna Rustem li Bilxar	41
2.3.13. Vegera Rustem.....	42
2.4. Ji Aliyê Rûxsarî ve Danasîna Beyta Rustemê Zal	43

2.4.1. Wezn	43
2.4.2. Cure.....	43
2.4.3. Ziman/Şêwaz.....	43
2.5. Kesayetên Destana Rustemê Zal.....	44
2.5.1. Azade Mehre û Azade Çehre	44
2.5.2. Behreman	44
2.5.3. Bîjen.....	45
2.5.4. Cihangîr.....	45
2.5.5. Diya Cihangîr.....	47
2.5.6. Evrasiyab.....	47
2.5.7. Firamerz	48
2.5.8. Firuxşah.....	49
2.5.9. Gîw.....	50
2.5.10. Gûderz.....	50
2.5.11. Hûman.....	50
2.5.12. Key Kawis.....	51
2.5.13. Nerîman.....	52
2.5.14. Pîran	53
2.5.15. Rustem	53
2.5.16. Şahê Keyan	54
2.5.17. Şahê Luxan.....	55
2.5.18. Tûsê Newzer	55
2.5.19. Zal	56
2.5.20. Zerbekir.....	56
2.5.21. Zer'elî.....	57
2.5.22. Ziware	57
2.5.23. Kesayetên Din.....	58
BEŞA SÊYEM.....	59
3. TRANSKRÎPSİYONA BEYTA RUSTEMÊ ZAL	59
3.1. Elîfbeya Transkrîpsiyonê	59
3.2. Transkrîpsiyona Beyta Rustemê Zal.....	59
ENCAM	169

ÇAVKANÎ 170

PÊŞGOTIN

Destan bingeha cureyên edebî ne. Ji ber ku destan beriya nivîsê di nav gelan de bi awayê devkî dihate gotin. Dema ku gotinên devkî derbasî nivîsê bûn, wê çaxê derketina cûreyên edebî dest pê kir. Van gotinên rîtmîk di hişê hozan/dengbêjan de wekî qeydkirî bû û bi saya wan hozanan, çîrok û efsaneyên berê hatin nivîsîn. Yanê beriya van nivîsan gotin hebûn, çîrokên stranî hebûn. Lewma ew çîrokên stranî bingeha destanê ne. Ji ber vê destan di edebiyatê de muhîm e.

Em bi saya destanan taybetiya wî gelî hîn dibin û serdema destanê fam dikin. Di edebiyata kurdan de jî ev wiha ye. Ji ber ku destanên kurdan dereng derbasî nivîsê bûn hîn jî li cem kurdan çîrokên devkî ku derbasî nivîsê nebûne gelek in. Lewma lêkolînên di derbarê destanê an jî çîrokê de pir muhîm in. Me jî di vê xebata xwe de tîşteke ku nehatiye zanîn derxist holê.

Serenava xebata me Destana Rustemê Zal e. Ev destan metneke bi herfên erebî lê bi zimanê kurdî ye. Di Şahnaameya Kurdî de cih digire. Ev destan versiyoneke destana Rustemê Zal e lê ji versiyonên din cuda ye ji ber ku serlehengê vê du kes in; Rustem û Cihangîr. Di versiyonên din de Rustem serleheng e. Me xwest ev versiyona ku heta niha nehatiye zanîn derxin holê. Armanca me ev bû ku em vê versiyonê bi herfên latînî bidin naskirin û ji aliyê naverokî û rûxsarî ve vekolin. Me di beşa yekem de derbarê teoriya destanê de agahî dan, di beşa duyem de jî me destan ji aliyê neverokî û rûxsarî ve nirxand. Me di beşa sêyem de jî metn taranskrîbe kir. Di encamê de derket holê ku Rustemê Zal bi vê versiyona xwe de jî destaneke epîk e. Metna me bi herfên erebî hatibû nivîsîn lê zimanê wê kurdî bû ji ber wê jî me metna xwe rasterast transkîrîbe kir. Me herfên transkîrîpsiyonê bi kar anî ji ber ku hin dengên erebî di kurdî de nînin ji ber ve jî me ew diyar kir. Elifbêya transkîrîpsiyonê di beşa sêyem de cih digire.

Nivîskarê vê metnê ne diyar e lê berhevkarê wê Ebdullah Muhammed e û kesê ku vehandiye jî Mela Mistefa Oremarî ye. Di derbarê wan de agahiyên baş li ber destê me nînin. Heke derfeta me çêbû û em pey vê xebatê ketin em ê agahiyên derheqê van kesan de jî peyda bikin (heke neçûbin ber rehma Xwedê) û li ser vê destanê em ê agahiyên berfirehtir qeyd bikin.

Naskirina me ya bi vê metnê bi saya şewirmendê teza me çêbû ku me nizanîbû versiyoneke bi vî şiklî di Şahnameya Kurdî de hatiye nivîsîn. Ji bo vê em spasdarê şewirmendê teza xwe Shahab Vali ne. Ew bû sebep ku em vê metnê nas bikin û derxînin holê. Di vekolîna xebatê de zanîna xwe ji me kêr nekir û di maweya xebatê de bi sebr û sekaneta xwe şaşiyên xebata me bi me da rastkirin.

KURTEBÊJE

- amd. : Amadekar
b. : Beyt
bnr. : Binêrin
b.n. : Berhema Navborî
c. : Cîld
ç. : Çap
h. : Hicrî
h.b. : Heman Berhem
h.w.d. : Her wekî din
m. : Mîladî
r. : Rûpel
wer. : Wergêr
weş. : Weşanxane

DESTPÊK

Di edebiyata cihanê de girîngiya destanê mezin e. Ji ber ku hebûna destanan diçe heta beriya niştecihbûnê. Destanên wê demê ji bo mirovên îroyîn dibê neynik. Em bi wan destanan edebiyat, dîrok û çanda wî gelî hîn dibin. Neteweyên qedîm xwediyê destanên qedîm in. Lewma dewlemendiya destanên neteweyekê dewlemendiya çanda wê nîşan dide. Ji ber ku di destanan de mirov rastî hemû taybetmendiyên civakê û hêmanên çandî tê. Lê metnek an çîrokek ji bo ku bibe destan divê ji çend merheleyan derbas bibe. Ewîlî divê derbasî nivîsê bibe ji ber ku çîrokek an jî rîwayetek hîn derbasî nivîsê nebûbe ji orjinala xwe dûr dikeve û ev yek jî wê çîrokê weke cure ji destanê dûr dixê.

Destana Rustemê Zal bi mijara xwe ya qehremaniyê ve di edebiyata cihana Îranî û Kurdan de cih digire. Hikayeta Rustemê Zal di her deverê de bi versiyoneke cuda hatiye behskirin. Di xebata me de jî versiyonek cuda hatiye pêşkêş kirin ji ber ku metn zêdetir li ser lehengekî din rawestiyaye. Destana Rustemê Zal, di Şahnameya Firdewsî de jî cih digire lê ya kurdî û farsî ji hev cuda ne. Di edebiyata kurdan de jî di Şahnameya Kurdî de destana Rustemê Zal cih digire.

Di vê xebata me de em zêdetir ji aliyê giştî ve li ser nasandina metna Rustemê Zal sekinîn ku di kovara Vejînê de bi elifbêya ‘erebî lê bi zaraveya kurmancî hatiye nivîsîn. Armanca vê xebatê ew e ku metna Rustemê Zal a ku bi elifbêya erebî hatiye nivîsîn û nayê zanîn, bi elifbêya latînî û bi nasandineke giştî, li edebiyata kurmancî bide qezenckirin û destanê li gor têgehên teorîya lehengbûnê binirxîne.

Em behsa destanekê dikin lê dive em ewilî diyar bikin ku metna li ber destê me weke cure destan e an na. Helbet li gor lêkolînên heta niha hatine kirin Rustemê Zal weke destan hatiye bi nav kirin lê wekî me li jor diyar kir di vê xebata me de em ê li ser versiyoneke din a Rustemê Zal bisekinin. Ji ber vê jî me ewilî analîza metnê kir ku ji vê versiyonê re, wek cureyeke edebî gelo em dikarin çî navî lê bikin. Loma jî di beşa yekem de me teoriya destanê rave kir û metna Rustemê Zal li gor erkên teoriya destanê analîz kir. Di vê xebatê de mijar, armanc, girîngî, sînor û rêbaza lêkolîne li jêr hatine diyarkirin.

Me di beşa yekem de termînolojîya cûreya destanê û helbestê diyar kir. Taybetiyên destanê ji aliyê naverok û rûxsarî ve çî ne, me pênase kir. Herwiha ccureyên helbestê yên wekî lîrîk, dramatik û epîk jî me rave kir, ji ber ku xebata me li ser destaneke epîk e. Destan çawa derketiye û helbesta epîk çawa bi demê re bûye destan û penaseya destanê çî ye me

diyar kir. Taybetiyên destanê çî ne bi xelean me ji hev cuda kir. Ji ber ku em taybetmendiya destanê diyar bikin wê di nasandina xebata me de hewce bibe. Edebiyata destanî çî ye û di destanan de leheng çawa ava dibin me rave kir.

Hikayetek ji bo ku bibe destan divê ji hin êwran derbas bibe. Ji wan êwran yek jî dewra destanî ye. Destan divê di serdemeke destanî de ava bûbe. Ji ber vê jî me di bin serenava “edebiyata destanî” de behsa van êwran kir. Di erkên destanê de lehengê sereke pir girîng e ji ber we jî me teorîyên li ser leheng diyar kir. Li gor teoriya Joseph Campbell jî derbasokên leheng çawa ne wekî nav me diyar kir û lehengê destanê Rustem, me li gor vê teoriyê analiz kir.

Di beşa duyem de pênasekirina şahnameyê hatiye kirin û di derheqê Şahnameya Kurdî de agahî hatine dayîn. Metn hatiye nasandin hem ji aliyê naverokê ve û hem jî ji aliyê rûxsarî ve. Di serenava “şahname”yê de me pênaseya vê cureya edebî kir, giringiya wê, behsa wan şahnameyan kir ku negehiştine roja me. Ji ber ku destana em li ser dixebitin di şahnameyekê de cih digire. Di Şahnameya Kurdî de jî me Şahnameya Kurdî çî ye û çima nehatiye zanîn û di derbarê çîrokên Şahnameya Kurdî me agahî dan. Danasîna metna Rustemê Zal de me ev metn ji ku peyda kir, nivîskarê wê kî ye, me diyar kir. Di nasandina naverokê de li gor xwendina xwe me epîzodên wê diyar kirin û ji aliyê rûxsarî ve jî me ji wezn, cure û zimanê metnê analiz kir. Ji bo destan baş were famkirin me kesayetên destanê yek bi yek da naskirin.

Di beşa sêyem de ewilî elifbêya transkîrîpsiyonê hatiye diyarkirin, paşê jî transkîrîpsiyona metnê hatiye dayîn. Me elifbêya transkîrîpsiyonê bi kar anî ji bo ku dengên di kurmancî de nînin diyar bibin û di xwendina de em ji orjînalê metnê dûr nekevin.

A. Mijara Lêkolînê

Mijara lêkolîna me li gel transkîrîpsiyona metna Rustemê Zal, nasandin û pênasekirina destanê ye. Di xebata me de nasandina metna Rustemê Zal hatiye kirin. Rustemê Zal ji ber ku destanek e, me ewilî termînolojîya destanê rave kir. Her wiha helbest çawa derketiye, çawa dabeş bûye û çawa erkên epîk hilgirtiye, me rave kir. Di edebiyata kurdan de destan bi çanda devkî ve dom kiriye paşê derbasî nivîsê bûye. Çawa ku me diyar kiriye destana Rustemê Zal di Şahnameya Firdewsî de jî derbas dibe, di Şahnameya Kurdî de jî derbas dibe. Ji ber vê mijara lêkolîna me de beşek bû nasandina şahnameyan.

B. Armanç û Girîngîya Lekolînê

Armanca vê xebatê nasandina versiyona beyta Rustemê Zal e ku di Şahnameya Kurdî cih digre. Ev beyt bi elifbêya erebî lê bi zimanê kurdî hatiye nivîsîn. Ev versiyon nayê zanîn û li tu derê latînzeya wê nehatiye kirin. Ji ber vê ev xebat di temamkirina versiyonên cuda yê destana Rustemê Zal de dibe çavkaniyek. Li ser vê versiyonê xebateke nasandinê jî nehatiye kirin. Ev xebat hem latînzekirin û hem jî nasandina beytê ye.

C. Sînor û Çarçoweya Lêkolînê

Teza me bi beyta orjînal a Rustemê Zal a ku bi elifbêya erebî lê bi zimanê kurdî û zaravayê kurmançî ve sînardar e. Me di vê çarçoweyê de ji bo nasandinê destan û termînolojîya destanê -bi sînokirina helbest ji ku derketiye- û destan çawa hatiye pêş ketiye me xebata xwe sînardar kir. Taybetiyên destanan û edebiyata destanî çawa ye me rave kir. Şahname; ji ber ku beyta ku em li ser xebitîn di Şahnameya Kurdî de cih digire, me nasandina şahnameyê kir û Şahnameya Firdewsî û ya Kurdî nasand. Beyta Rustemê Zal; Em girêdayî orjînala beytan de man û ji bo elifbêya transkripsiyonê me hin tîpên ku di kurmançî de ew tîp nînin wekî dengên erebî, me destpêka beşa transkripsiyonê de diyar kir.

D. Rêbaz û Teknîkên Lêkolînê

Derbarê pênaseya destanê û transkripsiyona metnê de rêbaza me bikaranîna çavkaniyên yekem e. Ji ber ku beyt bi zîmanê kurdî bû, ev ji bo me rehetiyek bû, me rasterast beyt latînzê kir. Tenê elifbêya transkripsiyonê me bi kar anî. Ew jî ji bo tîpên di kurdî de nînin, diyar bikin. Epîzodên beyte me li gor zanîna xwe dabeş kir. Me her beyt bi hejmarekê bi nav kir.

BEŞA YEKEM

1. Termînoloji û Derketina Cureya Destanê

1.1. Cureyên Helbestê

Xebatên di sedsala 19emîn de hatine kirin, senifandinek ji bo cureyan tevî xwe tîne: “epîk”, “lîrik” û “dramatîk”. Lêkolîn bi giştî li ser van sê cureyên bingehîn tên kirin. Tesnîfa yekem a li ser cureyan Goethe kiriye. Hikayetên ku rasterast çîrokê rave dikin wek “epîk”, yên bi coş û kelecânî wek “lîrik”, yên ku rola çalakbûnê di xwe de di hewînê jî wek “dramatîk” bi nav kiriye. Paul jî epîk wek ravekirina demên borî, lîrik wek helbesta îroyîn, dramatîk jî wekî nîşankirina dahatûyê bi nav kiriye. Ev navlêkirin, wateya dabeşkirina dîroka mirovahiyê û pêşveçûna wê ye.¹

Senifandina cureyan me digehîne fikreke giştî lê pîrsa bingehîn ew e ku ev her sê cure ji çi derketine? Pospelov behsa nebûna berhemên weke îroyîn dike di demên berê de ango berî ku hişmendîya civakê çêbe, di demên prîmîtîf de ev berhem derketine meydanê. Di wan çaxan de berhemên hunerî ravekirinên fantastîk ên civakê girêdayî nêrinên mîtîk û sêhrbazîyê bûn. Binavkirina rewşên ku dijberî hev in lê ji aliyekî din de jî ji yekbûna dijberîyan re “sînkretîzm” tê gotin. Li gor Pospelov berhemên dema prîmîtîf ji hêla hunerî ve sînkretîst in.² Gava ku di nav mirovan de niştecihbûn çênebûbû mijûlbûna wan bi gelemperî bi axê re bû mirov girêdayî xwezayê bûn, xweza weke mirovekî li hemberî xwe muxatab digirt, tevî vê jî ji tîrsa xwezayê bi rîtuelan ew dikirin tişteke pîroz. Di vê çaxê de berhemên derbûyî hevaheng in bi sînkretîstîkê re. Bi giştî pêşandanên sêhrî û dansî dibûn çareyên linehevkirina bi xwezayê re. Ev taybetî weke rêçîka totemîzmê jî be bi pêşveçûna ziman, yekem car dibin avakirina meselokan (tale) di derbarê xwezayê de. Pêşveçûna mijûlbûna bi axê re êdî fikrên mirovan ên di derbarê sêhr û fantastîk de jî diguherin. Êdî

¹ Gürsel Aytaç, *Genel Edebiyat Bilimi*, Weş. Say, İstanbul 2003. 56-61. bnr. Goethe-Schiller, “Epik ve Dramatik Şiir Hakkında”, (Wer: Melahat Özgü), *Millî Eğitim Bakanlığı Tercüme Dergisi*, IX (100-102), Ankara, Ocak Haziran. 1949. Cemal Köprülü, “Epik Şiir ve Epopeye Dair”, *Varlık*, Hej: 162, Nisan 1940

² Gennadiy Pospelov, *Edebiyat Bilimi*, (Wer: Yılmaz Onay), Yay. Evrensel, İstanbul, 2005, r. 59-61

daxwazên mirov li ser hatina biharê, xêr û bêra ji erd û bexçe û garanên xwe, daxwaza serkeftûbûna ji êrîşên cîran û derdora xwe dikirin.³

Rîtuêlên sêhrî berî avêtina biziran ji bo axê û derxistina garanên a mêrga, dibin dans an jî lîstikên beriya şer. Ev dansên ayînî bi stranên bêgotin çêdibin û danseke bi gelek kesan ve tê lîstin û bi rîtmekê re dewam dikin. Di destpêka cureya epîkê de bi vê vegotina rîtmîk sînoren cureyan jî ava dibin. Di serî de, ev stranên ayînî, tenê ji koroyeke ne piştê dibin stranên ravekirina xwestek û armancan. Paşê hundirê wê tê firehkirin û bê koro dibin straneke soloyî û bi coş tîn ravekirin. Piştê jî pîvanên ayînî derdikevin meydanê, taybetiyêke hunerî hildigirin û cureya lîrikê ava dibe. Dîyalogên nav koroyê cureya dramê û destpêka koroyê jî dibin çavkaniyên stranên epîkî. Yanê epîk seranser ravekirina stranî ye îlhama xwe ji dansên leşkeran hildigire. Piştî van dansên girseyî, rêberekî qabîleyê ji bo ku serkeftinên şerên leşkerî pêşkeş bike stranên pêşkêşiyê dide destpêkirin ev jî rasterast çavkaniya epîkê ye.⁴ Piştê stranên destpêkê ji aliyê stranbêjan ve tîn gotin. Van stranbêjna di cureya epîkê de zimanê mecazê lê zêde dikin hin deman bi totemekê re an jî bi lehengekî derasayî re stranê dikin qalibêke lehengî. Li dora vê qalibê jî kesên bi navê ‘rapsod’ (hozan) hin bûyerên girîng jî lê zêde dikin bi vê jî kom û zincîreke stranan ava dibe. ‘Bi vê jî bi navlêkirina Yewnanên kevin ‘epope’ stranên epîk ên ayînî’ ava dibin.⁵

1.1.1. Helbesta Epîk

Yekem berhema poetîk *Poetika* ya Arîstoteles e. Li gor Arîstoteles hebûna hunera helbestê girêdayî du tiştan e ku di xwezaya mirovan de hene. Yek ew e ku di mirovatîyê de bivênevê taybetiya teqlîdkirinê heye, ev ji bo herîkîna jiyana mirovan girîng e. Ya duyem jî hezkirina wan berhemên teqlîdî ye. Mirov bi qabiliyeta teqlîdê re, rîtm û pêşvebirina wê harmoniyê re ewilî gihaye destanan; di dema teqlîdê de elimiyê çîroksaziyê ji vir jî hunera helbestê ava kiriye.⁶ Van helbestên bi rîtm û pîvan re ‘hymnos’ tê gotin. Hymnos, ew helbestên olî ne ku ji bo rêzgirtina Xwedayan, bi afirandina rahîban tîn çêkirin. Afrînerên hymnosan, helbestvanên yekem in, heman demê de rahîb jî “aoîdos” in.⁷ Helbest yekem car di şerê Trûvayê de ji hakimiyeta kesên olî derdikeve, êdî hozan li cem temayên olî, temayên

³ Pospelov, h.b. r. 63

⁴ h.b. r. 215

⁵ h.b. r. 64-65

⁶ Aristoteles, *Poetika*, (Çev: İsmail Tunalı), Yay: Remzi Kitapevi, İstanbul, 1998, r. 17-20.

⁷ Emel Kefeli, *Metinlerle Batı Edebiyatı Akımları*, Yay 3F, İstanbul, 2007, r. 20.

qehremaniyê jî dibêjin. Lewra piştî aoidosên olî ‘rhapsodos’ derdikevin. Hozan dest pê dikin, bajar bi bajar bi çokên destên xwe re helbestên qehremanîyê bi rîtm û pîvan dibêjin.⁸ Aristoteles dinirxîne ku van berhemên ku bi ravekirinê çêdibin weke epos û epopeyên ji epîkê dertên; weke cure pişta xwe dide ravekirinê, hem bi keresteyî hem jî firehbûn, dirêjbûnê ve cureyeke pîvanî ye. Jixwe cudahiya epopeyê ji trajêdiyê bikaranîna pîvana “heroîk” e. Ev pîvan ji kêteyên yek dirêj, du kurt û ji şeş kirpan ava dibe. Ji bilî vê, pîvanek nikare bibe pîvana eposê, dibêje Arîstoteles; pîvana “heroîk” ji nav pîvanan ya herî bi rîtm e û ji bo çîroksaziyên bi deng û mecazan li hev hatiye.⁹

Arîstoteles sînorên cureya epîkê bi girêdana dîrok-qehremanî diyar kiriye û gotiye ku dema epîk tê gotin ya ku ez fam dikim; mijareke ji aliyê keresteyan ve pir fireh e. Eposê de beş teko tek, ji dirêjahiya helbestê de dikarin direjahiyekê ava bikin.¹⁰ Ev gotinên wî di edebiyata dinyayê de destpêka pênaseya rê û rêbazên helbesta epîk in. Lewra berhemek ji bo ku bibe destan, divê pişta xwe bide lehengekî xurt, divê dirêj be, bi pîvan be û bi çîroksaziyê re lihevhatî be. Ev rêbaz weke bûne şertên sereke û sînorên epopeyê -lewra yên destanê jî-hatine diyarkirin. Bi demê re ji vê pênaseya Arîstoteles re nerazîbûn tên nîşandayîn û forma helbestê û wateya wê tê guherandin.

Têgehên helbesta epîk, destan, epos, epope li şûna hev hatin bikaranîn. Sedema neguncavbûna pênaseyê ew e ku, helbesta epîk ji bera berê de heye û helbestvan ji ewila ewil de dev ji epîkê bernedane. Epîka ku gûncavbûna wê nemaye, tevî vê hem ji aliyê cure hem jî ji aliyê hebûna wê ya dîrokî ve cihekî mezin digire. Maruf Xeznedar jî gava ku behsa epîkê dike wê dike du beş. Behsa beyt û çîrokeşîr (destan mesnevi).¹¹

2. Destan

Bêjeya destanê tê wateya efsane, mesel, hikayetê. Destan bêjeyeke farsî ye. Em dikarin bibêjin destan ew berhem e ku bûyerên wekî lehî, şewat, şer, erdhej û koçberiyê di nav xwe de dihevine ku di hişmendiya civakê de cihekî girîng digirin. Destan ji cureyên edebiyata devkî ye û bi piranî qehremanî, temaya sereke ya destanê ye. Bi piranî menzûm in lê carna wek pexşan jî tînen nivîsandin. Car caran hem menzûm hem jî pexşan tînen nivîsandin.

⁸ h.b. r. 20.

⁹ Aristoteles, h.b. r. 21-70.

¹⁰ h.b. r. 53.

¹¹ Xeznedar, Maaruf, *Mejuuy Edebi Kurdî, Bergî Yekem, Dezgayê çap. Belawkirdineweyî Araz, Hewler, Çapî Duyem, 2010, r.191.*

Bûyerên mezin ên ku di hişmendiya neteweyan de cihekî girîng digirin, dibin mijara destanê. Ev mijar bi devê dengbêjan bi awayekî menzûm bi salan tèn gotin û êdî dibin malê gel.

Destan di nava demê de li ser erdnîgariya welat belav dibe. Destan cureyekî wêjeyî ye, lê belê amrazê xwe ji dîrokê distîne. Di navbera destan û dîrokê de têkîliyeke xurt heye. Ji ber ku destan ji dîrokê dest pê dike, xwe dîsa dispêre van bûyerên dîrokî. Em dikarin ji destanan dîrokê hîn bibin. Destan ji bo jiyana civakê dibin çavkanî. Bi saya van destanan em dikarin rihê serdemekê, baş fêm bikin. Herçend destan ji bo dîrokê bibe çavkanî jî, em nikarin ji van destanan re bibêjin sedî sed çavkaniyên sereke ne. Ji ber ku destan her dem wek xwe namîne, bi bihurandina salan destan jî diguherin û nû dibin.¹² Di van bûyerên dîrokî de bi piranî qehremanî heye, lehengên sereke li ser navê gel têdikoşin û dema bi ser kevin jî wek ku gel bi ser dikeve.

Li gor lêkolînerên edebiyatê divê di destanan de şexsek girîng hebe ku bala mirovan bikşîne û şexsên duyemîn jî divê diyar bibin ku destan bi ravekirina helbestkî biherike û bi epîzodan muhtewayekê çêbike. Li gel van divê ziman bi nezmê ve dewlemend be, hîs bi qawet be ku rihê wê serdemê baş bê zanîn. Destan li gor avabûnê di du gruban de tê lêkolînkirin; tebî'î û sûnî. Li aliyekî din jî destanên ku di hafîzeyaya mirovan de cih girtiye û tenê behsa bûyerên neteweyekê dikin jî wekî destanên neteweyî tèn pênasekirin.¹³ Mirov di serdema çaxa ewil de di encama nezanîna sedemên hin bûyerên civakî de, ber bi baweriyekê ve diçin û mîtos (mythos) yanê efsane ava dibin.¹⁴ Di destanan de şexsên girîng taybetiyên îlahî di xwe de dihewinin lê ji aliyekî din de jî qedera însanî di nav xwe de dihewinin. Ev taybetî 'emrê destanê dirêj dike. Bi vê encamê re destan li gor avabûnê di sê grûban de tê analîzkirin.

1. Zayîn: Di şî'ûra neteweyê de hin bûyerên bi bandor dimînin û di van bûyeran de hin leheng bi qehremaniya xwe ve tèn ber çavan.

2. Belavbûn: Bi saya lêzêdekirina hin bûyer û hin qehremanan, ji heremekê ber bi heremeke din belav dibin.

3. Nivîsîna Wan: Di vê serdemê de yekî hafîzeyaya wî xurt derdikeve û destanê dixê nav şîklê nezmê.

¹² Pertev Naili Boratav, *Halk Edebiyatı Dersleri*, Tarih Vakfı Yayınları, İstanbul, 2011, r. 28.

¹³ Kazım Yetiş, "Destan", *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi* (İstanbul: TDV Yayınları, 1994), 9: 202.

¹⁴ Yetiş, "Destan", 9:202.

Di edebiyata Îraniyan de destan ji du qîsman pêk tê. Îranî berê bi Hîndûyan re neteweyek bûn, paşê ji hev vediqetin. Ji ber vê dibin du beş.¹⁵ Îranî beriya mîladê di salên 1400î de ji bo hakimiyeta xwe mezin bikin, bi mirovên bajarên wekî Soxd, Merv, Herat û Kabîl re şer kirine. Ev şer piştê dibin wekî şerên bi dêwan re hatine kirin. Bi van şeran destanên herêmekê derbasî herêmeke din dibûn. Ji ber ku derbasî herêmeke din dibin, bi têsîra ol û derdorê, dibin destanên cuda cuda. Bo nîmûne kûrê Tahmuras Cem an Cemşîd di destanên Îranî de weke mucîdekî tê naskirin lê di destanên Hîndûyan de Yem (Yîma) Xudayek e û bavê wî Vîvasvent e (Vîvanhant).¹⁶

Heta serdema Aşkanîyan (Part), destanên Îranî bi mîtolojî û bûyerên dîrokî ve tije ne. Di dawîya Partan de destan hindik hindik tîr nivîsandin. Di dewama wan de Sasanîyan bêtir bala xwe dan destanan. Sasanî, li aliyekî ji bo dînê Zerdeştî dîsa belav bikin Avestayê dixin nav pergalekê, li aliyê din jî ji dewletên cîran re welatparêzîya xwe nişan didin û destanên xwe bi awayekî nivîskî tomar kirin. Gotegotên heya wê demê belav bûne jî derbasî Avestayê dibin. Çawa ku hin qîsmên Avestayê hatibin dîtin jî bi istilaya Ereban, Avesta cara duyem belawela bûye. Tevlî vê jî di avabûna destanên Îranî de bandora Avestayê berbiçav e.

Beşên Avestayê yê bi vê re eleqedar in beşên Yesna û Yeşt in.¹⁷ Bi taybetî di fesla 9ê de hinek nav hene ku di *Şahnameya* Firdewsî de derbas dibin, wekî; Cemşîd, Dehak, Ferîdun, Gerşasb, Nuder, Agrîras, Efrasiyab, Sîyavuş û Camasb. Lê di navbera hin şexsiyetan de cudatî hene. Bo nîmûne di *Şahnameyê* de Geyumert hikumdar e lê di Avestayê de mirovê ewil e. Di vê beşa Avestayê de ji Geyumerdê heta Gerşasb xanedanên Îranî û biyanî di rîwayetan de cih digirin. Van destanên ku derbasî nivîsê bûne di dawîya dewleta Sasanîyan de elaqeyek mezin dîtiye û navên lehengan di nav gel de belav bûye. Piştî van tespîtan Ereban jî eleqeyek mezin nişanî van destanan didin û wan werdigerînin ser zimanê erebî. Di van rîwayetan de hin cudatî û hevşîbî jî çêdibin. Bo nîmûne avakerê xanedana Axamenî, Kuroş ji aliyê bazekî ve tê mezin kirin, Bavê Rustem, yanê Zal, ji aliyê teyrê Sîmurx ve tê mezin kirin. Avakarê Sasanîyan Erdeşîr-î Bîbekan jî ji aliyê şivanên xwe ve hatiye mezin kirin.¹⁸

¹⁵ Yazıcı Tahsin, "Destan", *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi* (İstanbul: TDV Yayınları, 1994), 9: 205

¹⁶ h.b. r. 206

¹⁷ h.b. r. 206

¹⁸ h.b. r. 206

Ji bo destanên kurdî xaleke girîng ew e ku destan bi piranî ji hêla dengbêjan ve hatine gotin. Dengbêjên navdar jî di dîwanxaneyên mîr û began de destanên xwe vedibêjin.¹⁹ Ji ber ku ev dengbêj, dengbêjên mîr û began bûn helbet car caran bandora wan mîr û began li ser destanan çêdibû. Destan wêjeya devkî ye û xwedî tapoya anonîm e. Bi piranî bingeha xwe ya çêbûn, dîrok, cih û şexsan wenda dikin. Di nav demê de kanên sîyasî û civakî, pêşkêşiya qerekeran, dewlemendiya zimanê kesên ku berhemê îcra dikin, bandorê li destanê dikin û bi karîgeriya wan hin guhertin di berhemê de pêk tên. Her çend em ji destanan re bibêjin ew berhemên gelêrî ne (anonîm) jî ya rast, ev yek rasterast bi statûya mîr û began ve girêdayî ye ku ew dengbêjan navdar dikin û piştevaniyê li wan dikin.²⁰

Wekî me li jor diyar kir destan ji kevneşopiya devkî tê lê ji bo ku em behsa destanekê bikin divê di destê me de ‘metneke edebî’ hebe. Xwedîlêderketina kevneşopiya devkî û ya destanê cuda ye. Weke metneke edebî destan ji bo ku bigihije destê me, divê ji çend xelean derbas bibe. Ji lêkolînên ser destanan em digihijin pênc xelean.²¹

2.1. Dewra Destanê

Dema ku destanek bê afirandin divê ew civak di dewra destanê de bijî û ew dewr bi mîtolojîyê re eleqedar be.²² Di edebiyata kurdan de jî dewreke destanî hebû. Êwra yekem a destanê, serdema ewil ên mînakên helbesta epîk in. Di vê serdemê de destan di nava edebiyata devkî de ava dibe û derbasî nivîsê bibe jî serdema ragihandina ravekirinê îfade dike. Di vê êwrê de destan, pir dirêj, çîrokî, aîdî çalakkûnekê, sersiruştî, teswîrî, ‘esîl e û ji dil e, ji bêsamîmîyetê dûr e.’²³

Rustem gotê: Ey şumê bedkar

Nav û nîşanê Xûdê keme ’îzhar (b. 118)

¹⁹ Amir Hassanpour, *Kürt Medya Kültürünün Yaratılması*, di nav Philip Kreyenbroek, Christine Allison, *Kürt Kimliği ve Kültürü*, Avesta, İstanbul, 2008, r. 83

²⁰ H. Mem, *Rastiyên Destana Memê Alan*, Weş: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2006, r. 54

²¹ M. Oğuz Öcal, ‘Destan Tanımı ve Eski Türk Destanları’, *Milli Folklor*, 2004, h. 62, r. 7

http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/m_ocal_oguz_destan_tanimi_eski_turk_destanlari.pdf

²² M. Oğuz Öcal, h.b. r. 7

²³ Dilek Çetintaş, *Yeni Türk Şiirinde Destan*, Teza Neçapkirî, Erzurum, Zanîngeha Atatürk, Enstîtuya Zanîstên Civakî, 2012, r. 7

Navê te çî ye 'ey dêwê na pak

Hizar wek tu min sipartine ber xak (b. 119)

Di beytên jor de jî em dibînin dêw diaxive û weke mirovan bi kesekî re şer dike. Ev taybetiyên sersirûştî di destanê de gelek in.

2.2. Kevneşopiya Devkî

Civakek ji bo destanekê ava bike divê kevneşopiyêke devkî parastibe û divê bikaribe wê kevneşopiyê nifş bi nifş veguhêzîne.²⁴ Edebiyata kurdan jî ev kevneşopî bi riya dengbêjan parastîye. Beriya nivîsê mirovan, raman, bawerî, teswîrên xwe yên di derbarê rabirdû û dahatûyê de li gor baweriyên wê demê, bi riya formên vegotinê dianîn ziman. Ev formên vegotinê, iro wekî mîtos, efsane, destan, çîrok, pêkenok, mamik, stran, gotinên pêşyan, lawik û lorik tên binavkirin.²⁵

Bi saya çanda devkî destanên kurdî nifş bi nifş hatine veguhastin. Di serdema nivîsê de ev berhemên devkî hatine nivîsîn. Çanda devkî ya kurdan bi salan bûne “bîr”a civaka kurd. Di edebiyata kurdî de jî destanên wekî Rustemê Zal, Memê Alan, Dewreşê Evdî û hwd. bi saya çanda devkî hatine neqilkirin. Di van destanan de li ser dîrok, ‘adet, tore û kevneşopiya kurdan, gelek agahî hene.

2.3. Bûyer

Divê bûyereke wisa biqewime ku civak di bin bandora wê de bimîne. Ev bûyer dikare bibe serkeftinek an jî têkçûyînek. Di destana Rustemê Zal de Rustem ji bo welatê xwe şer dike. Welatê Îranê û Tûranî şer dikin. Ev dibe mijara destanekê.

'Evrasiyab şah padişayê Tûran

Leşkerî 'îna bû ser xakê 'Îran (b. 416)

²⁴ M. Oğuz Öcal, “Destan Tanınımı ve Eski Türk Destanları”, *Milli Folklor*, 2004, h. 62, r. 7

http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/m_ocal_oguz_destan_tanimi_eski_turk_destanlari.pdf

²⁵ Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanên Zanîngeha Artukluyê, Mêrdîn, 2013, r. 12

2.4. Hozan/Dengbêj

Mijar her çî be divê hozanek wan meseleyan bike berhemeke edebî. Divê bûyerê bike şiklekî destanî û nîfş bi nîfş veguhêzîne.²⁶ Dengbêj vebêjerek e ku bûyer û qewimînên bandoreke giran li ser civakê kirine, bi awayekî hestiyar û estetîk, pêşkêş dike. Li gor Mehmed Uzun, dengbêj, ew hosta ye ku pîşe û cih û warê wî deng e. Dengbêj kesê ku kelimê dike kilam e, dibêje û vedibêje.²⁷

Di edebiyata kurdan de dengbêjî pir pêşketî ye. Ji ber ku çanda nivîskî dereng dest pê kiriye di nav kurdan de. Lewra destanên kurdan weke çavkaniyeke çanda devkî ye. Em bi riya wan destanan şertên wê serdemê analîz dikin. Dengbêjî bûye weke ferhengeke zimanê çandî ya dewlemend. Bi saya destanan, kurdan dîrok, hişmendî û kevneşopiyên xwe winda nekirine.

2.5. Tesbît

Civak berî ku dewra destanê biqedîne divê wan meseleyên xwe derbasî nivîsê bike. Piştî dewra destanê derbasî nivîsê bibe, erkên destanê wenda dibin. Hikayeta tirkî a Dede Korkut di sedsala 15ê de derbasî nivîsê bûye lê ev hikayet piştî di sedsala 20ê de hatiye sererastkirin û di hin cihan de weke çîrok, di hin cîhan de jî weke çîrçîrokê hatiye nivîsîn. Lewra ji bo ku tespîta cureyekê bê zanîn divê pêşî em binerin kengî hatiye nivîsandin, rastkirin an jî guherandin tê de hene an tunene. Ji ber vê tespît girîng e.²⁸

3. Ji Aliyê Naverok û Rûxsarî ve Taybetiyên Cureya Destanê

Di naveroka destanê de divê lehengek hebe ku temsîla civakê girtibe ser xwe û bi wî kesî re bûyerên civakê hatibin ravekirin. Ji aliyê demê ve destan, girêdayî rabêja raveker e. Dem ne sînorkirî ye. Hin caran di dema destanê de pengizîn çêdibe. Ji bo mezinbûna leheng

²⁶ M. Oğuz Öcal, h.b. r. 7.

²⁷ Mehmed Uzun, *Dengbêjlerim*, weş. Gendaş, İstanbul, 2005, ç. 6, r.11.

²⁸ M. Oğuz Öcal, h.b. r. 7.

divê pengizîn çêbibin, çaxa zaroktiyê zû zû derbas dibe. Bi du-sê rûpelan demeke dirêj tê nivîsîn. Leheng di kîjan rewşê de çalak nebûbe, ew dem zûzûka tê borîn.

Di destanan de dem, bi pergala kronolojîk dewam dike. Ji bo ravekirina tiştêkî, çîrok tê sekinandin û veqer dest pê dike. Di heman demê de destana devkî de tim nediyariyek hakim e.

Di bikaranîna destanê de mekan ne nîşankirî ye, erdnigariyeke giştî heye. Destan ji bo peyamekê bide mirovan tê nivîsin lewra mirovên di demên cuda û mekanên cuda de dema bixwînin, hewceyiya nenîşankirina mekanê derdikeve holê. Destan berhemên dewra mirovên girêdayî xwezayê ye, lewra di çîrokan de erdnigariyek fireh çiya, rûbar, derya û hwd. hene û teswîrên mekanaan xwezayî ne.

Di destanan de hejmara kesan zêde ne. Di qaîdeyên ravekirinê de berê balê dikşîne ser leheng, yê din jî li dora leheng dicivin. Lehengên li dorê weke tîp xuya dibin. Derûniya wan li gor dijberiyên tê lidarxistin.

Di destanan de çalakiyên leheng di pêşiyê de ne. Ji bo çîrok di bîra kollektîf a gel de zindî bimîne, çanda devkî lehengekî ava dike. Herwiha ji bo bîranînên lehangên zindî bimînin, tîpan ava dike. Di helbesta epîk de leheng, mirovê çalakiyê ye, qet derûniya wan a rûhî nayê lêkolîn. Ji ber vê jî hîsên leheng di qalibekê de ne. Heger hîsên leheng bi kûrayî bê ravekirin, ew beş beşa armancên leheng in. Her dem pesna leheng di pêşiyê de ye, peyva lehengê qehreman tu car jî bo kesên nebaş nayê gotin.

Di kevneşopiyê de pesn pir bûn lê niha mirov bixwîne dibe ku pir mubaxeyî bîn. Lêbelê pesn di dema têkoşînê de perçeyê çanda devkî bû wekî; baş-nebaş, fezîlet-qisûr, xain-qehreman û hwd... Leheng divê ji kesên din zanetir be, taybetî di şiyarên şervaniyê de.

Ewîl em behsa qaîdeya destpêkê û encamê binerin em ê bibînin ku çîroka destanê ji nişka ve dest pê nake û naqede. Di destanan de hewceyî beşên vekirinê û girtinê heye. Çîrok di destpêkê de sekan û bê coş e, paşê coş bilind dibe. Di encamê de jî bûyer tê famkirin û dîsa coş kêmbê dibe. Bi giştî di destanê de prologek (amadekirin), gewdeyek û epîlogek (encam) heye. Di beşa amadekirinê de hinek gotin û rabêj hene ku tu têkiliya wan bi bûyeran ve tune. Di beşa gewdeyê de metna esas tê ravekirin, ji xwedêdayîna leheng heta têkoşînên wî çîrok bi coş e. Di encamê de bûyer diqedin, her tişt diyar dibe.

Di ravekirinê de monotonî jî qaîdeyê din e. Cureya destanê her tim monoton e. Di qaîdeya mantiqa ravekirinê de jî tiştên awarte divê bîn bawerkin. Ravekirina razberî divê

bi mentiq be, ev jî bi binhişiyê ve tê girêdan. Binhişiya mîtik û sêhrî qaîdeya sereke ava dikin, lewra destan bi awartebûna xwe, baweriyekê jî di nav xwe de dihewîne.

Qaîdeyeke din jî dubarekirin e. Ji bo ku tansiyona bûyeran nekeve tim dubarekirin heye. Bi saya vê valahiyên ravekirinê tînen tijekirin. Ev dubarekirin, piranî bi hejmara sê'yê çêdibe.

Di sahneya mezin a tabloyî de -ev jî qaîdeyek e- çîrok digihije asta herî bilind. Leheng û hespê xwe bi dijmin re rû bi rû dibin. Qaîdeyeke din jî balkişandina leheng e, di vir de çîrok divê tim li dora leheng be. Bi taybetî jî di destanên dîrokî de ev heye. Di destanekê de du qehreman an jî leheng divê nebin. Îlleh divê ji nav wan her du lehengan yek serleheng be. Destan bi çîroka wî dest pê dibe lewra ew lehengê herî girîng e.

Di destanan de her tim baş û nebaş, rast û çewtî dijberî hev in. Ev jî qaîdeya dijberiyê ye. Esasê destanê piştî xwe dide ravekirina piştî encamê. Raveker xwe tevî bûyeran nake, vegotin bi dema borî dibe. Taybetiya raveker ew e ku, weke bîranînekê bûyerê rave dibe.²⁹ Di vir de raveker her tiştî dizane û weke şahidiya wan kiribe rave dibe, ev jî objektîfîyê dide destanê.

Di dema derketina destanê de ev cure di şûna helbesta dirêj de dihat binavkirin. Bivênevê destan divê dirêj bin, lewra bi qabiliyeta raveker re bandora wê zêdetir dibe. Di dema modern de ev dirêjbûna destanan jî diguherin. Tê dîtin ku di helbesta kurt de jî rabêjên destanê hene û helbestvan sernavê helbestên xwe yê kurt jî weke destan bi nav dikin. Lewra jî di dema modern de pîvana dirêjbûna destanê ji holê radibe.

Di qalibên destanê de sînorên hişk hene, ji ber ku bi nivîsê ve nayê sabîtîkirin lewra pir dirêj in. Di tecribeyên çanda devkî de ji bo bibîranîne hin formul tînen bikaranîn. Ev formul rîtm e. Rîtm him bibîranîne hêsan dibe him jî ji bo pêşkêşiyê dewlemendiyekê bi xwe re tîne. Di kevneşopîya devkî de hejmara beytan ne girîng e. Giringiyê zêdetir didin ser çîrokê, ne li ser beytan. Peyvên qalibgirtî, rîtm û biwêj tunebin destan nikare bijî. Rîtm, di destanên dirêj de êşên mezin dikewine.³⁰

Qalibên peyvan pir dişibin hevdu, wekî çeka leheng, cilên wî, evîna wî, ger, koçberî, fikr û dîyalogên di navbera dujmin de heman peyv tê dubarekirin. Taybetiyeke din ew e ku di destanan de sifet pir tînen bikaranîn. Hesp her tim xurt, keçik her tim xweşik, kur her tim wêrek, xaîn her tim zordar, roj her tim sor, ba her tim hişk in. Di hemû destanan de ev

²⁹ Pospelov, h.b. r. 259.

³⁰ Anday, Melih Cevdet *Seçmeler 1*, Yay: Yapı Kredi, İstanbul, 1992, r. 102.

berbiçav in. Bi saya van peyvan, raveker tim rehet e. Kengî bixwaze wan bi kar tîne. Di destanan de metafor jî tim tên bikaranîn lê ev ne weke nivîsê ye. Sûretên xwezayê bi mirovan tên şibandin.

Pergaleke din a destanê jî mubaxele ye. Bi saya vê çîrok di bîra kollektîf de zindî dîmîne. Di serdema nivîski de jî ev berdewam dike. Taybetiyeke din a destanê ew e ku dema ku kelecane zêde dibe, gazîkirin, pirs û sifetên ku kelecane zêdetir dikin, tên bikaranîn.

Teswîrên xwezayê û lehengan di dinyaya destanê de pir in. Mirovên ku çaxa ewilî de meyla wan li ser naskirina xwezayê ye, bi van teswîran wateyekê ji xwe re derdixin. Ne tenê çalakiyên leheng, şiklê leheng jî bi teswîrên zêde tên ravekirin. Ev tê wateya hezkirina leheng.

Destan ewilî ji aliyê diyalogan ve lawaz e. Ew diyaloga hundirîn qet tune ye. Binhiş nayê qalkirin. Lê di nivîsê de yanê çaxa destanên modern de heye. Em li ziman û uslûba destanan binêrin divê em qala zimanê destanê bikin. Anonîmbûna wan bi xwe re vî zimanî tîne. Di wan çaxan de raveker zimanê qalibî bi kar tîne, ev jî dibe zimanê destanê. Çîrokên awarte û mubalexeyî divê bi uslûbeke li gor wê bê ravekirin. Di axaftinên rojane de belkî xêrekî wê nagihije me lê di çîroksaziyê de gel vê di mêjiyê xwe de kod dike. Çarçoweya giştî ya çîrokê muhîm e. Yanê xweşiya wê ew e ku, mirov çîrokê dizane lê dîsa jî guhdarî dike. Ew çîroksazî û rîtm, destanê bi mirov dide guhdarîkirin. Lewra destan, nêzîkî musîkiyê ye û bi zimanê musîkiyê ve pêwendîdar e.

4. Edebiyata Destanî

Di dewra Sasaniyan de berhemên ku ji temayên olî ve dûr, bi zimanê pehlewî hebûna xwe heta hatina Îslamê jî domandine. Ji wan ên ku herî kevn û heta roja me gîhaştî de *Yadîgar-î Zerîr an Ayatkar-î Zerîran* e ku şerên di navbera Ercasb û Gûştasb de neql dike. Hin destanên Îranî ku navê wan derbas bûne lê negihîştine roja me ev in: *Karname-î Erdeşîr-î Babekan*, *Destan-i Behram-i Çûbîn*, *Destan-i Rustem û Îsfendîyar*, *Destan-i Pîran-i Veyse*, *Kîtab-i Seksîkîn*, *Kîtab-i Peykar*.³¹ Berhemeke din a girîng heye ku ew jî *Hudayname* ye. Di derbarê şahên Îranîyan de û bûyerên wê dewrê tê de cih digirin. Di dewra dawiya Sasaniyan de hatiye nivîsîn, navê wê yê rastîn bi pehlewî *Hudaynamek* e. Ev berhema ku bi efsaneyan ve tije, destanên girîng dihewîne. Koka van destanan digihije rîwayetên Avestayê.

³¹ Yazıcı, "Destan", 9: 206

Ev metna pehlewî ji aliyê Abdullah b. Mukaffa bi navê *Sîyeru'l-mulûkî'l-Furs* an jî *Tarîh-i Muluku'l-Furs* bi erebî hatiye wergerandin. Paşê di nusxeyên wê de hin guherîn çêbûne.

Berhem di alema Îslamê de pir bi bandor bûye lê orjînalê berhemê ji holê rabûye, tenê ya erebî maye.³² Ji bilî *Hudayname* berhemên ku wernegerandine zimanê erebî jî hene; *Ahd-i Erdeşîr*, *Vîs û Ramîn*, *Pîrûzname*, *Abbas-i Behmen*, *Bahtiyarname*.³³ Îraniyan rîwayetên *Hudaynameyê* an jî erebiya wê bi navê 'Şehname' an jî 'Gerşasbname' û 'Feramerzname' kirine pirtûk. Di vê mijarê de berhema ewil ya Ebu'l-Mueyyed-î Belhî ye. Paşê Ebû Alî Muhammed b. Ahmed el-Belhî ye paşê jî valiyê Horosanê (Tûs) Ebû Mansûr Muhammed b. Abdurrezzak bi alîkariya hin nivîskaran padîşahên ji ewil heta dawiya Sasaniyan di berhema bi navê *Şehname* de nivîsîye. Fikra nivîsîna menzûma *Şehnameyê* bi *Şehnameya* Mes'udî-yî Mervezî ye. Di sala 912de bi mînyaturan hatiye nivîsîn lê tenê qismên kurt gihiştine roja me. Paşê *Guştasbnameya* Dakîkî derketiye lê şa'ir 1000 beyt nivîsiye paşê hatiye kuştin. Piştî Firdewsî beytên Dakîkî jî hildigre û *Şehname* dinivîse. Ev berhem hemû destanên Îranî di nav xwe de dihewîne. Paşê hin beşên *Şehnameyê* ji aliyê nivîskarên din ve bi navên cuda hatine nivîsîn.

5. Di Destanan de Têgeha Leheng/Qehreman

Murat Belge weke ûnsûra epîkê taybetiyên lehengê destanê bi çend xalan rave dike: Lehengê epîkê şervaniyê, rêzdariya Xwedê, pîvanê, hostatiyê peyvê, hevaltiyê, comerdîyê û rastiyê di kesayetiya xwe de dihewîne. Taybetiya şervaniyê; hêz, wêrekî û eql e.³⁴ Taybetiyên din yê leheng ev in: Leheng her daîm di atmosfera şerî de dijî. Mala wî, jina wî, zarokên wî dûr in; li cem wî leşkerên wî û hevaleyê wî yê nêzik hene. Ji bo wan divê bi mêrxasî bijî û bi mêrxasî bimire. Armanca wî binavûdengbûn e. Ev ne xurûreke vala ye, lehengek bi tenê yoz nabe û tune nabe, qezenca wî şohreta wî ye. Ev îspata jiyana wî ya durustiyê ye û heman demê de diyariyek e ji neviyên wî re. Her leheng di temeneke ciwan de di meydana şer de dimire û diçe. Mirina wî dibe helqeyeke qezenca biserketina bi lehengekî din re.³⁵

³² Yazıcı, h.b. r. 207.

³³ Yazıcı, h.b. r. 207.

³⁴ Murat Belge, *Edebiyat Üzerine Yazılar*, İletişim Yay, İstanbul, 2006, r. 423.

³⁵ h.b. r.425.

Otto Rank avabûna hêza lehengê di tevgerên di navbera kur û bav de bi nav dike. Yanê ji bo qehremanbûyînê kur bavê xwe dikuji, têkîliyên bi van qaliban ve qaliba lehengiyê ava dibe. Li gor Otto Rank qaliba lehengiyê 12 xelean ve ava bûye: Leheng ji malbateke derasayî çêbûye, bavê leheng qral e, şertên avabûna di zikê diya leheng de zor e, di zayîna leheng de kehanet hene, leheng li ser avê bi qûtiyeke re tê danîn, leheng ji aliyê mirov an ajalan ve tê parastin, ajaleke mê an jineke baş şîr dide wî, leheng mezin dibe û malbata xwe ya rastîn dibîne, heyfa xwe ji bavê xwe distîne. Leheng ji aliyê gel ve tê nasîn û tê qebûlkin. Leheng rutbe qezenc dike û bi rûmet dibe.³⁶

Li gor Lord Raglan jî;

1. Diya leheng bakîreyek e.
2. Bavê wî qral e.
3. Bav bi gelemperî eqrebayê diya leheng e.
4. Çêbûna di zikê dê de zor e.
5. Leheng di heman demê de wek kurê Xwedê tê qebûlkin.
6. Bi gelemperî ji aliyê bav ve leheng tê kuştin.
7. Leheng bo cihekî nenas tê şandin.
8. Li welatekî dûr ji aliyê malabatekê ve tê mezinkirin.
9. Di derbarê zaroktiya leheng de tîstek nayê ravekirin.
10. Leheng di ciwaniya xwe de diçe cihekî ku li wê derê wê bibe qral.
11. Leheng; piştî bi serketina bi şerên wekî dew, ejderha, qral kamil dibe.
12. Bi prensesekê re dizewice.
13. Dibe qral.
14. Piştî demekê dibe hikumdarê welat.
15. Zagonan dinivîse.
16. Piştê leheng, hezkirina gel û Xwedayan wenda dike.

³⁶ Özkul Çobanoğlu, *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Akçağ Yay. İstanbul, 2005, r. 191–192

17. Ji text û ji bajêr dûr dikeve.
18. Leheng bi nepenî rastî mirinê tê.
19. Bi gelemperî li ser girekî dimire.
20. Zarokên wî hebin, li şûna wî naçin ser text.
21. Laşê leheng nayê veşartin.
22. Gora pîroz a leheng ji yekê zêdetir e.³⁷

Li gor Joseph Campbell jî leheng ji sê êwran derbas dibe: Veqetîn, kamilbûn û vejer. Lehengek ji malê dûr dikeve û di rê de li hêzên derasayî rast tê. û helbet bi ser dikeve.³⁸

Prometheus derdikeve ser asîmanan, agir ji Xwedê distîne û dadikeve, Îason dest bi rêwîtiyeke derasayî dike ber bi behrê ve ji ber erîşên zinarên ku li keştîya wî dixin. Cenewara ku posta zêrîn diparêze, têk dibe, taca xwe dîsa distîne û bi hêzeke bêtir vedigere. Aîneînas diçe bin erdê, ji rûbara miriyan derbas dibe, goşt dide kûçikê Kerberos ku sê serê wî hene û herî dawî bi xeyaleta bavê xwe yê mirî re diaxive. Ji bo leheng her tiştê famkirin. Leheng ferq dike ku bi eqlê xwe çawa ji her tiştî dibore.³⁹

Em dikarin van mînakên zêde bikin lê di encamê de em dibînin leheng ji heman êwran derbas dibin. Lehengê di nav civakê de dijî di van derbasokan re derbas dibe:

1. Bangawaziya Macerayê
2. Redkirina Bangawaziyê
3. Alîkariya Sersirûştî
4. Derbasbûna Xetereya Ewil
5. Zikê Balînayê

Di êwra kamilbûnê de jî ev derbasok hene:

1. Rêya bi Azmûn

³⁷ M. Oğuz Öcal, h.b. r. 3.

³⁸ Joseph Campbell, *Kahramanın Sonsuz Yolculuğu*, Çev: Sabri Gürses, Kabalıcı yay, İstanbul, 2013, r. 42.

³⁹ h.b. r. 42.

2. Rûbirûmayîna Xwedayekê
3. Jina Fêlbaz
4. Stendina Dilê Bav/Lêborîn
5. Xwedavendkirin
6. Dîyariya Dawîn⁴⁰

Di êwra vegeerê de jî heger leheng elaqeya mezin nebîne jî ji hin derbasokan derbas dibe:

1. Redkirina Vegerê
2. Reva Sêhrî
3. Xilasbûna Ji Xetereyên Derveyî
4. Derbasbûna Vegerê
5. Hostayê Her Du Dinyayan
6. Azadiya Jiyanê⁴¹

Di destanan de leheng ne hewce ye ku ji van hemû derbasokan derbas bibe lê divê ji êwran de herî kêr ji derbasokê re derbas bibe. Em ê destana Rustemê Zal a ku versiyona di Şahnameya Kurdî de derbas dibe û mijara teza me ye, li gor van derbasokan analîz bikin.

5.1. Derketina Rê

5.1.1. Bangawaziya Macerayê

Bangawazî weke xetayekî dest pê dike lê ew xeta piştê diguhere. Di bangawaziyê de divê tiştê bibe sebeb ku leheng ji malê dûr bikeve. Di destana Rustemê Zal de Rustem ji

⁴⁰ h.b. r. 48.

⁴¹ Campbell, h.b. r.49.

ber ku bi xeletî kurê xwe kuştiye pir xemgîn e û dixwaze welatê xwe terk bike. Ev aciziya ku hîs dike û derketina rê dibe bangawaziyêke macerayê. Wekî Freud diyar dike xeta tenê ne bextê mirovan e. Binhişiya mirov e. Xeta dibe ku qederekê ava bike.⁴²

Hate hizira wî kuştina Zorab

Cergê wî sofî her wekû kebab (b. 17)

...

Cewabê lédave Rustem bi giryan

Heram bît li min welatê 'Îran (b. 25)

Terikandina welat, wekî xeta tê dîtîn ji ber ku Rustem dema terk dike bi salan derve dimîne. Lê ev xeta paşê tîştên baş jî tîne. Xeta di serî de ji nişka ve derdikeve û leheng bi hin tiştan re şer dike.

5.1.2. Redkirina Bangawaziyê

Di hikayet û meselokan de tim bêbersivmayîna hin bangawaziyên em dibînin. Redkirina bangawaziyên macerayê dike negatîf.⁴³ Di destana Rustemê Zal de jî Rustem dema welatê xwe diterikîne û diçe rêya Mazenderanê, li wir dilê wî dikeve keçîka şahêkî û pê re dizewice. Ji wê jînê kurekî wî çêdibe bi navê Cihangîr lê haya Rustem jê nîne ji ber ku dizewice lê li wir namîne. Cihangîr mezin dibe û bavê xwe digere. Hin caran tê bîra Rustem ku niha divê êdî vegere welatê xwe ji ber ku dizane dema ew li welatê xwe nebe wê bê dagirkirin. Di vir de ew hîsa vegera welat her tim red dike. Heger red nekira, macera wê biba pozîtîf ji ber ku vegeryaba welatê xwe wê bizaniya kurekî wî çêbûye û welat di bin xeterê de ye.

⁴²Campbell, h.b. r.65.

⁴³ Campbell, h.b. r.73.

5.1.3. Alîkariya Sersirûştî

Di vê derbasokê de di rasthatina ewil a xetereyê de jinek an jî merek derdikeve pêşiya leheng û alîkariya wî dike. Di destana me de ev derbasok nîne. Alîkariya sersirûştî xuya nabe.

5.1.4. Derbasbûna Ji Xetereya Ewilî

Rustem dema di daristanekê de digere rastî dêwekê tê. Dêw pir mezin e û bi hêza xwe bi nav û deng e.

Didanêt kafirî her weku çinar

Lêvêt mel'ûnî reş bû weku dewar (b. 114)

Mûyêt li ser û leşî wek nişter bûn

Birî û mijûlank wek çiqedar bûn (b. 115)

Leheng piştî şerekî, xetereyê yan jî hêzê derbas dike û hêzeke mezintir hildigire an jî dimire.⁴⁴ Di destana Rustemê Zal de Rustem bi vî dêwê pir bihêz re şer dike û bi ser dikeve. Leheng ji erkên vê derbasokê re jî dibore.

Dest dabû gurzî rakire û yekser

Rakiribû bi qûweta (Ella ekber) (b. 130)

Dana bû serê dêwê bê mefer

Mel'ûnî raki metal dabû ber (b. 131)

⁴⁴ Campbell, h.b. r. 99.

5.2. Kamilbûn

5.2.1. Rêya bi Azmûnan Tijî

Piştî derbasbûna xetereya ewilî leheng derbasî dinyayeke din dibe û ew rê rêya herî xweş e ji bo leheng. Leheng berî ku derkeve vê dinyayê pêşniyazên ku berê li wî hatine kirin, tîne bîra xwe.⁴⁵ Rustem jî piştî ku terka welatê xwe dike rastî gelek bûyeran tê. Dema ew bi xeterêyên wekî dêw re şer dike li aliyê din jî kurê wî Cihangîr ji bo babê xwe bîbîne şer dike û welatê wî di bin xetereya Tûraniyan de dimîne. Diçe daristanekê, digere û êxsîrekî bi navê Azade Mehre ji destê dêw xilas dike.

Rustem mizgîn virê kir 'Azade Çehre

Min xilas kiribû 'Azade Mehre (b. 158)

Rustem dema ji bo vegeerê derdikeve rê, dinêre ku ji malbata wî kes li derdorê tune, leşkerên xwe hazir dike ji bo şer. Ji ber ku fam dike welate wî di bin xeterêyê de ye.

Leşkerê Bilgâr mest û serxoş bûn

'Êk carî hemû bê 'eqil û huş bûn (b. 225)

Paşê xewneke kurt dibîne û dema ji xwe radibe leşkeran hazir dike û dîsa şer dike welatê di bin xetereyê de xilas dike.

Rustem bû paşa li milkê Bilgâr

Hebû zor leşker bê hed û jimar (b. 256)

⁴⁵ Campbell, h.b. r. 113.

5.2.2. Stendina Dilê Bav / Lêborîn

Di versiyona vê destanê de ji ber ku bav nizane kurekî wî çêbûye kur li bavê xwe digere. Kur bavê xwe nedîtiye lê dîsa jî bavê xwe diparêze. Ji bavê xwe hez dike. Ji bo bavê xwe bi birayên xwe re pev diçe.

Me‘lûm e li nik min we nîne namûs

Bo çî şerî diken ji bo Key Kawis (b. 575)

Kur divê baweriya xwe bi merhemeta bavê xwe bîne ku ew pirsgirêka ku bi şerkirina dêwan ji holê rabe. Di beyta jor de Cihangîr ji birayê xwe dixeyide û dibêje divê em ji bo bavê xwe şer bikin.

5.3. Veger

5.3.1. Reva Bi Sêhr

Leheng dema ku civakê xilas bike ji aliyê kesên sersirûştî ve piştgirî tê dayîn.⁴⁶ Di destana Rustemê Zal de jî Rustem rojekê di xewna xwe de dibîne ku welatê wî di bin dagirkeriyê de ye. Ew xewn, wî ji bo vegerê teşwîq dike lê em dizanin ka ew xewn rastî ye. Ev sêhr ji bo ku vegere welatê xwe derbasokek e.

Şevkî nivistibû kurê Zalê zer

‘Ecêb xewnek dît le weqtê seher (b. 784)

Wî dît û ‘Îran wek behra Cihûn

Lîsiru lêmişti dan her wekî xûn (b. 785)

⁴⁶ Campbell, h.b. r. 225.

'Îranê hemû keftiye bedab

Zelîlin be destî şay 'Evrasiyab (b. 786)

5.3.2. Derbasbûna Xetereya Vegerê

Dema leheng vegere, divê bikaribe wê jîyana berê bijî. Lehengê ku vedigere ji bo ku macereya xwe tamam bike divê ji têsîra dinyayê derkeve.⁴⁷ Di destana Rustemê Zal de dema Rustem vedigere dibîne kurên wî ji bo wî û welatê wî di eniya şer de têdikoşin. Bi dîtina vê dîmenê Rustem ji bin têsîra dûrbûnê derdikeve.

Gazî Zalê kir gotî 'extiyar

Mizgîn le te 'eve ye Rustemî navdar (b. 887)

5.3.3. Azadiya Jiyanê

Derbasoka bi sêhrî û dawîya vegerê çi ye? Mirov di dinyaya zindî de îlkeya ebediyetê wenda dike ji ber ku ji kirinên xwe bi şik dimîne lê meyweya kirinên xwe di dawa Xwedê de rêz dike û ji wan şikan xilas dibe.⁴⁸ Yanê mirov ji tevgerên xwe re hincetên maqûl dibîne ji bo ku rehet bijî. Di destanê de jî leheng ji ber kirinên xwe bi şik in lê xilasbûna dagirkeriyê weke azadiya jiyânê dibînin û bi vê dil û wijdanê xwe rehet dikin. Rustem jî piştî ku vedigere û di şer de jî bi ser dikeve êdî jiyana azad li benda wî ye.

Rustem wek gulê bû berdabû pêkenîn

Gazî kir gotê şah Tûran zemîn (b. 918)

⁴⁷ Campbell, h.b. r. 253.

⁴⁸ Campbell, h.b. r. 267.

Le xoşiya Rustem leşkerî 'Îran

Bêtirs biribûne leşkerê Tûran (b. 924)

Destana Rustemê Zal ji van derbasokan re derbas dibe. Helbet tu destan hemû derbasokên ku Joseph Campbell diyar kirine, derbas nabe. Di destana Rustemê Zal de jî derbasokên me li jor diyarkirî hene. Em digihjin wê encamê ku ev metna li ber destê me piraniya erkên destanê di xwe de dihewîne.

BEŞA DUYEM

2. ŞAHNAME Û ŞAHNAMEYA KURDÎ

2.1. Şahname

Dema Şahname tê gotin, pêşî *Şahnameya Firdewsî* tê bîra mirov. Ji ber ku ev berhem jiyan û çanda Îranê ye. Gelek berbelav bûye bi gelek zimanan hatiye wergerandin. Li aliyê din heye ku şahnameyên din nehatine bihîstin û negihîştine roja me. Şahname weke peyv tê wateya ew berhemên menzûm ku bi dîrokê ve eleqedar in. Tê zanîn ku Şahnameyên beriya Firdewsî jî hene ku negihîştine roja me. Wekî şahnameya Ebu'l-Mueyyed el-Belhî, şahnameya Ebû Ali Muhammed b. Ahmed-i Belhî, şahnameya Ebû Mansûr-i Dakîkî.⁴⁹ Di Şahnameyê de çîrok û meseleyên Îranê û derdora Îranê hene. Em dikarin kronolojiya vegotina Şahnameya Firdewsî bi sê beşan dabeş bikin: Beşa mitolojik, beşa palewanî yan lehengî û beşa dîrokî.⁵⁰ Di beşa lehengî de ku beşa herî girîng û nasrav ê *Şahnameyê* ye, rola Rustem wek lehengê sereke berbiçav e.

Li gor *Şahnameya Firdewsî* Rustem kurê Zal, neviyê Sam û bavê Sohrab û Feramurz û kalikê Bîjen e. Xanima Zal nekarîbûyê zarokê xwe yê di zikê xwe de bîne dinyayê ji ber vê neçariyê Zal xemgîn dibe û Sîmurxa ku Zal mezin kiriye û jê re pirç dane ku dema bikeve tengasiyê divê van pirçan vêxe ku Sîmurx were hewara wî. Zal jî wan pirçan vêdixê û Sîmurx tê. Sîmurx jê re dibêje ev ne zayîneke asayî ye ji ber ku kurê we ne mirovekî asayî ye. Divê tu herî zilamekî bîaqil bînî ku ji zikê jina te kurê te derxîne. Wisa jî dibe. Rustem Xwedê dide, bi rastî jî ne kurekî asayî ye. Porê wî sor, rûyê wî weke xwînê ye. Weke yek salî Xwedê dide. Jiyana Rustem ji dema Keykubad û heta mirina Keyhusrev bi navê Emîru'l Umera tê binavkirin. Rustem nîşaneyê rezmê ye ku bi qehremaniyê ve tê bibîranîn.⁵¹ Navê diya Rustem Rûdabe, ê kalikê wî Sam, ê jina wî Tehmîne û ê keça wî Banûguşesb e. Jiyana wî ya bi serkeftinan tije, li Zabolistanê derbas dibe.

⁴⁹ Hellmut Ritter, *Doğu Mitolojisinin Edebiyata Etkisi*, Ayrıntı yay, İstanbul, 2011, r. 165-166-167.

⁵⁰ Shahab Vali, *Nerîneke Giştî li Şahnameya Firdewsî û Şahnameya Kurdî*, amd: Ramazan Pertev, *Edebiyata Kurdî ya Gelerî*, İstanbul, Weş: Avesta, r. 284.

⁵¹ Gencay Zavotçu, *Klasik Türk Edebiyatı Sözlüğü*, Kesit Yayınları, İstanbul, 2013, r.615.

2.1.1. Şahnameya Kurdî

Şahnameya kurdî û ya Firdewsî ji hev cuda ne. Şahnameyên kurdî ber'eqsê *Şahnameya Firdewsi* çarçoweyekî yekgirtî nîne. Çunkî bingeha wê edebiyata devkî ye.⁵² Em li cudahiyên van şahnameyan binêrin divê serdema avabûna wan jî lêbikolin. Li gor hin pîsporan gava ku em van cudahiyên bingehîn ên şahnameya kurdî û ya Firdewsî dibînin, em dikarin bêjin ku divê ev koka rîwayetên kurdî serdema Partî û Hekamenîşî vekolin.⁵³

Derbarê Şahnameya Kurdî de çavkaniyên kurmançî pir kêr in mixabin. Di Şahnameya Kurdî de çîrokên destanî û mîtolojîk hene ji ber vê jî Şahnameya Kurdî yek ji çavkaniyên herî girîng a çanda kurdî ye.⁵⁴ Hin pîspor Şahnameya Kurdî dikin du beş: Nivîskî û devkî. Versiyona devkî bi awayê dengbêjan hatiye riwayetkirin versiyona nivîskî jî nivîskarê wan ne diyar in ji ber wê yê nivîskî anonîm in. Shahab Vali di *Nêrîneke Giştî li Şahnameya Firdewsi û Şahnameya Kurdî* de Şahnameya Kurdî li gorî naverokê bi sê beşan ve dabeş kiriye: Beşa mîtolojîk-lehengî, beşa dînî û beşa dîrokî.⁵⁵

2.1.2. Beşa Mîtolojîk-Lehengî

Di beşa mitolojîk-dîrokî ya *Şahnameya Kurdî* de du karakterên bingehîn hene: padîşah û leheng. Yanî em dikarin bibêjin ku *Şahnameya Kurdî* bi gelemperî çîroka padîşah û lehengan e. Ev padîşah û leheng an baş in (îranî-kurd) an jî dijmin û xirab (turanî-tirk) in.⁵⁶ Di beyta *Rustemê Zal* de jî malbata Rustem baş e û malbata Tûraniyan jî xirab e.

’Evrasiyab şah sahirê bedkar

Tu rab pêş leşker da bibî girodar (b. 529)

⁵² Chamanara, Behrooz, (Pêşekî û Saxkirdinewe), *Şanamey Kurdi*, Bergi Yekem, *Rûsem û Zûrav*, çap. Mang, Kerec, Çapi Yekem, 1395/2016, r.302

⁵³ Ekberi, Mefaxir Areş, *Reznameye Kenizek, Merkeze Dairetu-l Mearif Buzurgee İslamî*, Tahran, 1395/2016. r. 15

⁵⁴ Vali, h.b. r. 285

⁵⁵ h.b. 286

⁵⁶ h.b. 289

Evrasyab Şahê Tûranê ye û dijminê Îraniyan e. Di nav dijmin de ji bilî padîşah û lehengên xirab hin dêw û hefrîd jî hene.⁵⁷ Dêw nîşaneyê xirabiyê ye. Di beyta *Rustemê Zal* de jî Rustem bi dêw re şer dike û exsîrekî ji bin destê wî rizgar dike.

Rojekê çûme nav bağî bo seyran

Li min peyda bû dêwekî bê 'îman (b. 151)

Yanî beyta *Rustemê Zal* û bi gelemperî *Şahnameya Kurdî* di nav lehengiyên baş û xirab de derbas dibe. Taybetiyeke din a girîng û bingehîn jî pêwendiya Xweda-Şah-Leheng e.

Sucde ya şukrê bir bo zatî Xuda

Kir hemd û sena ji bo 'ezmeta Xuda (b. 898)

Di baweriya kurdan de hîç lehengên ku bi çirokên Şahname derbas dibin kesayetên çêkîrî nînin, kesayetên dîrokî ne⁵⁸.

2.1.3. Beşa Dînî

Lehengên beşa dînî ya *Şahnameya Kurdî*, wek îmam, xelîfe û pîrên sofî bi piranî kes an lehengên dîrokî yên berî îslamê ne.⁵⁹

Xo bikene leşker biçin bo 'Îran

Bizanin ka çî ye teqdîrê Yezdan (b. 442)

⁵⁷ h.b. 289.

⁵⁸ Mustafa, Bin Mahmud Gorani. *Şahnamey Kurdî*, Îrec Behramî amd. Înteşaratê Hîrmend, Tahran, 2383/2004. r.26.

⁵⁹ Vali, h.b. r.291.

Li pişta xîvetên paşayê Tûran

Guh bigir li gotina paşay Pîran (b. 443)

2.1.4. Beşa Dîrokî

Destanên dîrokî li gor avahiya xwe hewşêweya mît in lêbelê jiyana lehengên destanî di demeke diyar de qewimiye û bûyereke dîrokî bûye sedema peydebûna van çîrokan.⁶⁰ Heta niha beşên Şahnameya Kurdî yên çap bûne goranî ne lê xebata me bi kurmancî ye.⁶¹

2.1.5. Çîrokên Di Şahnameya Kurdî De

Di Şahnameya Kurdî de çîrokên curbicur hene. Çend beş cuda cuda hatine çapkirin. Çîroka Cevahîr Pûş, Bijen û Menîje, Heft Xwanî Rustem, Rustem û Sohrab, Rezmnameya Rustem û Semsam Şahê Dêw, Rustemê Zal, Rustem û Dêwê Sipî û hwd.⁶² Hin çîrokên di Şahnameya Kurdî de hene di *Şahnameya Firdewsî* de nînin. Ev cure çîrokebeyt di nav kurdan de belav bûye û serdemên nêzîk bi taybetî di serdema Safewiyan de di nav neqqalan de belav dibe û her neqqal li gor xwe lê zêde dike an kêr dike.⁶³ Îhtîmaleke mezin sebaba cudabûna rivayetên kurdî ev e. Hin caran jî çîrokên heman di Şahnameya Kurdî de hene. Car caran em di çîrokên şahnameyê de rîwayetên wekî hev dibînin⁶⁴. Ev cudahiya bingeîn e taybetiya Şahnameya Kurdî nîşan dide ku Şahnameya Kurdî ne kopiya wergera Şahnameya Firdewsî ye.

⁶⁰ Vali, h.b.r. 291.

⁶¹ Ji bo destanên cûda yên Şahnameya Kurdî bnr. Chamanara, Behrooz, The Kurdish Sahnama and its Literary Religious imp. r.r.231-278.

⁶² Vali, h.b. r. 292.

⁶³ Behramî, Îrec, *Şahnamey Kurdî 2 Neşr-î Ana*, Tahran, 1389/2000, r.12.

⁶⁴ Elmasxan Kenduleyi, *Sigu Siyaweş*, Amd: Seydfezhullah Dekey, Seydarman Dekey, Întişarati Metn, Çapî Yekem, Tahran, 1396/2017, r.r. 78-84.

2.2. Danasîna Metna Rustemê Zal

Ev metn ji aliyê vehandina Mela Miştefa 'Oremarî, berhevkirina 'Elî Miştefa 'Oremarî û Cemîl Mehmud Şêlazî di kovara Vejînê, jimarên 16, 18 û 19ê de bi tîpên erebî hatiye tomarkirin. Eslê vê metnê kê nivîsandiye ne diyar e. Çîrokek ji çîrokên Şehnameya Kurdî ye. Wekî me epizodên metnê diyar kir serenav Rustemê Zal e lê naveroka metnê lehengiya Cihangîr rave dike. Behsa Rustemê Zal jî heye lê serleheng Cihangîr e.

Berhemek bi navê Cihangîrname heye ku nivîskarê wê Qasimê Madêh e û pirtûk li Heratê (Efxanîstan) nivîsiye, bi zimanê farsî ye. Agahiyek derheqê nivîskar de nîne. Kîjan serdem e ew jî ne diyar e. Jules Mohl li destpêka Şahnameya Firdewsî de gotiye ku ev Cihangîrnameya farsî di sedsala 5ê koçî de hatiye nivîsîn lê li gor Mihran Efşarî dibêje ev ne ewqas kevn e di sedsala 9ê koçî de hatiye nivîsîn. Mijara wê jidayikbûna Cihangîrê kurê Rustem e, heta dawiya jiyana Cihangîr tê de heye. Şeş hezar beyt e wek piraniya menzûme û destanên farsî, di qaliba mesnewiyê de hatiye nivîsîn.⁶⁵

2.2.1. Ji Aliyê Naverokê ve Danasîna Destana Rustemê Zal

2.3. Epîzodên Destanê

2.3.1. Pesindayîna Xwedê

Destan wekî her mesneviyê bi beytên pesna Xwedê û Pêxember dest pê dike, beytên ewilî bi vî awayî ne:

Ya Xwedayê pak û bê ceh û mekan

'Înane wicûdê 'erd û 'asiman (b. 1)

Bê mişl û nezir î bê xew û xarin

Bê heval û şerikî herî mazin (b. 2)

⁶⁵ Efşarî, Mihran, 'Cehangîrname', Danişnamey-i Cehan-i Îslam, Cild 11, 1393/2014, rch. acir/article/details:7729, 26.04.2019.

2.3.2. Çûyîna Mazenderanê

Ji beyta çardehem heta beyta çil û heştê, behsa xemgîniya xwe dike, hurguliyên meseleya kuştina Zorab nake. Rustem kurê xwe Zorab kuştiye, ev bûyer tê bîra wî û em aciziya Rustem dibînin.

Berdabû girî bi şîn û feryad

Nalî jê diçûn bo çerxê widad (b. 19)

Gotî: 'Ey heware helyam û birya

Ji ber Zorabî 'agir dilê min girya (b. 20)

Ji ber vê xemgîniyê malbata xwe dihêle, Îranê terk dike û diçe Mazenderanê.

Hate bi bîra min kuştina Zorab

'Agir kefte dilê min her weku kebab (b. 66)

'Ez rabûm tûre bûm li şahê 'Îran

Terk kirim hemû bab û birayan (b. 67)

2.3.3. Zewaca Rustem

Ji beyta 71ê heta 102 ya behsa zewaca Rustem e. Rustem malbata xwe terk dike diçe. Mazenderanê. Li wir keça şahê Mazenderanê dibîne û dilê wî dikeve keçikê. Ji şah keça wî dixwaze, şah jî ewilî ji keça xwe dipirse. Di beytan de em navê keçikê nabînin. Keçik jî li bavê xwe bersiva erenî diyar dike, paşê dizewicin.

Rustem wê şevê bi meqsûd şad bû

Xo digel nazenîn ta fecr şad bû (b. 97)

2.3.4. Şerê Rustem û Dêw

Ji beyta 103yan heta beyta 142yan behsa şer heye. Rustem dixwaze masiyan bigre diçe golê, li wir dêw derdikeve pêş wî.

Bo rava masyan li kinarê behr da

'Ew çûbûn bi lez dît dêwek bû peyda (b. 106)

Bi dêw re diaxive. Dêw wekî dujminê wî ye û wekî keseyetiya wî hebe diaxive.

Hate pêş ve gotê: 'Ey pehlewan

Tu bo çî dihêy ser ta'îfe dêwan (b. 117)

Rustem gotê: 'Ey şumê bedkar

Nav û nîşanê Xûdê keme 'îzhar (b. 118)

Rustem û dêw şerekî zor dikin û Rustem, dêwî ser jê dike, şer xilas dibe.

2.3.5. Rasthatina Rustem û Dilêrekî

Ji beyta 143yan heta 174an behsa rasthatina wan e. Rustem dema dêw dîkuje paşê li daristanê digere û dibîne ciwanek derdikeve pêşiya wî. Ciwan dibêje ev heft sal e ez di bin destê dêw de bûm. Te ew kuşt ez jê xilas bûm. Rustem wî dibe diçe teslîmî babê wî dike. Babê wî şahek e, spasiyê ji bo Rustem dike.

2.3.6. Şerê Welatê Bilxar

Aciziya Rustem ji bo kurê xwe derbas dibe û Rustem dîsa aciz dibe ji ber ku demeke dirêj derbas bûye lê hîn jî venegeriyaye welatê xwe yanê Bilxarê. Rustem ji şah destûr dixwaze ji bo vegeerê şah jî li gel sih hezar siwaran wî dişîne. Rustem vedigere lê dibîne dora welatê wî bi leşkeran hatiye girtin. Rustem vî şerî jî bi serkeftinê xilas dike.

Rustem bû paşa li milkê Bilgâr

Hebû zor leşker bê hed û jimar (b. 256)

2.3.7. Ji Ber Nehatina Rustem, Zer'elî Dikeve Rê li Rustem Digere

Zer'elî ji ber nehatina Rustem aciz dibe ji ber ku Rustem çend sal derbas bûye lê hîn jî venegeriyaye welatê xwe. Zer'elî ji dûr ve hespê Rustem yanê Rexş nas dike û hevdu dibînin lê Rustem dîsa venagere û dibêje heta Key Kawis şahê Îran be ez venagerim.

Heta Key Kawis şahê 'Îran bît

Naçimewe Xudê biket 'Îran wêran bît (b. 282)

2.3.8. Jidayikbûna Cihangîr

Cihangîr li Mazenderanê ji dayik dibe. Cihangîr dema piçek mezin dibe şahê Mazenderanê yanê babê wî dişîne medreseyan, li cem aliman. Di heft saliya xwe de li hespê siwar dibe. Lehengê sereke Cihangîr e û di vê metnê de em dibînin kamilbûna Cihangîr ya derasayî dibînin. Di metnê de em nizanin Cihangîr ji ber çi babê xwe nas nake mezin dibe ji diya xwe dipirse ez ewladê kê me. Dema dê û bavê wî ji wî re dibêjin ew jî biryarê dide ji bo şer bike li Îranê.

2.3.9. Şerê Şahê Tûran û Îranê

Şahê Tûranî Zerbekr dizane ku Rustem ji zû de ye ne li Îranê ye ew jî vê fersendê bi kar tîne û ji bo şer biryarê dide.

Gotî ku Rustem gewreyê dilberan

'Eve ye çende sal e nîne li 'Îran (b. 343)

Şahê Îranê Key Kawis e. Şahê Tûran li gel siwaran bi rê dikeve û di rê de Cihangîr dibîne. Cihangîr bi wan re jî şer dike, Zerbekir yanê şahê Tûranî ji tirsan direve diçe. Cihangîr wexta nêzî Îranê dibe wezîr û şah nas dikin û tê derdixin ku Cihangîr kurê Rustem e. Jê ditirsîn û wezîran dişînin cem wî ku ji bo şer li hev bikin. Şahê Îranê dibêje bila Tûran a te be Îranê jî ya min be. Li gel zêr û pereyan Cihangîr vê qebûl dike.

2.3.10. Şerê Evrasyab ji bo Îranê

Şahê Tûranê Evrasyab bi leşkerên bêjimar diçe ser xakê Îranê. Şahê Îranê Key Kawis jî ditirse û gazî Zal dike.

'Evrasiyab şah padişayê Tûran

Leşkerî 'îna bû ser xakê 'Îran (b. 416)

Key Kawis nameyek ji Zal re dişîne dibêje Rustem çûye ji ber wê welatê me Îranê dikin xirab bikin werin alî me. Birayê Rustem Ziwarey pir xemgîn dibe û ji tirsax naxwaze here şer bike Zal jî dixeyide û dibêje tu li dewsa Rustem mayî divê tu şer bikî. Filamerz yanê kurê Rustem jî ne kêmi Rustem e hûn herdu herin şer bikin.

Li cihê Rustem tu mayî bo Zal

Şêtê serserî pîsî bedxisal (b. 448)

Felamerz nûke li cihê Rustem e
Pehlewanek mezna hevalê kême (b. 449)

Zal, Firamerz û Ziware li gel leşkeran sê roj û sê şevan diçin Îranê, Key Kawis pir dilşad dibe ji ber hatina wan. Dibe sibe Zal dibîne dujmin ji dûr diyar dibe lê gelekî zêde ne û dibêje em nikarin bi wan re şer bikin.

Leşkerê Tûran hatin bo nalan
Çare me nîne zor û bê Saman (b. 513)

Firamerzî 'eve wek bihîst li Zal
Gotî: babê pîr borîn li te sal (b. 514)

Rustem ku 'êsta li 'Îran nîne
Ger bo şerî nebit kur ma bo çî ye (b. 515)

Ji leşkerê Tûran Cihangîr jî li cem Evrasyab e. Cihangîr ji bo heyfê ji Îranê bistîne, heqê babê xwe Rustem û birayê xwe Zorab bistîne pir aciz e û dixwaze welatê Îranê xirab bike. Lewra Rustem ji ber şahê Îranê yanê ji ber Key Kawis kurê xwe Zorab bi xeletî kuştiye. Cihangîr dixwaze vê heyfê ji Key Kawis bistîne. Cihangîr diçe meydana ji bo şer ewilî ji Îranê Gîw derdikeve pêşiya wî. Ji Gîw dipirse tu kî yî. Gîw jî zavayê Rustem e ji Cihangîr dipirse dibêje tu ne şibhî Tûraniyan î diyar e tu ji Îranê yî. Cihangîr dema dibihîze ku Gîw zavayê Rustem e hêrs dibe.

Cihangîr gotî: bi Xuday pehlewan
Tu ji mala kiyê 'ey milkê 'Îran (b. 533)

Gotî: 'ez Gîwî zirî gulah im
Zavayê Rustem tacibexş şah im (b. 534)

Cihangîrî gotî: Gîwî bê heyâ

Bê şerm û bê 'edeb bêfam û tenya (b. 535)

'Êwe qet nîne çî heyâ û namûs

Bo çî ken xizmet bo şa û Key Kawis (b. 536)

Cihangîr tekotek bi Gîw û leşkerên Îranî şer dike û bi ser dikeve. Hemû leşkerên Îranê êxsîr dike. Evrasyab pir dilxweş dibe. Dibe sibe û Cihangîr dîsa diçe meydanê evcar Firamerz derdikeve pêşiya wî. Cihangîr ji Firamerz jî dipirse û dibêje hûn şerm nakin ji bo Key Kawis şer dikin ma ne Rustem ji ber Key Kawis çûye ji van deran. Firamerz jî dibêje tu heqê te nîne ku tu heyfa wan hilinî.

Firamerz gotî: 'ey şêtê nefam

Mindalê bê hoş teqrîqe kelam (b. 578)

Şert bît li te bikem 'evro li meydan

Ke 'Evrasiyab bo te bît giryan (b. 579)

'Ev kî ne çî ne pir li derd û gem

Çî heq niye li ser Zorab û Rustem (b. 580)

Cihangîr, Firamerz jî têk dibe û bi ser dikeve. Paşê Tûs derdikeve pêşiya wî û bi wî re jî şer dike Rustem, wî jî êxsîr dike.

Tûsî newzerî bû çûbû meydan

Rawesta beramber merdê pehlewan (b. 600)

Vê carê jî Ziware derdikeve pêşiya Rustem. Bî wî re jî şer dike. Ziware hespê Cihangîr dikuje lê dîsa jî Cihangîr bi ser dikeve. Kes namîne ku şer bike vê carê Zal derdikeve hemberî Cihangîr.

Cihangîr gotê pîrê zeman e

Bo çî tu hatî boyî şer 'azan e (b. 617)

Qet piyaw nemane leşkerê 'Îran

Bi huy zelilî tu hatiye meydan (b. 618)

Zal pir xemgîn dibe lê çare nîne. Diçe meydanê û ji hespê xwe dikeve erdê.

Bes e Xuda çûbûye dilê pir qar

Li ser pişta hespî kewa 'ew kefte xwar (b. 620)

Çûna Rustem ji bo Zal ji mirinê xirabtir e. Herî dawî wisa dibêje û ev bûyer wisa diqede. Metn bi serenaveke din berdewam dibe.

Min li paş Rustemî mergim baştir e

Mirin li manim gelek çaktir e (b. 623)

Cihangîr dibîne ku Zal dikeve erdê diçe destê Zal maçî dike û dibêje ez kurê Rustem im lê min jî babê xwe hîn nedîtiye ez li wî digirim. Zal dema van peyvan dibîhîze pir şad dibe û Cihangîr maçî dike. Cihangîr ji Zal re dibêje em vê ji kesî re nebêjin em şer bikin wan bixapînin. Paşê Zal vedigere dîwanê vê xeberê ji Key Kawis re dibêje Key Kawis jî dilxweş dibe.

2.3.11. Xweşkerekirina Cihangîr

Cihangîr diçe li cem êxsîran li nav êxsîran de Ziwarey, Firamerz, Tûs jî hene. Xwe eşkere dike û dibêje ez kurê Rustem im. Êxsîr dilxweş dibin û bi hev re şahiyêke çê dikin. Şahê Tûranê Evrasyab vê dibihîze, fam dikin ku Cihangîr û Zal wê rojê hîle kiribûn. Aciz dibin û biryarê didin ku şer bikin bi wan re. Cihangîr dibihîze ku Evrasyab û şahê Tûran li gel leşkeran tê şer. Ji êxsîran dibêje xeman nexwin, em ê bi ser kevin. Leşkerên Ziware, Firamerz, Tûsê Nûzer, Gîw dibin ecêbek mezin. Di destê wan de gurz hene.

Nifşê Rustemî destê daye gurz

Gurzî giranî çinigeyê bi berz (b. 694)

Nasî wekî pîlaykêşaye serda

Zirê Dawudî helgirti u berda (b. 695)

Di beytê de behsa zirê (zirx) Dawidî heye, behsa hezretî Dawid dike. Di beytan de behsa Gîwî Ejderha heye ev gurzek e. Bi vê gurzê Giwî Ejderha leşkerên bêjimar dikujin.

Le pir heybet e Gîwî 'ejder çaw

Gurzê giranê helgirte we benaw (b. 719)

Şer giran dibe û hemû leşkerên Îranî şer dikin. Cihangîr di nav leşkeran de dimîne, leşkerê Tûranî wî dorpeç dikin. Cihangîr du'a dike ji bo ku nemire.

Babê xo min nedît zor bû xeste hal

Rehmê li min bike Xuday (Zulcelal) (b. 739)

Piştî min bal Xodêy min heqî bedir

Xûna min wek Zorabî da nebîte heder (b. 740)

Ziware, Firamerz û Tûs, Cihangîr xilas dikin. Evrasyab pir xemgîn dibe. Di beytê de peyva Tawus derbas dibe û hin caran peyva Yezdan jî derbas dibe. Em ji vir jî tê derdixin ku bi baweriya xwe ve girêdayî ne.

Cihangîr rûniştî le ser textê zer

Ber serê xo rakir çiqey Tawus per (b. 754)

Şah Key Kawis xelatekê dide Cihangîr û hemû bi hev re şad dibin.

Bab û bira û mam hemû bûn dilşad

Le gem û 'acizya yekcar bûn 'azad (b. 781)

2.3.12. Behsa Xewna Rustem li Bilxar

Rustem di xewna xwe de dibîne welatê Îranê ji aliyê Turaniyan ve hatiye dorpeçkirin. Ji xewê hişyar dibe dibêje ev xewneke rast bû divê herim welatê xwe rizgar bikim. Li gel leşkeran dikevin rê. Evrasyab dibîne ku Cihangîr bi hîle û mekran diçe ser text rûdine vê carê ji Pîran dipirse ka divê çi bike. Pîran dibêje Rustem hîn venegeriyaye here bi leşkerên xwe Îranê bistîne. Evrasyab sibehekê Îranê dorpeç dike. Wê deme Zal û Key Kawis jî du'a dikin ji bo Xwedê û ji bo daxwaza vegeza Rustem.

Zor rehmê bike leşkerê 'Îran

Hem be Key Kawis padişahê Keyan (b. 857)

Ya Reb be hacet 'ewilyayê kîram

Zererê nebînit 'ewladanî Sam (b. 858)

2.3.13. Vegera Rustem

Rustem piştî xewna xwe vedigere Îranê û dibîne bi rastî jî Îran hatiye dorpeçkirin, Zal û Key Kawis du'ayan dikin. Di beytan de em rastî gelek navên Xwedê tên wek navên Perwerdigar, Zulcelal, Cebare, Xaliq û hwd. Têsiira olê berbiçav e.

Kes temaşa kir Zalê 'extiyar

Hivî û du'a diket Perwerdigar (b. 863)

Rustem dibîne Firamerz û Ziware li piştta pehlewaneke nûciwan şer dikin. Dibêje gelo ew kî ye ciwanek ewqas xweşik û pehlewane. Evrasyab, Behreman û şahê Tûranî dibînin ku Rustem hatiye, pir aciz dibin û dibînin ku leşkerê Îranê her diçe zêdetir dibe. Malbata Îraniya wan têk dibin. Zer'elî diçe xeberê dide leşkeran ku Rustem vegeyriyaye, leşker şa dibin. Rustem tê cem Zal û dibêje ew ciwan kî ye, rastiyê bêje. Zal jî eşkere dike.

Le (nuşfe) tu ye 'ew neviyê Zal e

Maye 'eşsana Xuday (zulcelal) e (b. 896)

Navê wî Cihangîr şêre zeman e

Kurê kiça şahê Mazinderan e (b. 897)

Zer'elî diçe li Evrasyab dibêje ew ê çawa be halê te, ev roja te ya dawî ye. Rustem jî Şahê Tûran re dibêje qey te Zal bê kes hesiband, va ye Xwedê ez vegeyrandim. Di vir de jî tesîra olê diyar dibe.

Le nik te weha bû ku bêkes e Zal

Dê min zivirînît Xuday (zulcelal) (b. 919)

Li vir bûyer û metn diqede lê em nabînin Cihangîr dema bavê xwe Rustem dît çî bertek da. Di metnê de Rustem kurê xwe dibine lê Cihangîr bavê xwe dît an nedît em nizanin.

2.4. Ji Aliyê Rûxsarî ve Danasîna Beyta Rustemê Zal

2.4.1. Wezn

Ev metna Rustemê Zal destaneke menzûm e. Ji 932 beytan pêk hatiye. Bi şiklê serwaya mesnewiyê “aa-bb-cc” û bi wezna kîteyî hatiye nivîsîn. Her riste bi 11 dengan pêk tê. Le hin caran ji 11ê kêmtir deng hene di beytan de, hin caran jî ji 11ê zêdetir. Mesnewî hem navê teşeyeke nezmê ye hem jî navê cureyek ji berhemên klasîk e.⁶⁶ Mesnewî li vir wekî teşeyekê nezmê ye. Weznê deh heceyî ku hemû metnên Şahnameya Kurdî li gor vê weznê çêbûne. Ev kelepura musîkiyê ji serdema Sasaniyan e.⁶⁷ Her çiqas li gor hin pisporan wisa be jî, car car em dibînin wekî metna Rustemê Zal 11 heceyî ye.

2.4.2. Cure

Ev metn behsa lehengan dike ku di dîrokê de şerên welatan pêk anîne. Şerê Îranê, Bilxarê û Mazenderanê tê de cih digre. Wekî me li beşa yekem bi hurgilî diyar kir bûyerên ku di dîrokê de têsîra wan li civakê hatibin û guherînên mezin pêk anîbin, wê demê em dikarin metnekê bixin nav cûreya destanê. Ev metn jî mînakek e ji cureya destanê.

2.4.3. Ziman/Şêwaz

Zimanê vê metnê bi kurdiya kurmancî hatiye nivîsandin lê bi elifbêya aramî ye. Zimanê metnê xwerû ye lê hin peyvên erebî û hewramî tê de hene. Nivîskar hunerên ciwankariyê bi kar aniyê. Di metnê de, xalek an jî xêzek di binê tîpê de an jî li ser tîpê heye.

⁶⁶ Adak Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş: Nûbihar, İstanbul, 2013, r. 407.

⁶⁷ Yaqutî, Mensur, (wer) *Berzuname, Şahnameya Kurdî*, întîşarati Qoqnus, Tahrân, 1391/2012. r.9.

Ew ji bo transkirîpsiyona metnê ye. Ji ber ku hin dengên erebî di elîfbêya kurdî de nînin ji bo ew ferqa tîpan diyar bibe ev pergal hatiye bikaranîn.

2.5. Kesayetên Destana Rustemê Zal

2.5.1. Azade Mehre û Azade Çehre

Dema Rustem welatê xwe terk dike diçe daristanekê, li wir bi dêw re şer dike paşê li daristanê digere rastî dilêrekî tê.

Li nav bîşî dît lawek nû ciwan

Bejin balayê wekû serwa rewan (b. 144)

Dilêr xwe dide nasîn û dibêje ez heft sal e di destê dêw de exsîr im.

Meşhûr e navê min 'Azade Mehre

Babê min jî navê wî 'Azade Çehre (b. 150)

Rustem, Azade Çehre ji dêw xilas dike û wî dibe cem babê wî Azade Çehre.

Rustem mizgîn virê kir 'Azade çehre

Min xilas kiribû 'Azade mehre (b. 158)

2.5.2. Behreman

Behreman ji malbata Tûraniyan e. Di derheqê kesayetiya wî de agahî nîne. Li hember Îraniyan şer dike. Lehengekî bi qawet e.

Behreman ji kerba destî da be gurz
Hejandî gurzê xo wek çiyayê berz (b. 817)

Berz kir û bilind berday ji hewa
Dana serê Cihangîr şêrê 'ejdeha (b. 818)

2.5.3. Bîjen

Di beytan de Bîjen kurê kê ye em nizanin lê kesayetekî ne Tûranî ye. Li hember Evrasiyab şer dike. Kesayetekî bihêz û şervan e. Li gor Şahnameyê, Bîjen kurê Gîw e û yek ji lehengên navdar ê serdema Key Xusrew e.⁶⁸

Deh hizar li gel zavayê Rustem
Çûn ligel Bîjen bê tirs û bê gem (b. 691)

2.5.4. Cihangîr

Cihangîr kurê Rustem e. Serlehengê metna Rustemê Zal e. Jidayikbûn, mewlida Cihangîr, şerên ku Cihangîr tê de şer kiriye hemû di metnê de hene. Kesayetekî derasayî ye ji ber ku jidayikbûna wî cuda ye.

Mangî şeş nanig ve heft mangî sal bû
Zor bi heybet wekî Rustemê Zal bû (b. 299)

Di metnê de em nizanin diya Cihangîr kî ye. Tenê di beytekê de navê diya wî derbas dibe. Di vê metnê de leheng kur in, jin tê de nînin.

⁶⁸ Shahab Vali, *Kurdên Yarsan*, Wer: Sevda Orak Reşitoğlu, Avesta, İstanbul, 2018, r. 330

Kiça Zahidê 'Ebidê serwer

Şubhî Rustem kiribû şêrê namwer (b. 285)

Çima navê wî Cihangîr danîne ne diyar e.

Wezîr û şêxan kiribû ve tedbîr

Navê wî kurî bibên Cihangîr (b. 297)

Cihangîr heta mezin dibe jî babê xwe nabîne û ji diya xwe dipirse ez ewladê kê me? Pê dihese ku babê wî çûye dibêje ez ê jî herim. Cihangîr ji bavê xwe pir hez dike ji ber ku dizane bi xeletî kurê xwe Zorab kuştiye û bi vê êşê ji welatê xwe dûr ketiye.

Kes baqî nabit li dînya fanî

Û heta ser nabit bi kameranî (b. 321)

Cihangîr di temenkî biçûk de bi nav û deng dibe. Her çiqas biçûk be jî qedrê wî bilind e.

Serokê leşkerî wezîr û 'emîr

Hemîyan maçî kird destê Cihangîr (b. 396)

Dema Cihangîr diçe Tûranê Evrasyab dizane ku Cihangîr ji mala Îraniyan e. Ji ber ku bi bihêzbûna xwe û bi qilafeta xwe Cihangîr xwe diyar dike. Dema diçe ji bo şer bi ser dikeve û leşkeran teslimî wî dike.

Şahê Cihangîr kird serokî leşker

Leşker teslim kir hemû seranser (b. 402)

Cihangîr bi rêbertiya xwe derdikeve pêşberî me. Kesekî xudan fikr û raman e. Temenê wî biçûk e lê dema rastî birayê xwe Firamerz tê ji wî dixeyide.

Wekî 'ew qise bihîstî Cihangîr

Le daxan rengê wî reş bû wekû qîr (b. 571)

Gotî: 'ey nemerde dureşî duran

Rustem pehlewan bo nîne li 'Îran (b. 572)

2.5.5. Diya Cihangîr

Navê diya Cihangîr di beytê de derbas nabe. Diya Cihangîr jina Rustem e. Dema Rustem welatê xwe terk dike û diçe li wir bi kîça şah re dizewice û Cihangîr tê dinyayê. Ji aliyê kesayetiya diya Cihangîr de em nikarin tiştêkî bibêjin. Di beytê de tenê bi navê "kîça şah" cih digre.

Padişahê zahid kîçkî hebû

Xuştivî nazenîn mehbûbe 'ew bû (b. 71)

Di behsa jidayikbûna Cihangîr de navê bavê diya Cihangîr derbas dibe.

Kîça Zahidê 'Ebidê serwer

Şubhî Rustem kiribû şêrê namwer (b. 285)

2.5.6. Evrasiyab

Şahê Tûran e. Di vê metnê de dijleheng e. Dujminê malbata Îraniyan e. Ew jî bi qawet e lêbelê li hember malbata Îraniyan têk diçe. Ji Rustem û kurên wî ditirse.

'Evrasiyabî wek zanî beqar

Dinya li ber çavan taristan û tar (b. 369)

Evrasiyab bi şiklî ve çawa ye temenê wî çend e em nizanin, di metnê de 'emrê wî ne xuya ye. Kurê wî heye an nîne em nizanin.

'Evrasiyab şah padişayê Tûran

Leşkerî 'îna bû ser xakê 'Îran (b. 416)

Navbera Evrasiyab û Pîran bi qawet e. Pîran wek alîkarê wî yê yekem e, şêwirmendê wî ye. Dema şer dest pê bike an bikeve tengasiyê li Pîran dişêwire.

Şahê 'Evrasiyab maye sergerdan

Hinartî gazîkî 'ecele we Pîran (b. 835)

Xizmetkarê Rustem Zer'elî diçe meydanê û li Evrasiyab dibêje tu yê îro bimirî, wî biçûk û bêhêz dibîne. Malbata Îraniyan xwe ji her kesî pêşdetir dibîne û dizanin ku ew dikarin zora her kesî bibin.

Gazî kir gotî 'ey 'Evrasiyab

Dê çewa bît halê te malit bu xirab (b. 903)

2.5.7. Firamerz

Kurê Rustem e. Di metnê de Firamerz kesayetekî bi hêz e. Hem ji aliyê eqlî û hem jî ji aliyê şerzaniyê de pêşeng e. Dema bavê wî Rustem diçe rê li ber Zal jî dixê û wêrekiya xwe nişan dide.

Firamerzî `eve wek bihîst li Zal

Gotî: babê pîr borîn li te sal (b. 514)

Rustem ku `êsta li `Îran nîne

Ger bo şerî nebit kur ma bo çî ye (b. 515)

Wekî me gotibû serleheng Cihangîr e û di metnê de pesnê wî zêde ye lê dema şerê Cihangîr û Firamerz dest pê dike Firamerz jî pir zana û jêhatî tê xuyakirin.

Firamerzî `evcare wekî becke şêr

Gurzekî weşande serê Cihangîr (b. 582)

2.5.8. Firuxşah

Firuxşah şahê Bilxar e. Kesayeteke ne Îranî ye. Dijminê malbata Îraniyan e. Di beytê de pir kêr derbas dibe.

Tu min Firuxşah padişayê Bilgâr

Hatibû sehra bo rav û bo kar (b. 212)

Rustem bi wî re û bi leşkerên wî re jî şer dike û bi ser dikeve. Li ser textê wî rûdine.

Paşî talan kîrnê Rustem wekû şêr

Roniştî l`ser textê Firuxşahê bê xêr (b. 255)

Rustem bû paşa li milkê Bilgâr

Hebû zor leşker bê hed û jimar (b. 256)

2.5.9. Gîw

Zavayê Rustem e. Tevlî her şerî dibe wêrek e. Nêzîkiya wî ji bo Rustem pir bi qawet e ji zavayekî zêdetir ji dil tevdigere.

Gîwî dilawer zavayê Rustem bû

Bo hate meydanê her wekû şêr bû (b. 526)

2.5.10. Gûderz

Kesayetekî ji malbata Îran e. Lê di metnê de em nizanin kurê kê ye tenê di 4-5 beytan de navê wî derbas dibe. Di metnê de Gûderz wekî kurê Rustem tevdigere bi Firamerz re dikevin şer.

Gûderzî dilêr ligel kêwî bi şêr

Pehlewanekê mezin ciwan û jîr (b. 510)

Dema Rustem diçe teva Ziware digirî.

Ziware û Gûderz herdu giriyan

Maçî kirin destê Rustemî pehlean (b. 23)

2.5.11. Hûman

Di beytê de tenê sê caran navê Hûman derbas dibe. Ji wir em tê derdixin ku Hûman kesayetekî ji malbata Tûraniyan e. Hûman jî wekî Pîran rê li ber Evrasiyab dixê. Ew jî weke şêwirmendê Evrasiyab e lê ji Pîran gavek paşdetir e ne wekî wî navdar e.

Hûman gazî kir: şahê 'Evrasyab

Xelatan zû bidene hed û hisab (b. 381)

Li gel wî hinartin zû bo Cihangîr

Hûmanê zanaye zor 'eqil û jîr (b. 382)

2.5.12. Key Kawis

Key Kawûs an jî Kawus yek ji kurên Key Qubad e û bi daxwaza bavê xwe cihê wî digire.⁶⁹ Kesayetekî Îranî ye û şahê Îranê ye.

Ûeta Key Kawis şahê 'Îran bît

Naçimewe Xudê biket 'Îran wêran bît (b. 282)

Key Kawis kesayetekî bi hêz e ji ber ku şahê Îranê ye û dujminên wî gelek in. Di beytan de Key Kawis kesekî baş û mezin e. Lê Cihangîr ji Key Kawis hez nake ji ber ku Rustem ji bo wî bi xeletî kurê xwe kuştiye. Cihangîr naxwaze ji bo wî şer bike û her dem ji birayên xwe re dixeyide.

Me'lûm e li nik min we nîne namûs

Bo çî şerî diken ji bo Key Kawis (b. 575)

Lê çiqas Key Kawis kesayetekî bi hêz be jî welatê wî û şexsê wî Rustem xilas dike. Ji ber ku Rustem welatê xwe terk kiriye û çûye dijmin jî vê wekî fersendê bi kar tîne. Malbata Tûraniyan hemû êrişî welatê Îranê dikin Key Kawis ji vê neçar dimîne û jî Zal re nameyekê dişîne. Zal bi hawara wî tê û herî dawî di êniya şer de Rustem tê û Key Kawis û welatê Îranê xilas dike.

Li paşan 'evca rabû li cih Tûs


Da destê Zalê nameya Key Kawis (b. 430)

⁶⁹ Vali, *Kurdên Yarsan*, h.b. r. 130.

Şahê Key Kawis sifre nû berda
Kirdî pîşwazî Rustem bi dil da (b. 928)

2.5.13. Nerîman

Nerîman bavê Zal e. Di beytê de navê wî du caran derbas dibe. Di derheqê kesayetiya wî de agahî nîne. Rustem neviyê Nerîman e. Şecereya malbata Sam li gorî Şahnameya Firdewsî bi vî awayî ye:



Şahê Key Kawis labîn li serê text
Zalê Nerîman parçe kîn bi cext (b. 616)

Le nav leşker da Rustem pehlewan
Xo wî veşartî neviyê Nerîman (b. 862)

⁷⁰ Vali, *Kurdên Yarsan*, h.b. r. 209.

2.5.14. Pîran

Wekî şewirmendê Evrasiyab yanê şahê Tûran e. Kesayetekî nebaş e. Di metnê de bi hîle û fêlan tevdigere. Dema tiştê biqewime Evrasiyab bi wî dişêwire.

Şahê 'Evrasiyab maye sergerdan

Hinartî gazîkî 'ecele we Pîran (b. 835)

Wî gote Pîran malim bû xirab

Bidine min rê'ya baş û ya sewab (b. 836)

2.5.15. Rustem

Rustem kurê Zal e. Kesayetekî girîng e di nav kurên Zal de lewra em di metnê de dibînin şah û wezîr ji bo Rustem dişixulin. Rustem padişahê Bilxarê ye. Di metnê de her çi bûyerek biqewime di'a ji bo Rustem tê kirin. Di vir de Rustem wek pêxember e. Di ferhenga Îranê ya piştî Îslamê de bêguman Rustem hûrtirîn û bibandortirîn lehengê efsane û riwayetên kevn e ku seranserê çand û edebiyata Îranê tecellî dide.⁷¹

'Emîran li gel wezîrê kerem

Hatin maçî kir du destê Rustem (b. 99)

Rustem lehengekî pir bi hêz e çi derkeve pêşiya wî dikare bi ser keve. Ji mirovên din bi hêztir e. Di beytekê de Rustem li ejderhayê tê şibandin.

⁷¹ Yaheqi, Muhammed Cafer, *Ferhenge Eshatir ve Dastanvareha der Edebiyate Farsî*, Intişarate ferhenge Muasır, Tahran, 1386/2007, r. 394.

Wî kebend havêt wekû 'ejdehar

Dêwî jî kebend vekir kir hewar (b. 135)

Gotin ya Xudayî lê bike mubarek

Bi şerafeta Sûrey-i Tebarek (b. 100)

Di vê beytê de Sûrey-i Tebarek⁷² sûreya Qur'anê ye. Di vê metna Rustemê Zal de wekî serenavê de xuya ye behsa Rustem tê kirin lê zêdetir behsa lehengê Cihangîr heye. Lewma jî di vê metnê de em Rustem wekî kesayetekî asayî kurê Zal dibînin.

Di vê rewşê de mirov dikare bêje ku ew kesayetekî dîrokî ye lê bele wexta ku di nav çîrokên netewî de cih digire wê çaxê dibe kesayetekî epîk. Êdî hewce nake mirov hebûna wî ya dîrokî red bike ji ber tevgerên wî yên derasayî.⁷³ Rustem dema ji welatê xwe dûr dikeve û diçe rojekê xewnekê dibîne û xewna wî rast derdikeve diçe welatê Îranê ku di bin zeftê de ye rizgar dike. Dema Rustem digehe Îranê bira û kurên wî ji bo Îranê li hember Tûraniyan şer dikin heta wê demê jî welat di bin xeterêyê de bû lê hatina Rustem di wê kelîyê de rewşê diguherîne. Rustem wek xilaskerê welêt e. Em dikarin bibêjin kesekî him dîrokî û him jî derasayî ye.

Rîwayetên heri girîng û herî bi şan di şahname de di serdema Keyaniyan derbas dibe û sebaba wê jî hebûna Rustem e.⁷⁴

2.5.16. Şahê Keyan

Key tê wateya padişah û nîşaneyê malbata Îraniyan e. Di mîrekiya Îranê de gelek kes bûne şahê Îranê û ev bi verasetê çêbûye. Dema li pêş navê padişahêkî 'key' hebe, em dizanin ku ji malbata Îraniyan e.

⁷² <http://www.multimediaquran.com/quran/turkce/cuzler/cuz29/arap-561.htm>

⁷³ Vali, *Kurdên Yarsan*, r. 250

⁷⁴ Mirabdîni, Ebutalib, *Sedîqiyân, Mehîndot, Ferhenge Esatiri-Hemasi, Îran be Riwayete Menabie Bed ez İslam, cild 2, Keyaniyan*, İntişarati Pejuheşgahe Ulumi İnsanî ve Mutaleatê Ferhengî, Tahran, 1386/2007, r. 14

Bêje min bi rastî tu pehlewan î
Yan tu yê ji mala şahê Keyan î (b. 568)

Gotî 'ey ciwan min Firamerz im
Kurê Rustem bi xudanê gurz im (b. 569)

2.5.17. Şahê Luxan

Şahê Luxan di metnê de tenê careke derbas dibe ji wir jî em tê derdixin ku şahê Luxan xwezûrê Rustem e. Dema Rustem welatê xwe terk dike û diçe rêya Mazenderanê bi kiça şahê Luxan re dizewice. Luxan li ser rêya Mazenderanê navê herêmekê an jî bajarekî ye. Bavê diya Cihangîr e.

Jinan gazî kiribû şahê Luğan
Kiçka xo kar kir wekî horê cinan (b. 93)

2.5.18. Tûsê Newzer

Di beytan de carna weke Tûs carna jî Tûsê Newzer derbas dibe. Di metnê de Newzer kî ye em nizanin qala Newzer nayê kirin. Tûsê şehzadeya Îranî kurê padişah Newzer e û yekem car di şerê hemberî Efrasiyab de tevlî artêşa bavê xwe bûye.⁷⁵ Ji vir em dizanin ku Tûs ji malbata Îraniyan e. Di beytê de jî li hember Evrasiyab şer dike li gel Cihangîr û Firamerz.

Tûsî Newzer çavî serdaran
Wan xo hêzî kiribû şerê Tûran (b. 692)

⁷⁵Valî, h.b. r. 122

2.5.19. Zal

Bavê Rustem e kurê Nerîmanê ye. Di beytê de navê wî wek Zalê Zer e. Zal wateya kal de ye.⁷⁶

Şahê Key Kawis labîn li serê text

Zalê Nerîman parçe kîn bi cext (b. 616)

Zal di vê metnê de extiyar e nikare şer bike lê dîsa jî bi qawet e.

Zalê zer le gel pehlewan vekan

Şikandin 'ewan hemî leşker Tûran (b. 827)

2.5.20. Zerbekir

Zerbekir leşkerekî Tûraniyan e. Dema Cihangîr bi Tûraniyan re şer dike navê wî derbas dibe.

Paşî xo gehande Zerbiker befar

Hicrûmî lédabû wek şêrekê bi kar (b. 361)

Zerbekir zanî nîne ji geyr firar

Hîç çarey nîne revî wekû mar (b. 362)

Li gel leşkeri we kirde Zerbekir

⁷⁶ h.b. r.229.

Cihangîr 'azaye wekî şêrekê fir (b. 363)

2.5.21. Zer'elî

Xizmetkarê Rustem e. Lê ev kesayet di versiyonên din de nîne. Di şahnameya Firdewsî de jî navê vî kesayetî nayê gotin. Ev jî resenbûna destanê derdixê holê.⁷⁷ Dema Rustem diçe Zer'eli ji dûriya wî pir xemgîn dibe.

Wextê ku Rustem sil bû ji kovan

Zer'elî melûl bû zor bû peşîman (b. 259)

Dema Zer'elî Rustem dibîne hespê Rustem Rexş, Elî nas dike. Ajal jî derasayî ne.

Ca Rexşî ji dûrveve 'Elî nasî

Birbû hîle hebil zor bi 'esasî (b. 271)

2.5.22. Ziware

Kurê Zal e û birayê Rustem e. Di metnê de Ziware kesayetekî ne zêde bi nav û deng e. Behsa wî û mijareke taybet di metnê de derbas nabe. Dema Rustem welatê xwe terk dike û diçe Ziware li dewsa wî dimîne û ew şer dike. Ziware heta demekê haya wî jê nîne ku birayê wî Rustem çûye.

'Eger bîzanît Ziwareyê navdar

Zû Mazenderan dê lêket demar (b. 179)

Di metnê de em dibînin Ziware ji nehatina Rustem perîşan dibe bêyî Rustem nikare biryarê bide. Zal aciz dibe ji Ziware, ji ber pasîfbûna wî jê re xeberan jî dide.

Zalê zer tore bû ca li Ziware

Gotî bê hiş î nefam î bê çare (b. 447)

⁷⁷ Vali, *Kurdên Yarsan*, h.b. r.73.

Li cihê Rustem tu mayî bo Zal
Şêtê serserî pîs î bedxîsal (b. 448)

2.5.23. Kesayetên Din

Gurgîn

Gorgînê kurê Mîlad yek ji lehengên Îranî ye di serdema Key Kawûs û Key Xusrew de. Wexta ku Key Kawûs biryar dide ku seferekê amade bike hemberî welatê Mazenderanê Gorgîn wê çaxê di Şahnameyê de xuya dike cara ewil. Bi arteşa padişah re ber bi Mazenderanê ve derdikeve rê li wir bi hemû arteşê re tê girtin û Rustem wan azad dike.⁷⁸ Di beytan de jî wisa ye

Bavê navdaran Gurgînî Mîlad

Şîdo û Şapor Qarin û Ferhad (b. 469)

Ferhad

Lehengekî Îranî ye ku di serdema Key Kawûs de jiyaye û nameya Key Kawûs radigihîne padişahê Mazenderanê. Piştî ku bersivê digire û tîne cem Key Kawûs, hemberî arteşa Mazenderanê şer dike. Ev kesayet pir kêr xuya dike di Şahnameyê de. Dîsa jî xwedî cihekî taybet e.⁷⁹ Di beytan de jî pir kêr navê wî derbas dibe lê em dizanin kesayetekî Îranî ye ji bo welatê Îranê şer dike.

'Ew pehlewane 'Îranî-zemîn

Ferhad şîr û Qarin û Gurgîn (b. 508)

Şîdo, Şado û Qarin

Kesayetên Îranî ne. Di beytan de pir kêr derbas dibin. Lê em dizanin ji malbata Îraniyan e ji ber ku teva Rustem ji bo welatê Îranê şer dikin.

Bavê navdaran Gurgînî Mîlad

Şîdo û Şapor Qarin û Ferhad (b. 469)

⁷⁸ Valî, *Kurdên Yarsan*, h.b. r. 341.

⁷⁹ Valî, *Kurdên Yarsan*, h.b. r. 344.

BEŞA SÊYEM

3. TRANSKRÎPSIYONA BEYTA RUSTEMÊ ZAL

3.1. Elîfbeya Transkrîpsiyonê

ء	ث	ج	ح	خ	ذ	ش	ص	ض	ض	ط	ظ	ع	غ	ق
↓	↓	↓	↓	↓	↓	↓	↓	↓	↓	↓	↓	↓	↓	↓
'	Ş	C	H	H	Z	Ş	S	Z	D	T	Z	'	G	K

3.2. Transkirîpsiyona Beyta Rustemê Zal

1. Ya Xwedayê pak û bê ceh û mekan
'Înane wicûdê 'erd û 'asiman
2. Bê mişl û nezir î bê xew û xarin
Bê heval û şerîk î herî mazin
3. Heft 'asimanî bilinde bê sitûn
'Înane wicûdê bi (kun fe yekun)
4. Heyv û roj li gel sitêrî 'asman
Bi îrada te wa li dewrê geryan
5. Hîç kes nizanî ya Reb zatê te
Çi zana nizanin bi şîfatê te

6. Şaha li xewfê qehrê te mat in
Li 'aqarê hukmê te di bê desthilat in
7. Çend padişahan wekî Cemşîdê Cem
Çend pehlewanan her wekî Rustem
8. Bi destî qudret 'înane wicûd
Wekî 'axir da nemane mewcûd
9. Bi 'ezemeta te padşah û sultan
Şelat û selam bê hedd û hisban
10. Li ser merqedê nûrîn rewze'ê Muḥemed
Fexrê ka'inat Resûlî 'emced
11. Li gel yaran û 'eshabê kiram
We li gel 'ehlê mal û cumle 'Îslam
12. Her çend bende me li derga tey nûrîn
Meḥrûm nebim şefa'eta (Yewm ed-dîn)
13. Bide tewfîqim ya Xaliqê bê neẓîr
Binivîsim beḥsê şerrê Cihangîr
14. Di gel Rustemê cihan pehlewan
Da bête gotin ḥeta 'axirzeman

15. We meşhûr bibû rojek li rojan
Rustemê Zalê li gel yaweran
16. Bi keyf û sirûr û şahî û xoşî
Wextê raborand bi badenoşî
17. Hate hizira wî kuştina Zorab
Cergê wî sotî her wekû kebab
18. Bi gem û hesret û bi bêzareve
Li ser textê xo kefte xwareve
19. Berdabû girî bi şîn û feryad
Nalî jê diçûn bo çerxê widad
20. Gotî: 'Ey heware helyam û birya
Ji ber Zorabî 'agir dilê min girya
21. Yarêt meclisê gotin bi Rustem
Heyfe wî newe'î viryan nexo gem
22. Rexşê der'êxist bi qehr û bi kîn
Gotî bi Rustem ferzendê dilberîn
23. Ziware û Gûderz herdu giriyan
Maçî kirin destê Rustem pehlewan

24. Gotin me hîvî ye fêrisê navdar
Dujmina dilxweş neke 'Îranê diyar
25. Cewabê lédave Rustem bi giryan
Hêram bît li min welatê 'Îran
26. Her hiwsa min ne cên bab û birader
Qewm û xizm û 'eqriba 'ew yekser
27. Çend cefa û zehmet birin min bo 'Îran
Şarêt turkanî gelek kirme wêran
28. Her şahê turka min kiribû zebûn
Çend pehlewanan kirine sernixûn
29. Navê min meşhûr e li hemû cihan
Babê Filamerz im gewrê dilberan
30. Wextê 'ez diçim bo meydana ceng
Qirar nagirin li behra neheng
31. Çend dêwa ji ber min kirbû hewar e
Cergê dêwê sipî min kir pare pare
32. Gîrêdar bûbûn çend padişahan
Bi destê dêwan li Mazenderan

33. Min serbest kirin ji şerê dêwan
Qet xêr min nedît li şahê 'Îran
34. Li vê dunyayê bûm 'ax û 'oh e
Çi bike li dostê zemanê ho ye
35. Çend hîvî kirine biraderan
Qet nezivirî Rustem pehlewan
36. Reça qebûl nekirye bê midar e
Siwarî Rexşî bû rêgird sehare
37. Rexşî ta berda bi giriya noşîn
Çûbû ser kurê Zorab bi nalîn
38. Got: 'Ey ruha min dê lez ke tu rabe
Bi karê xo ve canim dê rabe
39. Canê min dê helse kifnî baca ke
Bes e bes canê min her tu cefa ke
40. Piştê bide piştîm 'ezîz î can î
Belku têk bidîn textê 'Îranî
41. Bi leşkerê 'Îranî bideyne şikest
Bibestin destê şah Kawus bi dest

42. Da t k bideyn ve zinc ra  ahan
Par e par e k n le ker    ran
43. B  vefa'  min kir kirdirim li xo tu
Min bi dest  xo bi xo kirim rencer 
44. Kur  min d  rabe min bitn  bal im
D rey Filamerz   birane mal im
45. Zor hewar  kir be cerg  kebab
Qet deng guh l  neb  li gor  Zorab
46. Got :  Ey kurim her tu bi selamet
D tna te   bab  kefte qiyamet
47. Li dinyay  da min keftim ser zara
Bo  ekayet li ko ik   sera
48. Her dib jin Rustem zor kir  xeta
Ku tina Zorab  kur  xo xeta
49. Bi   n   giryan bi dil  pir jan
Ber  xo dab  r ka Mazenderan
50.  end roj    end  ev her di i li  ar

Ĥeta Mazenderan negirtû qîrar

51. Zahid bo navê şahê Mazenderan
'Abid û zana bû meşhûr li cihan
52. Nobetçîyê kelatê weku Rustem dî
Xeber bo şahî zû ziwa berdî
53. Hate xor paşa li kelatê herdem
Çûbû pêşiya cenabê Rustem
54. Li gel şazdeyê hemû vezîran
Girgirê bajêr cumleyê 'emîran
55. Danaye ser textê bi qedr û qîmet
Dest danan nezirî bo kirin xizmet
56. Xizmet bo wî kir bi dil û bi can
Paşa û wezîr girgirê mîran
57. Li dengê saz û bilûr û rebab
Ma li keyfê da dilî bû kebab
58. Cihêlêt roma nek şox û nazenîn
Şerbet gêrandin bi destê rengîn

59. Xoş rabûrand heta ku nîv şew
Rustem pehlewan kir bombilî xew
60. Cîh bo çêkirin xewt heta seher
Wextê roj helat rabû şêrê zer
61. Çûbû dîwana şah û wezîran
Hatine xizmeta cihan pehlewan
62. Paşî pisyar kirin gotin bi Rustem
Bo çî dilê te pir e li derd û gem
63. Bo me beyan bike bo çî zibûn î
Bo çî bi şîn î tazî û girîn î
64. Gotî: 'Ey yaran dipirsin 'eşwal
Teqdîr ho danaye Xuday (Zulcelal)
65. 'Ez rûniştibûm rojek li rojan
Bi keyf û xoşî li gel yaweran
66. Hate bi bîra min kuştina Zorab
'Agir kefte dilê min her weku kebab
67. 'Ez rabûm tûre bûm li şahê 'Îran

Terk kirim hemû bab û birayan

68. Zor reca ji min kir min nekir qebûl
Hatime bo vêre bi dilê melûl
69. Paşay gotî tu hatî serçavan
Gelek bi xêr hatî Rustemê pehlewan
70. Tac û textê min di gel milk û malî
Pêşkeşî te bin 'ey nifşê Zalî
71. Padişahê zahid kiçkî hebû
Xuştivî nazenîn mehbûbe 'ew bû
72. 'Ew kiçe rojekê hat layê Rustem
Bi qudreta Xudayê xaliqê 'alem
73. Rustem 'aşiqî 'ew kiçe bûbû
Li gel wê kiribûye çend guftûgo
74. Gotî 'ey canê mehbûbê dilber
'Ey hurîsîma balayê serwer
75. Şû bi min ke bi serê te sûnd dixwim
Dê te keme serokê jinanî herem

76. Cewabê lédave gotî bi qurban
Pisyar bi min çi ye cihan pehlewan
77. Here lay babim min jê bike teleb
Gotina şîrîn bi xweş û 'edeb
78. Li paşî kiçeke çûbû layî herem
Zelamek gazî kir paşay nuy Rustem
79. Gote zelumî: tu here nûkah
Zû be zû biro bo layî padişah
80. Bêje bi qurban Rustem 'erz 'eket
Divêt kiçka xo li min nikaş biket
81. Pîya û bilez çû bi xêra rabird
Gotina Rustem 'erzî şahî kird
82. Paşayî wek bihîst zû zû helse bû
Çû layê Rustem ji pêve westa bû
83. Rustem 'erz kird 'ey şahê zeman
Kiçkê li min mar ke li min bike qurban
84. Şahî li şerman serê xo danan

Li paşa gote bi Rustem 'Alan

85. Ya baş e biçime bo layê herem
Şer'en divêtin pirs bi kiçê bikem

86. Bizanim gotina kiçê ka çi ye
Razî dibîtin yan razî niye

87. Kiçê şerm kir li babî bi kerem
Babê gotê cewabê lêm bidem

88. Rastî bo min bêje şermê neke tu
Kiç divêt şû kin lazim e bo tu

89. Dumahiyê gotê babê wefakar
Rustem pehlewan e meşhûr e navdar

90. Ger qebûl biket kiçe text û tac
Hemyan pêşkêş ke başe ne 'îlac

91. Wekî 'ew cewabe bihîst şahê 'enwer
Maçî kir çavêt mehbûba dilber

92. Hinarte duyv qazî zû wî hazir kir
Bo Rustem kiçeke şahî mare kir

93. Jinan gazî kiribû şahê Luġan
Kiçka xo kar kir wekî ħorê cinan
94. Kirbûne ber xo 'elwanî libas
Ġerk bûn serî ta piya bi durr û 'elmas
95. Çav ji kilî reş kirin wek kohê Tor
Çavbelek zahir bûn her wekû bilûr
96. Wekî roj li ġerbî 'ava bû tamam
Çerde berdibûn yêt taze xiram
97. Rustem wê şevê bi meqsûd şad bû
Xo diġel nazenîn ta fecr şad bû
98. Wextê roj helat demê beyanî
Meclis geriyabû bi şadimanî
99. 'Emîran li gel wezîrê kerem
Hatî maçî kir du destê Rustem
100. Gotin ya Xudayî lê bike mubarek
Bi şerafeta Sûrey-i Tebarek
101. Rustem çi 'aza ye cihê xo helsa

Çû maçî kir destê padşah dîsa

102. 'Ew meşgûl bibûn bi keyf û xoşî
Bi 'eys û sirûr bi badenoşî
103. Li paşî çend roja Rustem pehlewan
Çûbû meclis gote yaweran
104. 'Ez zor hez dikem biçîm bo karî
Yesîrî û sehra li mirguzarî
105. Yaweran li gel leşkerê bazar
'Ew çûbûn li gel Rustemê navdar
106. Bo rava masyan li kinarê behr da
'Ew çûbûn bi lez dît dêwek bû peyda
107. 'Ew dêw zû revî wekî ba û baran
Kefte duvî dêwê cihan pehlewan
108. Çû duvî dêwî da Rexş hajot bi gar
Bi deşt û gira da her çû bê firar
109. Heta gehişte bîşekê zor teng
Bîşekê bê sexte bê rê ye bê deng

110. Dêweke zanî qet nîne çî çar
Gotî zêdetir min nîne hewar
111. Paşa xo hazir kir bo de'wa û ceng
Bi sehr hîle lê nemabû reng
112. Xo kiribû guyfî her weku maran
Kafirek kore ye berz e bo 'asman
113. Demê berze bûy li dergahê me gar
Dûkêl ji derî derkeft ya reş û tar
114. Didanêt kafirî her weku çinar
Lêvêt mel'ûnî reş bû weku dewar
115. Mûyêt li ser û leşî wek nişter bûn
Birî û mijûlank wek çiqedar bûn
116. Çavêt wî wek çira da bînî bi şev ji dûr
Belekêt çavan wekû sêleka sor
117. Hate pêş ve gotê: 'Ey pehlewan
Tu bo çî dihêy ser ta'îf dêwan
118. Rustem gotê: 'Ey şumê bedkar

Nav û nîşanêt Xûdê keme 'îzhar

119. Navê te çi ye 'ey dêwê na pak
Hizar wek tu min sipartine ber xak
120. 'Êsta bizane dê çi bi sera 'înim
Çu 'e 'zayêt leşê te dê şikenim
121. Dêwê mel'ûn gotî: Rustemê navdar
Dey neke me di bendî da dû rûzigar
122. Bîniye hicrûmet dêwan li cihan
Navê te berze kem li 'axa 'Îran
123. 'Ev care dêwî dest havête gurz
Gurzekî giranê rakirî wek burz
124. 'Ewî gurzê giran raweşandî li ser
Dana pehlewani mel'ûnê bi hiner
125. Li zerba gurzî giran dêwê bê heya
'Eger ber bûbû 'erdê pêkveya
126. Rustem jêr gurzê kafirî bû xeste
Pîçe xo bada wekî maran gezte

127. 'Ereqê girtibû vê da hat xare
Dêwê got bê dengî yan tu bê zare
128. Xo li pişta hespî havêt ser zemîn
Têhelî 'axê bûye dilê gëmgîn
129. Deng li Rexş kire Rustemê Zal
Li pişta wî rast bû wek teyrê baldar
130. Dest dabû gurzî rakire û yekser
Rakiribû bi qûweta (Ellah ekber)
131. Dana bû serê dêwê bê mefer
Mel'ûnî rakir metal dabû ber
132. Danabû metalê dêwî nabekar
Metal li serî kirbû par par
133. Leşê herdukan li xunê sor bûn
Çavêt wan tarî bûn bi şewq û nûr bûn
134. 'Ev car Rustem wek şêrê zeman
Dilê wî hişyar bû cihan pehlewan
135. Wî kebend havêt wekû 'ejdehar

Dêwî jî kebend vekir kir hewar

136. 'Êkûdu rakêşa bi qehr û bi kîn
Xet rakêşabûn li rûyê zemîn
137. Bi zoran girtin bi dilê pir şor
'Êkûdu rakêşa bi qiwet bi zor
138. Dêwî bi mekr û hîle her dida
Sed caran Rustem rakêşan lê dida
139. Bi didan û lêvan girtibû Rustem
Dêwî radikêşa sed û bîst qedem
140. 'Ev care Rustem helgirt tovê ser
'Êxiste ser 'erd bi zerbê xencer
141. Serê dêwekî li leşî kir cuda
Çûbû cehennem pîsê rûsiya
142. Weqtê Rustemî serê dêwî birî
Sucda şukranî bo Xudawenda birî
143. Li paşa Rustem çendî li pêş e
Bo temaşa û seyran çûbû nav bîşe

144. Li nav bîşî dît lawek nû ciwan
Bejin balayê wekû serwa rewan
145. Pêt wî di vêrê da destan best bû
We zanî Rustem ke 'ew merd bû
146. Cihan pehlewan çûbû ser serî
Bi şemşêrê xo qeyd û bend birî
147. Seyran li nav bîş kir bi tamamî ye
Gotî 'ey cihêl çî li te qewmîye
148. Cewabê daye gotiye Rustem
'Eve deh sal e zêdetir ne kem
149. 'Êxsîrê destê dêwê bêdîn im
Kurê padişahê Meğrib-zemîn im
150. Meşhûr e navê min 'Azade Mehre
Babê min jî navê wî 'Azade Çehre
151. Rojekê çûme nav bağî bo seyran
Li min peyda bû dêwekî bê 'îman
152. Bi seħr û hîle 'ez kirime 'êxsîr

'Înandime vêrê mel'ûnê pîr

153. 'Eve heft sal e min daname ser 'ax
Bi roj û bi şev her dibêjme 'ax
154. Min hîvî heye 'ey şêrê navdar
Min bibî bo layê bab û birader
155. Rustem wekî zanî zû bû 'amade
'Espekî peyda kir ji bo şazade
156. Bi cot siwar bûne bi xêr û rabird
Keftîne rêyekê zor 'aza zugird
157. Yek mang 'ew çûbûn da'îm û li gar
Heta gehîştine bi megrîb diyar
158. Rustem mizgîn virê kir 'Azade Çehre
Min xilas kirbû 'Azade Mehre
159. Qasid gehîşte bo layê padşah
Mizgînî da got bizane 'ey padşah
160. Pehlewanekê mezin bo wê hate
'Azade Mehrî li bende da necat e

161. 'Ew pehlewane li gel şazade
Vêt hatin Zorabe bibe 'amade
162. Her pêşi bibe bo şadiman
Kurê te rizgar bû li bendê dêwan
163. Çend dane cewher li gel zîv û zêr
Dane mizgîn çiya hem di gel feqîr
164. Cewab dabû hemî bajêr û bazar
Da biçîne berahya şazadeyê nazdar
165. Padişahî li gel 'a'xan û wezîr
Çûne berahiya şazadî dilêr
166. Piştî heft sala dirêj û dûr
Şad bû padişa bi dîtina kurr
167. Şay 'Azade Çehre bi sed 'îhtiram
Maçî kir destê kurê Zalê Sam
168. Gote bi Rustem xo bike dilşad
Derd û xem li min te kirin azad
169. Heta 'ez sax bim serê min l'riyê te

Milk û xizînim şaşî bo te

170. Rastî pê bibêjin xelqê hemî şar
Me' lûme ku tu yê şêrekî bi kar
171. Cewabê lêdave Rustem navdar
Cih û mekanê min wê hey li bi Ğar
172. Nav û nîşanê me' lûm in qurban
Xizmetkarê te me ھeta 'axirzeman
173. Padişah gotî bi xêr bêy ser çav
Milk û malê min her bo te ye niwar
174. Da pêlîn li vêrê cihan pehlewan
Biçîne ser behsê şahê Mazenderan

Paşî şahê Mazenderan ji ber nehatina Rustemî zor şeprezeçal bû

175. Da biçîn pêlîn li vêrê pehlewan
Da biçîne ser behsê Mazenderan
176. Şahê Mazenderan zor mabû heyran

Ji ber nezivrîna Rustem pehlewan

177. Dest bi giryanê kirye şîn û zarî
Rahet nebû qet her bê qirarî
178. Wî got 'ey Xuday 'em li dinya fanî
Serê min 'anîn Zalê giyanî
179. 'Eger bizanît Ziwareyê navdar
Zû Mazenderan dê lêket demar
180. Ger bête ser me wekî kîwyê Elburz
Dê çi cewabê dem şêrî Filamerz
181. Çi bi serê min hat li rûyê cihan
Me têr sêran nekir li gel cihan pehlewan
182. Gote wezîran ma dê çewa bî
Da bikeyn tedbîr hej 'aşkera nebî
183. 'Eger bizanin leşkerê 'Îran
Hicûmê dê 'înîn bo Mazenderan
184. Weten û mal û milk dê bikene wêran
Dê siteynin heqê Rustem pehlewan

185. Da biçîn teftêşê bikeyn li `etraf
Li duyv wî bigeryên heta ku Qaf
186. Mehbûbey dilber e herema Rustem
Bê deng e xidoke li ber derd û gem
187. `Ew man xerîkî şîn û zarî bin
Meşgûl û giryan û bê qirarî bin
188. Da biçîne ser `eşwalê Rustem
Li megrîb zemîn bi dilê bê gem
189. Bi şev û bi roj her dikir minet
Padişâ û kurêt xo bo kir xizmet
190. Belê gemgîn bû cihan pehlewan
Padişay gotê bo melûl î qurban
191. Bo çî `aciz û tu ho yî gembar î
Tu bi Xudê bêje min bê qirar î
192. Her çî min hebît mal û dewlet e
Di gel serê min hemî li riya te
193. Bila qurban bin milk û mal û şar

Tu rûne xarê li ser textê zêrîn kar

194. Danîş xarê 'em 'ax in li rêka te

Hemû 'ewladim bende ne li derga te

195. Rustem 'erz kird gotî be paşa

Li Xwam teleb kim malit bit 'awa

196. Lazim 'ez biçim bo wetenê xom

Ruxsetim bide divêm 'ez birom

197. Çend wext e hatim dûr im li diyar

Divêt 'ez biçim bo milkê Bilgar

198. Bi 'emrê 'Efrasiyabî nebah

Tu min ferxizare xo kirye bi şah

199. Divêt 'ez biçim bo layê Bilgar

Da bidem terbiye piyawê nabekar

200. Padişay gotê Xudan aqil û fam

Çend roj sebr ke ciwabê bidem siyam

201. Min 'ewladim bi herdu li gel tu

Bibîn heta Bilgar 'eskerîy bo tu

202. Cewabê dayewe cihan pehlewani
'Erz kir gotê 'ey şahî zeman
203. Qet lazim nîne bikêşî zehmet
Te li heqê min kir gelek merhemet
204. 'Ewcare padişay cewab dabû şar
'Ewî kom kiribûn sîh hezar siwar
205. Got li gel Rustem biçîn bo sefer
Li gel xîvetan û çend bar cewher
206. Dengê mosîqeyê bilind bû li ber
Sîh hizar 'ala ye li pêşî leşker
207. Siwarî Rexşê bo Rustemê sirûr
Nav çavêt wî maçî kir şahê tac durr
208. Şah û şazade û wezîr û 'emîr
Revane kiribûn Rustemê wek şêr
209. Paşî vegeryan şah û wezîran
Keftiye rêkê Rustemê pehlewani
210. Ne bi şev û bi roj nemabû qîrar

Ûeta gehiřtîne bi milkê Bilgar

211. Temařa kir Rustem bi sehra û 'ew beyda

Leřkerek zor dît diyar e li rê da

212. Tu min firexřah padřayê Bilgar

Hatibû sehra bo rav û bo kar

213. Li gel çil hizar leřkerê bi reng

Hemî zîrek in bo meydana ceng

214. Wezîran li gel 'emîran niwa

Xîvetêt zêrîn rakirin li hewa

215. Li hemû xîvetan 'awazê semtûr

Li keyf û xořiyan raborand destûr

216. Rustem wekî dît dil bûbû gemgîn

Bi 'eřwalê xo ra dest girî û řîn

217. Her 'ax helkêřa bi giriyan e 'ew

Bi cergê sotîy periřan e 'ew

218. Çavê xo gêrabû bi qêrî û giriyan

Hîç kes ke dîtibû li qewmî xoman

219. Ne karî dît û ne Zal û ne 'Ewlad

- 'Ew care ji kovana dil bû bi firyad
220. Got leşkerê xo zû bin bi lez û gar
Bigrin bi mêçakî çar 'etrafê şar
221. Xivetêt rengîn û xizîne hemû
Bi mêranî biçin talan kin hemû
222. Leşker bijandî kurê Zalê zer
Helgirin û gurzê giranê gulser
223. Lê kire qêrî bo cihan pehlewan
Serê xo dana bû qelbusa Rexşan
224. Şîrê xo helkêşa xencer li destan
Li hemû layan hicrûma leşker pê dan
225. Leşkerê Bilgar mest û serxoş bûn
'Êk carî hemû bê 'eqil û huş bûn
226. Rustem wekî şêra xorî dest bird
Berê xwe da xîveta tavê xo 'ebird
227. Gulî berdabûn wekî şêrê şerze
Serokêt leşkerî kafiran bûn lerze
228. Hindî binêrî hindî bi şimşêr

- Zor li dujminan gêrane bê ser zêr
229. Hindê serxoş bûn bê 'extiyar bûn
Hindî li tirsan neçar firar bûn
230. Li 'axir kar da Firex şahê Bilgar
Li xewê rabûme weku şê û har
231. Li xewê rabûwe kafirê mel'ûn
Gaziyek berdabû leşkerê xoy zebûn
232. Li gel çil hizar kafirê bê 'eyman
Bi 'eslîhê xo ve çûbûne meydan
233. Lê serê tixownê çûne wek Cîhûn
Çend pehlewana bibûn sernixûn
234. Tacê serê tacan cihan pehlewan
Wekî 'asinger gurzê dawêşan
235. Birqênê şîranî gurmênê gurzan
Li sehay'ê rabûbû bi toz û doman
236. Kafir tumiz Firexşa ji dîve hat
Gehîşte Rustem xo kir helamet
237. Gurzek danabû serê Rustem

Dinya li pêş çavan bû tarî û tem

238. Qilganê serî bi parçe parçe bû
'Aqil û şî'ûr lê neman berze bû
239. Sê def'e gurzî da li serê Rustem
'Ewcare heleqê kebend bird xem
240. Hewarî lédabû li ser kurê Zal
Rakêşa bi qehran şahê dibin betal
241. Zor quwetê girtî şûmê rûsiya
Rustem û kuçya qet lê netirsiya
242. Li 'îzaya 'ewî Rustem lê bû kîn
Girniyî bi devî berda bo kenîn
243. Gîretê girtî cihanê pehlewan
'Îna bû navê Xudayê lamekan
244. Gotî ey mel'ûnê kafîrê bê dîn
Sê gurz li min dabûn bi qehir û bi kîn
245. Sûnd dixom bi zatê hezretê Yezdan
'Êsta te di'êxim tavême meydan
246. Wextê 'eve dît kafîrê dil hezîn

Qewmit lê neçar bû firuxşahê le'în

247. Gurzê giranê bilind kire tenya
Danabû ser serê 'omî bê heyra
248. Qilganê serî û gerden şikiya
Sîne parçe bûy pîsê rû siya
249. Li gel texti fila li 'erzê meydan
Li 'ax û xuynan lêk bibûn geltan
250. Dengê 'aferîn bilind bû li hema
Seday (maşa' Allah) gehîşte sema
251. Bi xencerê 'ev care sîngê hal dirî
Cergê wî derhîna ser jî lê birrî
252. Bi destî girtî serê wî û qilgan
Bi qûwet rakêşa 'î nabû meydan
253. Li 'esker tumiz Firex deh hizar siwar
Kuştibûn bi destê xo Rustemê navdar
254. Rustemî 'emir kiribû leşker yekcar
Xir biket talanê leşkerê kufgar
255. Paşî talan kirnê Rustem wekû şer

Roniştî l'ser textê Firexşahê bêxêr

256. Rustem bû paşa li milkê Bilgar

Hebû zor leşker bê hed û jimar

257. Zincîra 'edaletî 'ewî rakêşa

Li 'edaleta wî hîç nebûn çî paşa

258. Bi keyif û xoşî bi 'eyş û noşî

Bi dengê bilûl û 'awazê xoşî

Beşê hatina Zer'elî li dûv Rustem da bo Bilgar-zemîn

259. Wextê ku Rustem sil bû ji kovan

Zer'elî melûl bû zor bû peşîman

260. 'Ew şet û dîn bûy bi 'ox û bi 'ax

'Ew geriya l'dest û sehra û ser şax

261. Li şarî bû şarî qebil û 'eşîr

'Ew zor li Rustemî geriya bê teqsîr

262. 'Ewro dewsa wî hîç nebûy diyar

Ĥeta gehîşte welatê Bilgar

263. Wî dît leşkerek zor yê Saman

Bê ravê digeryên sehra biyaban

264. Şenge siwarek wî dît li pêş e
Bi gurz û gopalê zorî li pêş e
265. Diyarî çavan da wekû Rustem e
Bi şikl û bi sîmaha her 'ew e
266. Zer'elî wekû dît ew pehlewana
'Înay her wekû can pehlewana
267. Zor hîvî dikir li Xudayê 'ekber
Gotî bo xatira nûra Pêgember
268. Dilxoş bim bi dîtina Rustemê serwer
Şêr û şeyda bûm keftîme xeter
269. Yekcarî li durya Rexş perîşan im
Xizmetê bo nakem zor bi kovan im
270. Xozî vê carê min dîtiba Rustem
Şer Rexş maçî kirba bi dilê bê gem
271. Ca Rexşî ji dûrveve 'Elî nasî
Bîrbû hîle hebil zor bi 'esasî

272. Gelekî helperî her wekû beydax
Zer'elî dengê wî nasî got 'ax
273. Rustem Zer'elî nenasî ji dûr
Hingê dît gubarek şêra ye destûr
274. Rexşî bi navbang des beçî çalak
Bo layê Zer'elî 'ew hatî bê bak
275. Rustem temaşa kir Zer'elî nas kirî
Herdukan pêk ve berdabûn girî
276. Kefte li xarê Rustem pehlewan
Halê Zal û şahî hemî pehlewan
277. Zer'elî gotî her tu bi selamet
Belê ji dûriya nîne çî rahet
278. Bi şev û bi roj dil pir xiroş in
Li dûriya te da hemî reşpoş in
279. 'Ehalî û lan rûyê 'Îran zemîn
Reş-poş in hemî 'aciz in gemgîn
280. Heta tu neçî ve bo mulkê 'Îran

Ĥeram e li hemyan lepsê 'Ergewan

281. Cewabê lê dave gotî pehlewan

Ĥeram bît li Rustem biçît bo 'ewtan

282. Ĥeta Key Kawis şahê 'Îran bît

Naçimewe Xudê biket 'Îran wêran bît

283. Rexşî maçî kirbû Zer'elî be dil

Rexş geş bû ji xoşiya her wekû gul

284. Dê li vêrê mînîte behsê (keşîr)

Dê bikeyn behsê mewlîda Cihangîr

Behsê jidayikbûna Cihangîr dê keyn

285. Kiça Zahidê 'Ebidê serwer

Şubhî Rustem kirbû şêrê namwer

286. Bi 'emrê Xudayî 'hemlekî hebû

Wextê neh mange û neh roj çûbû

287. Kurekî dabûyê Xuday lamekan

Nazdar û ciwan û rû mangî taban

288. Hindê mehbûb e tîflê nûciwan

Da bêjî Yûsiv e li mulkê Ken'an

289. Xeber gehandevê meclis diyar
Gotin mizgîn li te 'ey şah tacdar
290. Kurek peyda bû bi 'îzna mîhreban
Rûyê wî wek manga çarde ye taban
291. Sucdeya şukrê derhal bir padşa
Wek gulê geş bû li keyf û xoşya
292. 'Emir kir ku biden yaqût 'eşmer
Li gel zêr û zîva mirarî û gewher
293. Zor zor belav biken bi xêr û 'eşsan
Bidene miskîn û feqîr û jaran
294. Got dê xema kene merdane 'aqil
'E'yan û wezîran şêxê di kamil
295. Çavdêrî li remlan kir remalanê şah
Hemiyan pêkve gotin (maşa'allah)
296. 'Ewan got: 'aferin bo tuxmê Rustem
Tali'e hateve bo şahê 'ekrem
297. Wezîr û şêxan kiribû ve tedbîr

Navê wî kurî bibên Cihangîr

298. Piştî nav danaye bir ev nik dayê
Dana ber memkê xo hinûş şîr dayê
299. Mangî şeş nanig ve heft mangî sal bû
Zor bi heybet wekî Rustemê Zal bû
300. Wextê 'emrê wî gehiştê heft sal
Dana nik melayê pir 'eql û kemal
301. Heft sala bi tamam ders xand bi dewam
Fêlî siwarî bû ravçî bû tamam
302. Bûbû ve serokê şore siwaran
Hevalêt xo nebûn çe kes li yaran
303. Rojekê Cihangîr dilberê nazdar
Gerya li kulana li sûk û bazar
304. Hiç kes nedîtibû li şiklê xoyî
Ne bi qelavetê û ne zîrek bî
305. Wekî geriyave li sûk û bajar
Çûbûve dîwanê nik şahê naçdar
306. 'Erz kir digotî rastî bêje me

Li Mazenderanî min 'ewladê kê me

307. 'Ewro 'ez çûbûm geryabûm li bazar

Kes min nedîteve şiklê xo li şar

308. Kes nîne wek min li sehm û heybet

Ne bi zend û baska ne bi qelafet

309. Wek 'eve zanî şahê li Cihangîr

Cewabê lêdawe gotî: 'Ey dilêr

310. Tu yê kurê min î 'ezîzê ciwan

'Ez pîremêr im paş min bi qurban

311. Tu li cihê min rûnî bibe paşa

Min ji geyr te nîne çi kesan haşa

312. Cihangîr wek 'eve zanî 'amale

Nerawesta ji xeberê xo çûbû li male

313. Seyrî kird daykî nûstiye li mal

Çûbû ser serê neviyê Sam Zal

314. Xencer helkêşa dana ser sîne

Her lê kir gazî dilê bê kîn e

315. Daykê xeber got gotê nabekar

Ma te çi ji min e şomî şermizar

316. Gotî daykê bo min bike me'lûm
Babê min kî ye min 'ewladê kê?
317. Daykê wekî bihîst berdabû giryan
Cewabê lê dawê gotî ruh û can
318. 'Ez tirsim mala min bibîte xirab
Tûşî bela bibî her wekû Zorab
319. Gotî: Dayikê nebe dil gêmgin
Tu min bispêre bi (Rebb el-'alemîn)
320. Di'ayêt xêrê bo min bike dilxoş
Tewfîqa min bidet settarê serpoş
321. Kes baqî nabit li dinya fanî
Heta ser nabit bi kameranî
322. Padişahî bihîst qisey Cihangîr
Gazî kir gotî: Ferzendê dilêr
323. Reça'e lê dikem neçe bo 'Îran
Ji dûrya dê mirim be xwar û giyan
324. Bi gotina daykê û padşah nekird

Her alen rabû ve 'êdî dest û bird

325. 'Emrî da gizîrî cewab da li ar
Li nav meydan û kolan hem nav bazar
326. Midetê çend roj neziya dikem
Sîh hizar siwar hatin bi qelem
327. 'Ala bilind bûn bûne er û de'ewa
Zemîn bû toze bilind bû li hewa
328. Li îlênê hespan li ne're fil
Li dengê tebl û zêde axifil
329. Masî li bera da nemabû firar
Dinya bu toz û wekû eva tar
330. Leker hazir bû da bikevine rê
Cihangîr hesp nebû siwar bît lê
331. Piyawek hat û gotê ahê tacbex
Hespek min heye beranber Rex
332. Dê bo te 'înime bi rismê xelat
Di rêka Xudê da xaliqê ka'inat
333. 'Ew piyaw çûbû hesp bo 'înabû

- Hespî tund û tîje hê wekû ba bû
334. Cihangîr destê xo li pişt da 'îna
Neçemand pişta xo bilind kirîna
335. Dayka wî hat lalê be zar û giryan
Bo 'î nabû tîr kebend û kivan
336. Bi destê hema 'îl bi bazbend û lal
Teslîm dostê wî kir bû Rustemê Zal
337. Siwarî 'espî bû dilêrî duran
Da bêjî Rustem e li Mazenderan
338. Xatira xo xastî li daykî li şah
Têr maçî kir daykê paşî padşah
339. Gotinê b'rêkê ve Xwedê digel te bî
Li çavdêr Xudê bî 'agadarî te be
340. Leşkerî bi rê keft hajotin li gar
Hîç ne rawestan her diçûn qirar

Beşê xeberzanîna şahê Tûran li çûna Rustem û 'acizbûna wî ji 'Îran

341. Da bikeyn beşê padşahê Tûran
Zanîbû ke Rustem nîne li 'Îran
342. Hinart gazî kir li Pîran û wezîr
Li gel wan kiribû zû beş û tedbîr
343. Gotî ku Rustem gewreyê dilberan
'Eve ye çende sal e nîne li 'Îran
344. Xo li wêrê nîne şêrî tacbeş
Ji 'aciziya çûye li gel Rexş
345. 'Êsta ya çak e cewab bideyn li şar
Leşker û supayê hazir keyn diyar
346. Da 'em zû biçîn karekî bi ser bînin
Heqê çend salan taze bistînîn
347. Hîç nerawestîn zû biçîn bi cext
Serê Key Kawis bibirîn li ser text
348. Gizîra cewab da li nav kuç û şar
'Înabû bi defter sed û not hizar
349. 'Ala bilind kirbûn li hemû şara

- Leşker kom bû wekû belgêt dara
350. Tîpetîp kirin mîlavî serdar
Kefte pêşiya şahê Tûran diyar
351. Leşkerê Tûranî li deşt û sehra da
Li cihekî xoş da xîvet wan hilda
352. Bi 'emrê Xuday leşkerê Cihangîr
Daxilî şiwîna wan bû her wek şêr
353. Seydan kiribûn leşkerê Cihangîr
Li 'estirahe da sehayê daman
354. Cihangîr zanî leşkerê Tûran e
Dujminê paşah mulkê 'Îran e
355. Rustemê babê wî nîne li 'Îran
Cihangîr dest rakir berdabû giryan
356. Gotî: Tu li kîrê 'ey Rustem navdar
Dil li şahê Tûran bo bînî demar
357. 'Emir da leşkerê sîh hizar siwar
Hicrûman lê dabû wek şêrê xunxwar
358. Kefte nav leşkerê tirkan bi yekcar

- Ser jê 'êxistin wek qurmê dar
359. Cihangîr wek şêra gehîşte mêlaq
Şîrek dî lê da serê wî kire faq
360. Ji ber zerba şimşêrî merdê namwer
Ruha nepakî zû çûbû seqer
361. Paşî xo gehande Zerbiker befar
Hicrûmî lê dabû wek şêrekê bi kar
362. Zerbekir zanî nîne ji geyr firar
Hiç çarey nîne revî wekû mar
363. Li gel leşker we kirde Zerbekir
Cihangîr 'aza ye wekî şêrekê fir
364. Kefte şûna leşkerê şikestî Tûran
Leşkerê şikestî berdabû giryan
365. Geriya nev layê şahê 'Evrasyab
Dad û bêdadî xast bi cergê kibab
366. Gotnê kurekê nû lawê nazdar
Hatibû li gel sîh hizar siwar
367. Hicrûmî li ser medan wek nêreşêr

Pehlewan wî kuştin kirne serûjêr

368. Çend hizar kesan kuştî lê man
Wek qurmê daran leşê wan li cihan
369. 'Evrasiyabî wek zanî beqar
Dinya li ber çavan taristan û tar
370. Gazî kene Pîran hazir biken wezîr
Xudan 'eql û fama pir re' û tedbîr
371. Lawek hatî bo çengi û şer
Leşkerê Tûranî 'êxiste xeter
372. Sîh hizar siwarî wa li gel daye
'Erzê şerrî û ceng û bi de'wa ye
373. Tedbîrê biken bo halê 'ême
Bo dilê pir bi derd e melûl 'ême
374. Wan fikir kirye wezîr û Pîran
Li paşanî gotin: 'Ey şahê zeman
375. Tehqîq 'ezanim 'ew pehlewan e
'Ewî 'aza ye nifşê 'Îran e
376. Yeqîn e 'ewladê Rustemê Zal e

Xudan kebend û gurz û gopal e

377. 'Ezanim Rustem nîne li 'Îran
Hatî ji bo cengê gelman qurban
378. Li nik min 'ew baş e hêşta 'etwanî
Dilxoşî bike bi mîhrebânî
379. Binêre da bête bo bargahê tu
Serxoşî tê bide 'ew çak e bo tu
380. Destê wî ger bigeh destê Zalê zer
Dê 'îne ser me du cara xeter
381. Hûman gazî kir: Şahê 'Evrasyab
Xelatan zû bidene hed û hisab
382. Li gel wî hinartin zû bo Cihangîr
Hûmanê zana ye zor 'eql û jîr
383. Sucde bir zû zû bo Cihangîr şah
Cihangîr men 'î kir bo Xaliqê 'Îlah
384. Selamêt zor hene padşah Tûran
Teşrîfa te bête layê wî mêhvan
385. Xelat wergirtin rabûn dest û bird

Gotina Hûmanî zû zû qebûl kird

386. Rabû zû li gel leşkerê xo da
Ke nêzîkî leşkerî Tûranya da
387. Pîran teftêş kir ke siware wek şêr
Li pêşî leşkerê xo 'aza ne dilêr
388. Bi şikl û şewket wekû Rustem e
Serwerê wî cihan 'ew e ne kem e
389. Bi tehqîq zanî 'ew neviyê Zal e
Xudan kebend û gurz û gopal
390. Pîran gote paşî: Weha ciwan e
Pêşwazî bikeyn çunkî mêhvan e
391. Bi gotina Pîran şah zû bû razî
Li gel wezîran çûn bo pêşwazî
392. Wextê gehîştîne nêzîkî Cihangîr
Bo padşay gotin Pîran û wezîr
393. Nik min me'elûm e 'ev nûciwan
Kurê Rustem e li Mazenderan
394. 'Evrasabî nezer kirî dana

- Gotî: 'Aferîn bo wezîrê zana
395. Muheqeq her 'ew e wekî Rustem e
Dilêr 'aza ye pehlewani 'em e
396. Serokêr leşkerî wezîr û 'emîr
Hemyan maçî kird destê Cihangîr
397. Bi qise'ê xoş û 'ezmanê şîrîn
Şah 'Evrasiyabî peya kir lezîn
398. Xelatê zor zor sed hizarî tûman
Kirne pêşkêşî padişay Tûran
399. Li xîveteka xas meclis kird cem
Kiçekeka nazenîn şah kird kerem
400. Gotî: 'Êxsîrek bo min şahê 'Îran
Pêşkêşî te kem seranserî Tûran
401. Tûranê bo te bit 'Îranê bo min
Rûne xarê dilxoş bi gurî dujmin
402. Şahê Cihangîr kird serokî leşker
Leşker teslîm kir hemû seranser
403. Tîp tîpî Tûranî leşker û supa

Bo ser milkê 'Îranî 'ew çûbûn tiba

404. Li ser sînûrî xîvet wan hildan
Dest bi xoşyan kird bi bezm û sifan

405. Leşkerê Cihangîr li deşt û hamûn
Hildabûn xîvetê zêrîn gul-gûn

406. Leşker û supayî li ser hedî rey
Berdabû bezmê bi noşenoşa mey

Behşê xeberdana şahê 'Îranê bo hatina leşkerê 'Evrasiyab şah

407. Qasid virê kir bo layê 'Îran
Bo layê padşah serokî şêran

408. Xeber dayê vegotê ke 'Evrasyab
'Înabûy leşker bê hed û hisab

409. Du sed û not hizar hatin bi defter
'Ew hatin li 'Îranî lê biken zerer

410. Wextê ku bihîstî şahê Key Kawis
Gazî kir hatibû şazade Tûs

411. Gotî şazade here şayî Newzer

Biçû bo Zabolî bo lay Zalê zer

412. Tu li bedela min selam bike lê
'Evan xeberane temam bo bilê
413. Bêjê Key Kawis zor şîr zawe
Ji daxê Rustem da hoş lê nemawe
414. Bi roj û bi şev karî giryan e
Li dûrya Rustem wa perişan e
415. Tê bigihîne hemû bi 'eşwalan
Da li me biborît 'efûy teqsîran
416. 'Evrasiyab şah padşayê Tûran
Leşkerî 'îna bû ser xakê 'Îran
417. Key Kawis dibêjît dexîl û 'eman
Rûy li min sar neket serwerê cihan
418. Tûsî siwar bû 'azane bi cext
'Ekefte rêkê bi wext e û bi wext
419. Sê roj û sê şev her diçû bi gar
Heta gihîşte li Zabol bi diyar
420. Li serê kelatê nobetçî hisar

Ber xo da sehra' dibit tozek diyar

421. Siwarek wî dîtî ji dûr ve diyar e
Ke pehlewan e 'azad e serdar e
422. Çûbû lay Zalê bê sebr û 'aram
'Erz kird gotî nûrî dîdeyê Sam
423. 'Ev e siwarek hat bi şewket-şiyar
Seroke-navdarî bi nav û nîşan
424. Zalê got: Biçne bizanin kî ye
Me 'elûm biken bo min xeber çî ye
425. Çend pehlewanek zûy çûbûn bi gar
Çûne pêşiwaziya Tûsê navdar
426. Tûs gehîşte cihî da bezî lezîn
Destê wî girtî dîtî dil-hezîn
427. Filamerzî digel Ziwarey navdar
Maçî kirin destê Tûsê 'ilmdar
428. Hate bi pêş ve Zalê dilsotî
Li dûrya Rustemî pir gem û şêhtî
429. Bi qedr û hürmet berdane nav şar

Danabûy ser textê zerê zêrgar

430. Li paşan 'evca rabû li cih Tûs
Da destê Zalê nameya Key Kawis
431. 'Erz kire gotê 'Evrasiyab bi şah
Hate ser sînûrî mulkî 'Îran şah
432. 'Înaye leşker du sed û not hizar
Bo de'wa û cenge mel'unê gedar
433. Wî zanî Rustemê şah nêrey şêran
'Aciz bû ji qehran nîne li 'Îran
434. 'Ewê dinyayê teng biket li me
Heqê raborî bistînit li me
435. Zalê 'eve xeber bihîst li Tûs
Dinya li ber çavan bûbû 'abenos
436. Zor bi zelîlî berdabû giryan
Ji çavan hatine xar rondik wek baran
437. Qêrîn berdabûn li dûrya Rustem
Dilê wî xeste bû ji deryayî gem
438. Kom bûne zû bi zû merdane dilêr

Pehlewanî 'azan e her wekû şêr

439. Delîl e nameyê Key Kawis biner
'Agirî berdaye dilê jin û mêr
440. Li paşî şînî û giryan û hewar
Zalê zer gotî: Merdanê navdar
441. Bêjine Ziwarey biçît her hal da
Cewabê binêrît li şar û gunda
442. Xo bikene leşker biçin bo 'Îran
Bizanin ka çî ye teqdîrê Yezdan
443. Ziwarey hejar diçît pir le gem
Zor perîşan bû dûriya Rustem
444. Gotî bê fayda ye biçîn bo 'Îran
Nabî du cara bibîn malwêran
445. Ya Xuda Rustem hazir ba li warî
Peyala xoşiyan da bi ser zarî
446. 'Ax 'ax tu l'kîrê 'ey Rustemê pehlewan
Tu li kîrê mayî wekû gerîban
447. Zalê zer tore bû ca li Ziware

Gotî bê hiş î nefam î bê çare

448. Li cihê Rustem tu mayî bo Zal
Şêtê serserî pîs î bedxisal
449. Felamerze nûke li cihê Rustem e
Pehlewanek mezna hevalê kê m e
450. Rustem nemaye kurê wî maye
Li wî kêmtir nîne merdî niwa ye
451. `Evcare Ziware rabûye neçar
Hinartî cewabê li nav kuç û şar
452. Hâzir bûn bi defter sed hizar siwar
Hemû pehlewani merdane navdar
453. `Ala `ew baydax fitranê wek qebar
Helgirtî derhal nevyê Zalê navdar
454. Lêdabû timbilk li gel tebil û kûs
Zal û `ewladê hem şazadeyê Tûs
455. Desteke tîp her diçûn bi gar
Celebi wan berdani merdanê navdar
456. Li jêr nalî hespan bû toz û gebar

Gehîşte sema 'ew bêjîn ya Setar

457. Çend roj û çend şev her diçûn bi can

Heta gehîşte paytextê 'Îran

458. Nedîtibû xoşî ji qehr û kîn

Key Kawis Zalê zer da bizan lezîn

459. Destî kirde milî Zalê zer bi kul

Giriya maçî kir bi 'aramî dil

460. Ziware Firamerz têt têt maçî kird

'Emir da 'ev care xebera destûz bird

461. Xîvetêt gumbet zêr hilda li sara

Wezîran li gel 'emîrêt şara

462. Li ser textê zêrîn rûniştin qirar

Dilêran keftine fikr û gîrûdar

463. Meclisa Kawisî bê 'eyş û noş bû

Bê saqî narîn û bê şerab noş bû

464. Bi 'emrê Xudayî (Heyy û la-mekan)

Wextê diyar bû ji fecrê beyan

465. Li xewa şirîn dilêranî bi kar

Rabûn dikirin hemda Xaliqê Cebar

466. Key Kawis fermuy merdanî dilêr
Hûn sed hizar kes siwar bin wek şêr
467. Bilind bû deng û seday tebil û kûs
Bo serokê leşkerê ' Îranya Tûs
468. Şahê Key Kawis li gel Zalê zer
Firamerzî şêrê Ziwarî serwer
469. Bavê navdaran Gurgînî Mîlad
Şîdo û Şapor Qarin û Ferhad
470. Gûderzî dilêr li gel Gîwî bi şêr
Pehlewanekê mezin ciwan û jîr
471. Wextê nêzikî bûn le rê 'espa
Zalê temaşa kird dîtin betba
472. Dît leşkerê dujmin zor bê jimar e
Gote Key Kawis: Hîç me nîne çare
473. Leşkerê Tûran hatin bo nalan
Çare me nîne zor û bêsamane
474. Firamerzî 'eve wek bihîst li Zal

Gotî: Babê pîr borîn li te sal

475. Rustem ku 'êsta li 'Îran nîne
Ger bo şerî nebit kur ma bo çî ye
476. Dê bînî çav bi 'ewnê Yezdan
Karekî weha dê lê kim pê pan
477. Heta 'axirzeman wekû riwayet
Her bête gêran wekû hikayet
478. 'Ev care berê xo da merdanê 'Îran
Gotî: Binoşne badê 'ergewan
479. 'Evro roja şer û herb û meydan
Roja gîrûdariya dengê dilêran
480. Çûbû meclisê wekî şer Firamerz
Rûniştî ser textê wek kîwî 'Elburz
481. Saqî gêrandî şeraba gulreng
Noşyan gird şerab bi 'ahenge çeng
482. Şev raborandî bi keyf û xoşî
Bi bezm û 'eşret bi badenoşî
483. Beyanê wextê roj helat helsan

Dengê teblê hat leşkerê Tûran

484. Li leşkerê 'Îran seday tebl şer
Rabûwe ji nav wan Gîwî dilawer
485. Li leşkerê Tûran 'ev ca Cihangîr
Çûbûye meydan 'aza wekû şêr
486. Gîwî dilawer zavayê Rustem bû
Bo hate meydanê her wekû şêr bû
487. Wekî dît Cihangîr zor serî sur da
Gotî 'ey ciwan tu be heqî Xuda
488. Te nîne şiklê merdê Tûranî
Li nik min me'lûm tu merdê 'Îran î
489. 'Evrasiyab şah sahirê bedkar
Tu rab pêş leşker da bibî girodar
490. Her salek 'êkî wekî tu dê 'înit
Kuştinê dê det ruhê diqetînît
491. Çend sal berî nihû Zorabê dilêr
Lawekê ciwan bû wekî nirê şêr
492. Wî mergî dabû 'ew sebab bû kuşt

- Bi destê Rustemî şêrê bû lamişt
493. Cihangîr gotî: Bi Xuday pehlewan
Tu ji mala kê yê ey milkê 'Îran
494. Gotî: 'Ez Gîwî zirîn kulah im
Zavayê Rustem tacibexş şah im
495. Cihangîrî gotî: Gîwî bê heyâ
Bê şerm û bê 'edeb bê fam û tenya
496. 'Êwe qet nîne çî heyâ û namûs
Bo çî ken xizmet bo şa û Key Kawis
497. Şert 'ew bit nûke canit derînim
Xûna Rustemî û Zorab bistînim
498. 'Eve got herz û dest daye bi gurz
Helgirt û giran wekî çiyayê Burz
499. Daweşandî 'ew gurz le serî Gîwî
Kefte xarê 'ew bê halê bê hêvî
500. Bestî du destî bi Gîwî zû be qar
Bê jenî 'eve duze hatî le gar
501. Cihangîr destî havête şimşêr

Dana bû li nuz serîy Bîjenî dilêr

502. Tac û kunzirî lê kiribûn pare
Xûn hate xarê wekû fiware
503. Çiwar pênc serî birîbû dîsa
Cihangîr rengî zer bû li tîrsa
504. Gotî ne wekû ji mala Rustem bî
Bikujim dilim pîr derd û gem bî
505. Hêlqey kebendî bo Bîjen helda
Bestî du destî bêjim di benda
506. Dîsa Cihangîr hate ve li meydan
Gazî kir gotî: Leşkerê `Îran
507. Da bête meydanê bo merde `aza
`Arezûyê textê hewe me dîsa
508. `Ew pehlewânê `Îranî-zemîn
Ferhad şîr û Qarin û Gurgîn
509. Yek bi yek hemûyan çûbûne meydan
Bi destî Cihangîr hemî `êxsîr kiran

510. Hêşta dilêrê bi zorî kebend
`Êxsîr kiribûn kirine nav bend
511. Key Kawis li gel leşkerî `Îran
Hemû bi yekcar berdane giryan
512. `Evrasiyab şah gelek xoşhal bû
Dilê wî li gema `êca betal bû
513. Her `aferin kird zû Cihangîr
Gotibû her bijî merde wekû şêr
514. Cihangîr çûbû xîvetê dilşad
Bi fetî û zefer dil li gem `azad
515. Paşî `emir kir gotî `esîran
Bînin layê min pisyar kem jîyan
516. Hemû `îna bûn layê Cihangîr
Cihangîr gotî: Şêranêyê dilêr
517. Danişin li nik min hemî bi xoşî
Şev raborandî bi badenoşî
518. Tebî`teken hemî sûnd bixon Yezdan

Ferqî xo naket her kes li geltan

519. 'Emir kir bînin sifre û te'aman
Hemyan xwaribûn te'am di gel nan
520. Heta nîvşevî bi 'aheng û 'ewtar
Xoşyan kirdibû heta dereng û tar
521. Li paşî nîv şevê hey 'ezin dan
'Ew çûbûn nivistin heta ku beyan
522. Siharê dîsa wekî ji xew helsan
Cihangîr wek şêrî 'ew çûbû meydan
523. Qêrî berdabûn gotî pehlewan
Kî maye 'evro ji leşkerê 'Îran
524. Da bêne meydanê bi helqî kebend
Wekî 'ewêt dî bêxime nav bend
525. Firamerz şêre rabû zor bi kîn
Xo xatir kird bû wekî şêre nerîn
526. Berê xo da meydan nevyê Zalê pîr
Çûbû li ber sîngê Cihangîr şîr

527. Gotî: pehlewan navê te çî ye
Li Îranê tu ji mala kê ye?
528. Bêje min bi rastî tu pehlewan î
Yan tu yê ji mala şahê Keyan î
529. Gotî: 'Ey ciwan min Firamerz im
Kurê Rustem bi xudanê gurz im
530. Meşhûr e ke babê min ku naçe bexşe
Perê serê şahan ku sahib Rexş e
531. Wekî 'ew qise bihîstî Cihangîr
Le daxan rengê wî reş bû wekû qîr
532. Gotî: 'Ey nemerdê dureşî duran
Rustem pehlewan bo nîne li 'Îran
533. Bu Key Kawisî Rustemê dilpak
Zorab kurê kuşt bi geletî ser xak
534. Çimkî min bihîst bi gotna 'ev xeber
Li gel Key Kawis hatim bikem şer
535. Me'lûm e li nik min we nîne namûs

Bo çî şerî diken ji bo Key Kawis

536. Şert 'ew bît nûke karekî bikim lê
Ke heqê Zorabî min bistînim lê
537. Key Kawis bigrim bêxime zindan
Zalê hebs kem ta 'axirzeman
538. Firamerz gotî: 'Ey şetê nefam
Mindalê bê huş tefrîqe kalam
539. Şert bît li te bikem 'evro li meydan
Ke 'Evrasiyab bo te bît giryan
540. 'Ev kî ne çî ne pir li derd û gem
Çi heq niye li ser Zorab û Rustem
541. Dest dabûwe gurzê bi kîn û bi qar
Di ber 'êk da hatin du merdî serdar
542. Firamerzî 'ev care wekî becke şêr
Gurzekî weşande serê Cihangîr
543. Qilfeta serî û mil zamar bû
Xûna jê barî ya sor gulnar bû

544. Çavê lê tarî bûn li wî nema reng
Ruyê dinyayê li ber bû şibhê zeng
545. Dest dabû gurzê `ev care Cihangîr
Dana bû li toq serê Firamerz şêr
546. Xo de kunzirî keftne ser zemîn
Meleka li felek gotin `aferin
547. Paşî çend mide bi tîr û bi şîr
Li `êk û du dabûn du merdî dilêr
548. Caran kebenda girtine Yezdan
Di ber êk da hatin herdu meydan
549. Kemer-bendê wan bûne pare pare
Cihangîrî `êdî nemabû çare
550. Destê dia` girt digotî: Ya (Menan)
Quwetê bide min her tu î (Henan)
551. Hêşta biçûk im gerîb im nefam
Her tu Qadir î `Ezîm û `elam
552. Min nîne taqeta gurzê Filamerz

Zor wî quwete wekî kêwî 'Elburz

553. Pê rastê pêş 'êxist pê çepê dana
Bi quwet Firamerz rakêşa 'îna
554. Pê çepê da ber bend girt bi kîn
Helgirt û 'êxist ser ruyê zemîn
555. Çûwe ser sîngê wî wekû şêrê mest
Bi xilfey kemendî dest û pê wî best
556. 'Eve her wekî dît leşkerê 'Îran
Hemyan 'êk car berdabû giryan
557. Cihangîr gotî: Ka merdê meydan
Dê çime ser textê padşahê 'Îran
558. Zalî jê berdabû girî û hewar
Rondik li ser rûyî hatibûne xwar
559. Key Kawis tancê fir dabû li ser
Rabibû li 'Îran hawara meşer
560. Tûsî Newzerî bû çûbû meydan
Rawesta beramber merdê pehlewan

561. Middetekî ney zor bi gurzê giran
Li 'êk û du dabû herdu pehlewan
562. We li 'axir da Cihangîr wekî şêr
Tûs her weku wan kiribû 'êxsîr
563. Ta 'îfeyê mîlad li gel yaweran
Serok û serdar hemî girtine bi şan
564. Yek bi yek 'esîr bûn bi dest Cihangîr
Ta sê sed nefer merdanê dilêr
565. Heta 'ew roje bi destê Cihangîr
Li meydana cengê hemî bûn 'êxsîr
566. Zalê zer dinya dîdeyê zeman e
Li daxa bûye bo şîn û dîwane
567. Rûyê xo yî dana ser xak û xeste
Rîhêt xo helkêşan hemû bi deste
568. Gotî 'îlahî Kawisî bê kes e
Pîr e Zal bide hale zorî bê nefse
569. 'Ez tirsim Kawisî bikene 'êxsîr

- 'Ev care dê çi kit Zalê zerê pîr
570. 'Êvarî li direnge teblê lédabû
Leşkerê herduka bo cih xo gerabû
571. Zal û Ziware li gel Kawisî şah
Bi dilê gemgîn çûne baregah
572. Leşkerê layê dî 'Evrasiyab şa
Gehîşte gerdûnê serî le xoşa
573. Pîranî dilpîs bi qise û reftar
Hatine nav behsa gotin Şehreyar
574. Xudakarê me baş kire û 'asan
Li şerê 'Îranê serkeftin qurban
575. Heqî qisasî qedîmî xoman
Divêt bistînîn li şahê 'Îran
576. Şahê Key Kawis labîn li serê text
Zalê Nerîman parçe kîn bi cext
577. Tûsî Newzerî yê Firamerzî şêr
Ser birîn li gel Ziwareyê dilêr

578. Bi gotina Pîran şah zor bû xoşhal
Belê Cihangîr lê bû kîn û tal
579. Wext e li daxa xo 'aşkera ket
Piştî çend mideh got qeydî naket
580. Zû dabû Pîran gotî 'aferin
Salarê Tûran merdê bi temkin
581. Divêt Ziwar ke li gel Zalê zer
Şahê Key Kawis seranser leşker
582. Ewane 'êxsîr kem bi 'ewnê Yezdan
Welatê 'Îran zû bikem wêran
583. 'Ev care Cihangîr rabû ji dîwan
Çûbû xîvetê 'aciz û heyran
584. Gotina Pîran lê bû daxa dil
Kefte xeyalat bo kar û meşkil
585. 'Esîrekanî bo layê xoy 'înan
Hûrmet bo girtî xizmet kir bi destan
586. Muħbetê girtî li gel Filamerz

Gotî bi xêr bên ferzendê nebez

587. Li gel Tûsî Newzerî 'esîran hemû
'Iltîfat pê kir şazde hemû
588. Li paşî nan xwarin meclis gêra
Dengê bilûl û narîn çû sema
589. Dengê xoşiyê û keyfê henoş
Delê ji dîwana Key Kawis bê hoş
590. Cihangîr meqsed xo biket 'izhar
Li paşan gotî: Şêrê navdar
591. Heta subehî Xudayî kerîm e
Bi qesdî Pîran nexom qet gem e
592. Li paş nîvê şevî hemî 'ezin dan
'Êxsîran hey çûne nav cihan
593. Wê şevê nivistin heta ku seher
Beyan wekû roj li şerq hate der
594. Tebla ceng lêda li herdu teref
Hatine meydanê leşker sef bi sef

595. Cihangîr wek şêran 'emam bû diyar
Bi qêrî gazî diket bi qiweta cebar
596. Leşkerê 'Îranê Zalê bêçare
Hate nav leşkerî gotî Ziware
597. Rabe kurê min hîç kes li merdan
Nemane hemû wêt 'êxsîr kiran
598. Bi tinê tu mayî leşkerê 'Îran
Hişyarî xo be da'im role giyan
599. Ya Hu be teqdîra (Heyyê Rebbanî)
Zal bê tali'e li dinya fanî
600. Li paşî giryan û şîn û 'efganî
Ziware 'ev care çûbû li meydanî
601. Cihangîr wekî dît 'ew pehlewane
'Emsalê wî niye li ruyê zemîne
602. Pehlewan nekebe sehm û bi kar
Gezeb ji nav çavan ya dibarîte xar
603. Zanî ku mame gewre ye serdar

Li qehreman daxan dil kul e ğembar

604. Zor li tirsâ 'evcare gotî 'ey serdar
Nav û nîşanê xo bike 'izhar
605. Rastî bêje bo min şêrî zeman
Ji binemala kî yî ya pehlewani
606. Cewab lê dabû gotê: Bizane
Ziwar im birayê şêrî zeman e
607. Birayê Rustem ke sahib Rexş e
Meşhûr e bala ye hem tacbexş e
608. Navê Rûstemî wek bihîst Cihangîr
Rondik ji çavan barîn û bi jîr
609. Gotî: 'Ey namerd tu yî kemal î
Zor heyf e hûn bêjin 'ewladê Zal î
610. Şêrekê wekî Rustemê pehlewani
Bo dilgiran bûwe ji 'axa 'Îrani
611. Bo çî şerm naken hûn wekî mêrani
Diken xizmetê padşayê Keyani

612. Bo çî hûn jin in qet nizanin 'ar
Te dikem di bendê da heta rûzgar
613. Şert 'ew bît karekî 'ez bikem li te
Qisasê Zorabê bistînim li te
614. Ziware bihîstî qisa Cihangîr
'Agir ber bibû dilê wî (kisîr)
615. Gotî pehlewani tu neke gizav
Min gotim li te çî qiseyê xilaf
616. Zerba xo tu dane zûka direng e
Ez zor miştaq im bo de'wayê cenge
617. Wextê di ber êk da hatin û çûn 'ew
Dê zanî û bînî 'ez çawan im bi çav
618. Cihangîr wek şêrê bi hinêr û qar
Ruyê dinyayê lê bû şevêk tar
619. Bi qar û gezeb destê dabû bi gurz
Helgirt û giranî wek çiyay burz
620. Danabû gurzê giran e bi seng

Qilganî ragirt Ziware dilteng

621. Danabû qilgan û zerbey gurz bi kîn
Ziware le ser 'espê kefte ser zemîn
622. Dukêl li difna Ziwarey rabû
We zanî ku ruh ji giyanî cuda bû
623. Li paşî sa'etek seyri kird mawe
Hespê wî mirdibû li xûnê geltawe
624. Ziwarey gotî: Ya Xudayê Kerîm
Bide tewqim Qadirê Qedîm
625. Rabû li ser piya nifşê Zalê zer
Gurzê helgirtî danaye li ser
626. Danabû li dest û pêt hesp Cihangîr
Hespê wî kuştibû mayeve dilgîr
627. Her du piya de li meydanê ceng
Girtibûn kemerbendê 'êk û du teng
628. 'Êk û du kêşa zor û 'inad
Li paşî sa'etek mane ve herd

629. 'Ev care Cihangîr dilêrî zordar
Hawarî kirdibûwe Xaliqê Cebar
630. Helgirtibû bi quwet bi qehr û kîn
Birayê Rustemî 'êxiste nav bend
631. Vegeriya zû û 'ew hate meydan
Zorî bi qehira 'espî da cewlan
632. Li rast û li çep bi kîn û bi qar
Li nav xîvetan zor kirin bi par
633. Şahî Key Kawis her dikêştî 'ax
'Evrasiyab şah dilxoş e dimax
634. Cihangîr wek şêrî hespî da cewlan
De'wa Zalê diket bo biçîte meydan
635. Zalê rixset xast li şahê 'Îran
Siwarî hespî bû 'ew çûbû meydan
636. Gotî ya Xudayê 'azîm û cebar
Rehim ke li halê Zalê 'extiyar
637. Cihangîr gotê pîrê zeman e

Bo çî tu hatî boyî şer 'azan e

638. Qet piyaw nemane leşkerê 'Îran

Bi huy zelîlî tu hatiye meydan

639. Zalê got tu li min nepirse 'eşwal

Teqdîra hodanay Xuday (Zulcelal)

640. Bes e Xuda çûbûye dilê pir qar

Li ser pişta hespî kewa 'ew kefte xwar

641. Şîniya Rustemî taze lê nû kir

'Ax helkêşabûne dilê pir kul kir

642. Ya Reb hacet 'erş û nufelek

Bi şerafeta bi cemî melek

643. Min li paş Rustemî mergim baştir e

Mirin li manim gelek çaktir e

Bêhsê xo 'eşkirakirina Cihangîr bo Zalî

644. Wextê 'eve dît 'ev care Cihangîr

Bezî zû hatî 'ew be Zalê pîr

645. Peya bû lew hespî şêrî ba kemal
Maçî kir çend cara destê pîre Zal
646. Gotî fîda bim babê dilgêmgîn
Kurê Rustem bizane yeqîn
647. Kiçezay 'Abid şahê Muzenderan
Ferzendê Rustem perê serî şahan
648. Ba bikim nedîtye zor lê heyran im
Bo yî dîtina wî 'ez bê qîrar im
649. Bahoye teqdîra padşahê subhân
Cara dilgêmgîn caran şadîman
650. Reça li te dikem nebe dilgêmgîn
Bi hürmeta navê (Rebb el-'Alemîn)
651. Wextê 'eve gote neqabî lada
Ruy wekî mang le nava 'ewrî sada
652. Zalî ke dît lawe wek mangî 'enwer
Selewat û selam dan li pêgember
653. Babê pîr girtu maçî kir têt têt

Wî got nemir belaw Zorabî şêr

654. Şukur kir bo zatê pakê Xuda ye
Çunkî wa (‘Esr û Yusr) le dûwa ye
655. ‘Azadî zordarî dilim bû pir gem e
Belê spî fexrê bo Rustem e
656. Şukur ‘ewca xem yekcar dil pak e
Çunkî ‘ewladê min zor çalak e
657. Cihangîr gotî hîç nebe dilteng
‘Êxsîran dizivrînim taze be şeng
658. Babê min bo çî vegerane belave
Rustem diyar nebit kurê wî mave
659. Cihangîrî gotî: babe giyan ‘eman
Qisa min û xo tu neke beyan
660. Da kesî nezanîn kurê Rustem
‘Ewladê Zalê dûrî pir bi gem
661. Da ne ku pî zanît pîsê bê ‘exlaq
Bizane zehmet zor dibit ‘etlaq

662. Hetan 'êvarî 'em bikîn ceng
Bi mekr û hîle dilit nebî teng
663. Zalê got: Roley bê taqet im û pîr
Hişyarî min bî min neke dilgîr
664. 'Ew roje heta 'eşrî li meydan
Binêre cengan li 'êk û dudan
665. Rojê hişyar bû Cihangîr şêr
Çu zerb nêzîk nebûn li bapîrê pîr
666. Zalê zer wekî zivirî qef dîwan
Key Kawis gotî: Pîr xoş-zeban
667. Çît kir li meydanê li gel Cihangîr
Cewabê lê dabû Zalê zerî pîr
668. Mizgîn li te bit kurê Rustem e
Pehlewankî mezin e emsalî kem e
669. Şahî Key Kawis wekî bihîstibû
Li xoşa da kefte û bê huş bû
670. Wextê hişyarî be serî hate berd

Rabû dest û pê Zalê maçî kird

671. Gerdê zêde nîşan bo Zal pir hinêr
Pîroz bin lê xelat derhem û gewher

672. Sucde ya şukrê bir bo zatî Xuda
Kir hemd û sena ji bo 'ezmeta Xuda

Paşî zivirîna Cihangîr bo lay 'êxsîran û xo aşkirakirinê
û xeberzanîn bo Pîran 'Evrasiyab û Şipêsxûn da ser leşker bo ser 'Îraniya)

673. Wextê vegeryave li meydanê şer
Rûniştî Cihangîr li ser textê zer

674. 'Evcare Tûsî Newzerî gazî kird
Yê dûyê Ziware pehlewanê kurd

675. Yê siyê Filamerz qatilê dêwan
Kurê Rustem tacibexş 'Îran

676. Li paşan hevalêt dî gel Gîwî dîn
'Ev care Bijen û Şazade Gurgîn

677. Rabû li pêş wan Cihangîr xeber da

Nik wan taze 'aşkîra kirda

678. Destêt xo dan ser milêt 'êk û du xoşî

Keftîbûn keyfê be bade û nûşî

679. Sifre rakêşan wan xo ra (te'am)

Kire şukra Xuday (Heyyê layenam)

680. Rizgar bûn hemî li bend û zincîr

Rûniştin pêkve bo re'e û tedbîr

681. Heta nîv şevê bi keyf û şad bû

Timbilk û mezîq şev borandibû

682. Çûne nav cihan xewê dilşadî

Serê xo danay ca be 'azadî

683. Cihangîrê şêr lawek gazî kird

Gotî tu yê here zû dest we bird

684. Li pişta xîvetên paşayê Tûran

Guh bigir li gotina paşay Pîran

685. Li ber leşkerê Zal û 'Îranî

Hatî dengê timbilkê xoş şadmanî

686. Wek 'ev denge bihîst leşkerê Tûran

Rengê şay Tûranî bûbû ze'feran

687. Pirs li Pîran kir çî ye 'ev denge
'Îranî dilşad in min dilim teng e
688. Tîmbilka bê we'de çî ye nizamim
Hatina Rustem e zor dilgiran im
689. Pîranî wîste zû dabû cewab
'Erz kird gotî şay 'Evrasiyab
690. Nik min be rastî 'erz 'ekem xeber
'Evro zor hîle kiribû Zalê zer
691. Be mekr û hîle Zalê cadûkar
Li meydanê cenge giryaye bi zar
692. Cihangîr dilê wî sotiye be Zal
Peya bû teselî lê da wek minal
693. Yeqîn 'ez dizanim li gel Cihangîr
Zor wan kirine guftûgoyî tedbîr
694. Divêt bizanî dust û dujminî
Be mekr û hîleyan be gotinî

695. 'Ew mindalî berze şomî rûsiya
Leşkerê bê qîmet bê şerm û heya
696. Çend çend bi Xudan kird beşîr şeker
'Ew dayika bo çepîsa bed 'exter
697. Çewa aqîbet be dujminî derçû
Herwekî ez dizanim kurê Rustem bû
698. Meşlehet 'ew e ku bê çend û çûn
Bu serê leşkerî danî şîxûn
699. Wî Cihangîr û dilêranî 'Îran
Parçe parçe keyn be tîg buran
700. Rustem nemaye li xakî 'Îran
Le jina kemtirîn 'ey pehlewan
701. 'Eve ye tedbîr 'arezû û kelam
(Elemir fikom baq we-selam)
702. Evrasiyab şah le gotina Pîran
Fikra xo kiribû sa'etek 'eyan
703. Cewab vi rê kir gote be Pîran

Xeberî biden hemî 'emîran

704. Dû sed û not hîzar leşkerê şay Tûr
Siwarî zîn bin şêraneyê destûr
705. Wextê 'eve dît piyawî Cihangîr
Hate tamam bo gote 'ew tedbîr
706. Cihangîr rabû 'aza destur bird
Pehlewan hemî ji xewê hişyar kird
707. Hiç xewfê neken şêrêt pehlewan
Hîvîya me bi Xuday 'erd û 'esman
708. Ziware û Bîjen Gîwî namidar
Wan xo hazir kir bo şerê bêkar
709. Deh hîzar nefer ligel Filamerz
Pehlewanêt 'ecêbî be tîg be gurz
710. Deh hîzar ligel Ziwarey dilêr
Hemî pehlewan in wekû nêrê şêr
711. Deh hîzar li gel zavayê Rustem
Çûn li gel Bîjen bê tirs û bê gem

712. Tûsî Newzer çavî serdaran
Wan xo hazir kirbû şerê Tûran
713. 'Ev care Cihangîr neviyê tacbexşî
Virê kir û 'îna hespê wek Rexşî
714. Nifşê Rustemî destê daye gurz
Gurzî giranî çingeyê bi berz
715. Nasî wekî pîlay kêşaye ser da
Zirê Dawudî helgirt û berda
716. Kemendê çîn çînî xîra kird şan
Sê sed û şeş sed tîr u hemî kivan
717. Tancê cewiheran taze kird ser
Berqî jê vedan da çerxê exzer
718. Bazbenda babê taze kirdewe bal
Kemer benda xase çêkir ji dur lal
719. Qaşidek vi rê kir bo lay Zalê zer
Ku 'ehwalan bo bêjin cimle yekser
720. Gotî li herdu lave be yekcar

Ber ba keyn leşkerê Tûranî diyar

721. Têk û pêk bideyn leşkerê Tûran
Çar qism e leşkerê me bizane qurban
722. Filamerz li gel deh hizar siwar
Le seḫray'ê suxrab diçît ve liğar
723. Ziware diçît bo leşkerê dêwan
Gîwî diçîte ser tîpa leşker Behreman
724. 'Ez dê çim bo serê şay 'Evrasiyab
Cergê wî derînim dê keme kibab
725. Pehlewanêt dî ji ber biçîye 'Îran
Hemû tertîp danan bo leşkerî Tûran

Beḫsê şîxûn danay 'Evrasiyab şah bo ser leşker bo şerê Cihangîr

726. Li 'Evrasiyab şah dayne xeber
'Ew seyê rûsiya şomê bed 'exter
727. Piştî nîv şevê bûye çend diçûn
Serleşkerî danabû kafir şîxûn

728. Dengê bikuje bigire helsa
Lêde parçeke bilind bû sema
729. Rijiyaye meydan serdaran bo ceng
Ji ber xunê zemîn pak bû lale reng
730. Ji ber zerbê şimşêr herbiya çek û çak
Bû toz û dûman zemîn da felak
731. Ji ber birusê nivê Cihangîr
Le berqa tîrê Filamerzî şêr
732. Ji ber zor wextî hatiye meydan
Zelzele kefte nav leşkerê Tûran
733. Her kesê lê da gurzê kawser
Ruha nepakî lê çûbû seqer
734. Le herdu layan wekû hewledar
Serê serdaran çendan kefte xwar
735. Bûbû gelgele wek 'axirzeman
Gehîştine felek deng (el a'leman)
736. Le paşî midetek 'ev car Filamerz

Şikandin wî pê da be şimşêr û gurz

737. Gîwî 'ejderî le gel Ziware

'Ewan jê tîpek kir pare pare

738. 'Ev care Cihangîr wek şêrekê burz

Le meydana herbî 'egîd kirin şepirz

739. Le pir heybet e Gîwî 'ejder çaw

Gurzê giranê helgirte we benaw

740. Gurzekî xêra girt lê şewir da

Zivirî ji meydanê yekcarî lada

741. Ji ber gurzê Giwî nemabû qîrar

Bûwe baregahê şahî kirdbû firar

742. Gotî be paşa hane sed car hane

Leşkerê min birya nema biryan e

743. Wextê 'eve bihîst şah 'Evrasiyab

Dilê wî helfrî çiya her wek kibab

744. Zû revî rabû şayê Tûran diyar

Gotî zû herin merdanê xûnxwar

745. Leşkerê Tûranî zû zû destû bird
Çûbûne dewra Cihangîr girt
746. Li hemî layan hilkêşabûn şîr
Danabûne cismê Cihangîrî şîr
747. Cihangîr serê xo dana bo ser zîn
Nalî le dergay (Rebb el-A'lemîn)
748. Wekû bayê xezeb kevte nav leşker
Leşkerê Tûran êk car bû dilger
749. Caran be gurzan caran bi şîr û tiğ
Le kuştin nedikir 'ebed zirîg
750. Zor wî lê kuştin 'êk be yek bo hat
Leşkerê Tûran zêde bo kat kat
751. 'Erdê meydanê zor zor bûbû teng
Bûyî hatine sed hizar xedeng
752. Wextê 'eve dît Cihangîrê şêr
Zor du'a kirin le dergahê (Kebîr)
753. Rûyê xo dabû semayê heft zemîn

Gotin ya Xudayê cihan 'aferîn

754. Leşkerê 'Îranê min kir giriftar
Zor şermizar im le dergahê Cebar
755. Nû ke giriftar leşkerê Tûran im
Armanca xedeng û zor tîr-baran im
756. Leşkerê min b'riya min Xudam be kuşt
Hiç kesek nîne nû ke min le pişt
757. Nik min yeqîn e hatî li min merg e
Serdêmêt xencera keftîne cerg e
758. Hiç min negire be qisa mader
Rûreş û şermizar ta roja meşer
759. Babê xo min nedît zor bû xesteşal
Rehmê li min bike Xuday (Zulcelal)
760. Piştî min bal Xudêy ye min heqî bider
Xuna min wek Zorabî da nebîte heder
761. Bi quweta zatê (Heyy-i sibhan) î
Xo kêşa le nav tîbeka 'Îranî

762. 'Ev care Ziware le gel Filamerz
Hicrûmek wan 'îna wek kuy 'Elburz
763. Tûsî Newzerî navdarê 'Îran
Le gel Zalê zer le 'ersey meydan
764. Şikandin wa pêda nûranêt bê pîr
'Înabû derê şîrî Cihangîr
765. Gotin bo Cihangîr 'ey merdê gerîb
(Neşru min Ellahî we fetħun qerîb)
766. Pişta 'êk girtin her sê pehlewan
Wan şikandin leşkerê paşay Tûran
767. Karek wan lê kir wekî roja meşşer
Babe le gel kurî nemabû xeber
768. Lew hicrûme da leşker û Tûran
Çil hizar kesî ji wan bibûne fan
769. Belê leşkerê dilêrê yê 'Îran
Bîst hizar nefer jê bibûn bê can
770. 'Ev care dixondî dîkilê seher

Melayan digotin (Allah ekber)

771. Şah 'Evrasiyabî wekî dît be çaw
Wek mar xo pêça 'eqil nema tewaw
772. Berdabû giyan lê gem û hesret
Gotî rûreş bûm û heta qiyamet
773. Leşkerim fewtî bi qiseyê Pîran
'Ev kar be serê'm hat malim bû wêran
774. Cihangîr rûniştî le ser textê zer
Ber serê xo rakir çiçey Tawus per
775. Şahê Key Kawis 'emir kird be Zal
Gotî here zû bi pîrê ba kemal
776. Xela be qîmet kirî zerîn
Bibe boyî lawê nazdarê şîrîn
777. Dîsa 'emr kirde be şazade Tûs
Xelatêt wî bidin zû bo Cihangîr
778. Cihangîr dilxoş bû xelatêt şahî
Yek yek maçî kird dilêr be tiyahî

779. Rabû Cihangîr çû xizmeta şah
’İhtiramê girt û be dilê xoş-penah
780. Têr têr maçî kirde destê Zalê pîr
Zalê jî maçî kir şêrê Cihangîr
781. Bab û bira û mam hemû bûn dilşad
Le gem û ‘acizya yekcar bûn ‘azad
782. Meclis wan gêra be kameranî
Be keyf û xoşî be şadimanî

Beşê xewna Rustem le Bilgar be leşkerê ‘Îran ve
û kuştina Filamerz û şîn û girîna Key Kawis û xemgînîya Zalê bo Rustem

783. Dimînin le vêrê meclisa navdar
Dê çîne ser beşê Rustem le Bilgar
784. Şevê nivist bû kurê Zalê zer
‘Ecêb xewnek dît le weqtê seher
785. Wî dît û ‘Îran wek behra Cîhûn
Lisir û lêmişt dan her wekî xûn

786. 'Îranê hemû keftiye be dab
Zelîl in be destê şay 'Evrasiyab
787. Zalê zer dît û rûs e 'uryan e
Ĝem xureşîn û zarî û giryan e
788. Şahê Key Kawis bûye sîyapoş
Serê Filamerzî girtiye baweş
789. Ziware zelîl e çeste şikeste
Pehlewanê dî ve mayne xeste
790. Wextê ji xew rabû Rustemê navdar
Qêrîn berdabû wî kiribû hawar
791. Zû Zer'elî hat gotê pehlewan
Çi le te qewmî bo min bike beyan
792. Gotî kurê min şah 'Evrasiyab
Yeqîn 'Îranê hemî kir xirab
793. Le xewnê da min dît Zalê 'extiyar
Le meydanî şerî digirya bi zar
794. Serê Filamerz Guderzî û hem Tûs

Lê bo siyapoş şahê Key Kawis

795. Min baş 'ezanim wêran e 'Îran
Be hîle tedbîra Pîranêt Tûran
796. Her nûke tu here cewab bide le şar
Le koçk û kolan û meydan û bazar
797. Hemû 'ehalî hazır bin be xoş
Le ber xo ken libas sor û qurmiz-poş
798. Can 'Elî çûbû cewab da le şar
Her çî dilêrê 'egîd bû siwar
799. Rustemê dilêrî şêrê tacbexş
Be kemenda muhkem bestî gelek Rexş
800. Siwarî Rexş bû hajot le sehra
'Alayêt sorî qurmuz helgira
801. Sîh hizar siwarî 'alayê leşker
Le gel Rustem da le şar çûne der
802. Menzil be menzil rê wan girt seher
Seyr kir qudreta Xudayê 'ekber

803. Layê dî 'ev care leşkerê Tûran
Du sed not hizar hatin bo meydan
804. Merdanê 'Îranê dîsa destû bird
Beyanê bo şer Xudan hazir kird
805. Şer ji nû herdu leşkerî be yekcar
'Ala helgirtin bo ceng û bêkar
806. Wan digot 'ax 'ax 'evro li meydan
Sergirdan dibin hemî palewan
807. Ji tirsê Ziwarey şêrî ku mihab
'Aciz û gembâr bû şah û 'Evrasyab
808. Behreman wekî dît zor 'aciz e şah
Rabû ji cihê xoy mel'unê bê rah
809. Gotî padişah tu hîç nexo gem
'Evro bi 'ewnê Danay Mu'ezem
810. Be dest dê girin 'evro Cihangîr
Le gel Filamerz neviyê Zalê pîr
811. 'Exsîr kem hemîyan le meydanê kîn

'Înime xizmetê şahê Tûran zemîn

812. Wextê 'eve got şomê bê kemal

Çû bo meydanê bo 'ewladê Zal

813. Nerîn û gotî bo leşkerê 'Îran

Kî ji wey 'aza ye bo min bête meydan

814. Cihangîr wek bihîst rabû çûbû der

Muyêt ser leşî wek niştera çûn der

815. Gotî 'ey mel'un şomê bed 'exter

Nûke ji destê min canit naçît der

816. Qesem bi Xudayê 'erd û 'esman

Leşê te wek sey dê 'êxime meydan

817. Behreman ji kerba destî da be gurz

Hejandî gurzê xo wek çiyayê berz

818. Berz kir û bilind berday ji hewa

Dana serê Cihangîr şêrê 'ejdeha

819. Tasê serî rakir şêrê pir hiner

Sitarya Xudê qet nedît zerer

820. Paşî be qehran şeş sed helqey kivan
Bo Cihangîr havêtin mel'ûn Behreman
821. Wekî çiyayî' ma le cihê xo da
Cihangîr le cih xo hîç wî la neda
822. Cihangîr kurê Rustem pehlewan
Girtî kemerbendê şomê bêîman
823. Le ser pişta hesp kirbû sernixun
Keftibû xarê wez lolo zebûn
824. Wextê 'ev dît Pîran 'emir da tiba
Gotî bi 'êk carî hicrûm kin siba
825. Du sed û not hizar siware leşker
Hicrûm da 'ewan Behreman 'îna der
826. 'Ev care Ziwar le gel Filamerz
Keftne nav leşker be şimşêr û gurz
827. Hicrûm wan dabûn wekû şêrêt mest
Zor wan lê kuştin zor desta lê best
828. Zalê zer le gel pehlewan vekan
Şikandin 'ewan hemî leşker Tûran

829. Be 'ewnê Xudayê (Ezîm Zulcelal)
Ser da çûne xarê her wekû 'amal
830. Tac û tumarên wan keftbûne xar
Leşêr ser daran bûbûne gulnar
831. 'Ew roje timam deh hizar nefer
Ji leşkerê 'Îran keftibûn bê ser
832. Sîh hizar siwar ji leşkerê Tûran
Kuştibûn hemû le 'erdê meydan
833. Tebla 'istirahet 'êvarî lêda
Leşkerê herdukan vegerya barega
834. Cihangîr fermû danin saz û 'aheng
Be dengî 'ûdê û tembûrê hem çeng
835. Leşkerê 'Îranî be keyf û mezaq
Key Kawis be şewq û şadî nemzaq
836. Şahê 'Evrasiyab maye sergerdan
Hinartî gazîkî 'ecele we Pîran
837. Wî gote Pîran malim bû xirab

Bidine min rê'ya baş û ya sewab

838. Huş min nemaye dilim bî be firar
Tedbîr ma çî ye bo min bikin 'izhar
839. Pîran bo gotî tu hîç nebe mehzûn
Cihangîr dê girîn be bê çend û çûn
840. Filamerz le gel Ziware be tiba
Le gel serdaran û 'Îran siba
841. Be mekr û hîle be sehr û tedbîr
Şert e hemûyan min bikeme 'êxsîr
842. 'Êqbala tu ye ke 'em kare kird
Rustemê xudan Rexş le naw bird
843. Ke hîç netirse ji nav dilêr e
Her sê kes hene her wekî şêr e
844. Bextê padşahî ger bêt û bidaw
Ger peyda nebit Rustem le 'ew law
845. Paşî karê min 'êk car bit zehmet
Ji ber Rustemî dilê min zelzelet

846. Şah 'Evrasiyabî gotî be Pîran
Şikur diyar nîne Rustem le 'Îran
847. Beyanî leşkerî tu zû bibe der
Belkû 'êxsîr kîn merdayê serwer
848. Mergê derhal da hingivîn beyan
Zû hazır bibin leşkerî le meydan
849. Le her çar teref destan bidene tîg
Le qelandina wan hiç neket derîg
850. 'Ev care beyanî li herdu la wekû
Leşker hazır bû be bê guftûgo
851. Rijiyane nav 'êk dilêran be kar
Wekî gelala ser keftine xwar
852. Le bigre bigre merdan xûnxwar
Le bikuj bikuje turkanî geddar
853. Bo behra xûnê zemîn û meydan
Xûnê mewc dida wekî behra ('Eman)
854. Leşkerê 'Îranê le meydanê kar

Zal û Key Kawis digiryan be zar

855. Herduka le binê 'alayêt meydan

Du'a wan dikirin be soz û giryan

856. Zâlî digot ya Xuday (Qazî-ul hacat)

Tu bi 'ezmeta xo key zû Rustem bihat

857. 'Îlahî geyrî te me nîne çi kes

Tu bidî quweta leşkerî bê kes

858. Zor rehîmê bike leşkerê 'Îran

Hem be Key Kawis padşahê Keyan

859. Ya Reb be hacet 'ewîlyayê kîram

Zererê nebînit 'ewladanî Sam

860. Bo xatira dilê biçûkêt (me'şum)

Be 'ah û nalîn pîremêrêt mezlûm

861. 'Ev care me bighîne lev banê gerdûn

Bizane qudreta Xaliqê Bêcûn

Beşê gehîştina Rustem be leşkerê 'Îranya û xo veşartina wî

û nenîyasîna wî be Cihangîr û çavpêkeftina wî be Zal û Key Kawis
ke zelîlî û çûna Rustem bo meydana cengê le gel leşkerê Tûraniya

862. Çavê wan be sehra ku dîtû peyda
Peyda bû tamam sîh hizar siya

863. Le nav leşker da Rustem pehlewan
Xo wî veşartî neviyê Nerîman

864. Kes temaşa kir Zalê 'extiyar
Hîvî û du 'a diket Perwerdigar

865. Çemyaye pişta wî her wekû kevan
Rûyê xo dana ser zemîn le meydan

866. Le lay rastê Zal padşayê keyan
We maye 'aciz û perîşan heyran

867. Wextê ku Rustem 'eve dît be çav
'Agirî tê berbû dilê wî tewaw

868. Wextê ku Rustem nêzîk bû le meydan
Dît nûciwanek wekî mangî taban

869. Bo zend û baska wekû Rustem bû

Li rûyê dunyayê wekî wî kêm bû

870. Ziwareyî dilêr le gel Filamerz
Le pişt wî şer diken dawêşînî gurz
871. Rustem 'eve dît 'êk car bû heyran
Nezanî kî ye merdêy nûciwan
872. Gotî 'îlahî kî ye 'em merde
Çendê ciwan e sipehî neberde
873. Le hemû 'axa 'Îran û Tûran
Min nedît hosa azaye pehlewan
874. Zor temaşa kird tacbexşî be gul
Coş û xiroş keftibû ser dil
875. Rexşê Rustem guh kirine qelem
Gelek firîjî her wekû 'elem
876. Helperî û şehî Rexşê pir xiroş
Zalê guh lê bo dilkulê pir coş
877. Gotî xelkîne 'eger bê 'eql im
Nûke dengê Rexşê hatî le guhim
878. Ladabû 'ev care Zalê 'extiyar

Zû xo gihande leşkerê Bilgâr

879. Be dilê şîn û pir le derd û gem

Wextê çavê wî keft be rexşî Rustem

880. Ke temaşa kirbû dît merdê qirmiz-poş

Siwarê Rexşî bû dilê hate coş

881. Gotî be Gurgîn Zalê 'extiyar

Zû zû bêj min tu 'aqil î û hişyar

882. 'Ev Rexş e yeqîn Rexşê Rustem e

Siwareke kî ye ber çavim tem e

883. Wextê 'eve bihîst Gurgîn Mulad

Ġem wî havêtin dilî da bebad

884. 'Ew çûbu pêş ve Gurgîn le siya

Temaşa kiribû serî ta piya

885. Destê xo havêt zulfa wî Rexşî

Perde wî lada le ruyê tacbexşî

886. Rustem ji ber hîle û filey Gurgîn

Gelek pê kenî da bezî le zîn

887. Gazî Zalê kir gotî 'extiyar
Mizgîn le te 'eve ye Rustemî navdar
888. Leşkerê 'Îranî le gel Zâlê zer
Ca dora wî girtin wek coxîna qemer
889. Şukur wan kirbû bo zatê Yezdan
Ku hatibûve Rustem bo 'Îran
890. Le paşan Rustem gotî be giyan
Rastîyê bêje min tu heqê Yezdan
891. Ciwanê berkeftî yekcar zîbawe
Yê le ser hespekî cihan piyaw e
892. Heta ku 'evrok le xakê 'Îran
Ber çavê min nekefte siwar hoy ciwan
893. Bêje min gelî xelk welate
Ji binemal kê ye le vî welate
894. Le nik we ye 'ewî nûciwane
'Eynen wekî Zorab şêrê meydan e
895. Zalê zer gotî ruhim fida bit

Hizarê wekî min qurban jê ra bit

896. Le (nuţfe) tu ye 'ew neviyê Zal e
Maye 'eşsan a Xuday (Zulcelal) e
897. Navê wî Cihangîr şêrê zeman e
Kurê kiça şahê Mazinderan e
898. Rustem wextê 'eve bihîst le Zal
Sucdeya şukrê bir bo Zâtê (Zulcelal)
899. Ğem hemî havêtin ji dil daye bad
Şad û şikur bo dîtinê 'ewlad
900. Ca le wextê leşkerê Tûran
Hicrûm 'îna bo ser sipay 'Îran
901. 'Aferîn bo Zer'elî 'ew çûbû meydan
Qêrîn berdabûn wekî şêr jiyan
902. Gotî Tûranî bibin 'agehdar
'Eve 'izra'îl e hat bo meydanî kar
903. Gazî kir gotî 'ey 'Evrasiyab
Dê çewa bît halê te malit bû xirab

904. Nik te ya we bû Rustemî mirdîye
Leşkerê 'Îranê hemî wek wî ye
905. Furset te dît û rabûy destûbird
Bo serê 'Îranê şeyxûn te kird
906. Be tehqîq 'evro roja mergê te
Tîr-baran de bibin le ser cergê te
907. 'Evro te dikujin le 'erdê meydan
Deng dê bilind bît tu nemay le cihan
908. Wextê 'eve bihîst paşay Tûran
Mabûve heyran 'aciz û perîşan
909. 'Emir kir gotî 'ey pehlewanan
'Ew sege kî ye zû kene tîr-baran
910. Lay dî Rustem wekî şêrê şerze
Leşkerê Tûranî wî kir şepirze
911. Le deng û şeday qirîtî Rustem
Leşkerê 'Îranî zêde bû ne kêr
912. Ziware tuq serê du sed pehlewan

Havêtin be bala le 'erdî' meydan

913. Rustem dest dabû be herb û be şer
Gurz dawêşandin kurê Zalê zer
914. Hicrûm berdabû ser leşkerê Tûran
Zor pehlewana kuştin le meydan
915. Ji ber gulê Rustem û qirpîn û şer
Rabû le Tûranyan wek roja meşer
916. Şah 'Evrasiyab le kîn û le qar
Ji tirsî Rustem wî nemabû firar
917. Le qar û xîvet le bir buğz û kîn
Gotî 'ey Rustem hizar 'aferin
918. Rustem wek gulê bû berdabû pêkenîn
Gazî kir gotê şah Tûran zemîn
919. Le nik te weha bû ku bê kes e Zal
Dê min zivirînî Xuday (Zulcelal)
920. 'Eve got 'ev care ji sed helqey kivan
Berda bo Rustem bo şahê Tûran

921. Şah 'Efrasiyabî zû kiribû firar
Le nav leşker da hîç negirt qirar
922. Leşkerê Tûranî 'êdî zebûn
Ser lê nemabûn be fitne der çûn
923. Ziware le gel Filamerz wek şêr
Keftine nav sipay Tûranê bêxêr
924. Le xoşya Rustem leşkerî 'Îran
Bêtirs birbûne leşkerê Tûran
925. Sed hizar siwar leşkerê Tûran
Kuştibûn bi destê leşkerê 'Îran
926. Belê ji leşkerê 'Îran bîst hizar
Kuştin li meydana herb gîrûdar
927. Leşkerê Bilgar xîvet wan hilda
Tebla 'istirahe' ev care lêda
928. Şahê Key Kawis sifre nû berda
Kirdî pîşwazî Rustem bi dil da
929. 'İhtiramê kird ji bo Rustem şah

Şah zor maçî kir rûyê 'Îran-penah

930. Şabaşî Rustem kire zîv û zer e
Dir û mirarî yaqut û gewher e

931. Leşkerê Îranê cema kir genîm
Li nav xo da teqşîm kir zêr û hem zîm

932. Merdanê Îranî yek yek hemûyan
Hatin bo xizmet Rustem pehlewan⁸⁰

⁸⁰ Ebdillah, Muhammed (komkirin), "Beyta Rustemê Zal" (Ji vehandina Mela Miştefa 'Oremarî), *Beytên Kurdî*, Çapxaneyê Wezareta Perwerdê, Hewlêr, 2001, r. 111- 171

ENCAM

Weke cureyekê destan, di edebiyata cîhanê de roleke mezin digire. Ji ber ku destan çawa ku me di vê xebata xwe da jî dîyar kir, beriya nivîse dest pê kiriye û nifş bi nifş hatiye veguhastin. Lewra destan neynika serdemekê nîşanî me dide. Di edebiyata kurdan de jî em bi destanan taybetiyên wê serdemê fam dikin lê destanên kurdan heta wexteke dereng jî derbasî nivîsê nebûne. Ji ber vê jî destanên kurdan bi awayekî devkî hatine parastin û li her deverê bi versiyoneke cuda hatine gotin.

Destana Rustemê Zal jî wisa ye. Versiyonên wê gelek in. Versiyona ku Heciyê Cindî jî berhev kiriye, ji versiyona me gelek cihê ye. Di vê xebatê de me lêkolînek kir li ser destana Rustemê Za. Ji ber ku ev destan gelek berbelav e, versiyonên wê yên cuda cuda hene. Em li ser versiyona Şahnameya Kurdî, xebîtîn. Em nikarin destana Rustemê Zal ji ber versiyonên wê yên cuda bixin qalibekê lê wekî me li jor diyar kir ev metna Rustemê Zal ji aliyê mijara xwe ve û ji aliyê rûxsarê ve destan e. Lehengê destanê Rustem û Cihangîr jî li gor teoriya Joseph Campbell dikarin bibin lehengên destanê. Me li gor teorîriya Campbell qonax û derbasokên destanê diyar kir û em gihaştin wê encamê ku ev metna li ber destê me destan e. Girîngiya vê metnê ew e ku bi zaravayê kurmancî hatiye nivîsîn. Ev jî xebata me sexlemtir dike ku di navbera transkîrîpsiyona metnê û di 'eslê metnê de wekî ji aliyê wate û peyvan de ferq nîne.

Ev metna kurmancî lê bi elifbêya aramî hatiye nivîsîn, me transkîrîbe kir, taybetiyên destanê ji aliyê naverok û ruxsarê ve me diyar kir. Lehengên ku di destanê de cih digirin, me dan naskirin û me dît ku serleheng destanê, vê metnê dikin destaneke epîk. Bi vê transkîrîpsiyonê me versiyoneka din a Rustemê Zal derxist holê em gihan wê encamê ku ev guhertoya destana Rustemê Zal bi kesayetên xwe, ji versiyonên farsî cuda ye. Ev jî resenbûna destanê diyar dike.

ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2013.

Anday, Melih Cevdet, *Seçmeler I*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 1992.

Aristoteles, *Poetika*, (İsmail Tunalı, wer.), Remzi Kitabevi, (ç. 7), İstanbul, 1998.

Aydınlı, Seccat, *Firdevsi'nin Şahnamesinde Kürtler*, (Erkan Çardakçı, wer.), Weşanên Avesta, İstanbul, 2012.

Aytaç, Gürsel, *Genel Edebiyat Bilimi*, Say Yayınları, İstanbul, 2003.

Behramî, Îrec, *Şahnamey Kurdî* (c. 2), Neşr-î Ana, Tahran, 1389/2000.

Belge, Murat, *Edebiyat Üzerine Yazılar*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2006.

Bin Mahmud Gorani, Mustafa, *Şahnamey Kurdî*, (Îrec Behramî, amd.), Intişarat-i Hîrmend, Tahran, 1383/2004.

Boratav, Pertev Naili, *Halk Edebiyatı Dersleri*, Tarih Vakfı Yayınları, Ankara, 2011.

Campbell, Joseph, *Kahramanın Sonsuz Yolculuğu*, (Sabri Gürses, wer.) Kabalıcı Yayınları, İstanbul, 2013.

Chamanara, Behrooz, (Pêşekî û Saxkirdinewe), *Şanamey Kurdî*, (ç. 1) (c. 1), dnd. *Rûsem û Zûrav*, Mang, Kerec, 1395/2016.

Chamanara, Behrooz, *The Kurdish Shanama and its Literary and Religious Implication*, amazon.com, 2015.

Çetintaş, Dilek, *Yeni Türk Şiirinde Destan*, (Teza masterê ya çapnebûyî), Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Erzurum, 2012.

Çobanoğlu, Özkul, *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Akçağ Yayınları, İstanbul, 2005.

Ebdillah, Muhammed (komkirin), “Beyta Rustemê Zal” (Ji vehandina Mela Miştefa 'Oremarî), *Beytên Kurdî*, Çapxaneyê Wezaretê Perwerdê, Hewlêr, 2001.

Ebutalib, Mirabdini, *Sedîqiyân, Mehindot, Ferhengê Esatirî-Hemasî İnan be Riwayetê Menabi'e Bed ez İslam*, (c. 2), dnd. Keyaniyan, Intişarat-i Pejuheşgahê Ulumê İnsanî ve Mutale'atê Ferhengî, Tahran, 1386/2007.

- Efşarî, Mihran, “*Cehangîrname*”, *Danışnamey-i Cehan-i İslam*, (c. 11), 1393/2014.
- Ekberî, Mefaxir Areş, *Rezmnameyê Kenizek*, Merkez-i Daîretu-l Me’arif Buzurgê İslamî, Tahran, 1395/2016.
- Kefeli, Emel, *Metinlerle Batı Edebiyatı Akımları*, 3F Yayınları, İstanbul, 2007.
- Kenduleyî, Elmasxan, *Sigu Siyaweş*, (Seydarman Dekey, amd.), (ç. 1), İntişarat-i Metn, Tahran, 1396/2017.
- Madeh, Qasim, *Cîhangîrname*, (Z. Seccadî, amd.) *İntişarat-i Danişgah-i Tahran*, Tahran, 2001.
- Mem, H, *Rastiyên Destana Memê Alan*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2006.
- Mensur, Yaqufî, (wer) *Berzuname*, *Şahnameya Kurdi*, İntişarati Qoqnus, Tahran, 1391/2012.
- Pospelov, Gennadiy, *Edebiyat Bilimi*, (Yılmaz Onay, wer.), Evrensel Yayınevi, İstanbul, 2005.
- Propp, Vladimir, *Masalın Biçimbilimi*, (Mehmet Rifat & Sema Rifat, wer.) Türkiye İş Bankası Yayınları, İstanbul, 2011.
- Ritter, Hellmut, *Doğu Mitolojisinin Edebiyata Etkisi*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2011
- Şişman, Bekir & Kuzubaş, Muhammet, *Şehname'nin Türk Kültür ve Edebiyatına Etkileri*, Ötüken Yayınları, İstanbul, 2012.
- Uzun, Mehmed, *Dengbêjlerim*, Gendaş Yayınları, İstanbul, 2005.
- Vali, Shahab, “Nêrîneke Giştî li Şahnameya Firdewsî û Şahnameya Kurdî”, dnd. *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, (Ramazan Pertev, wer.) Weşanên Avesta, İstanbul, 2015.
- Vali, Shahab, *Kurdên Yarsan*, (Sevda Orak Reşitoğlu, wer.) Weşanên Avesta, İstanbul, 2018.
- Xeznedar, Maruf, *Mejûy Edebî Kurdî*, (c. 1), (ç. 2), Dezgay Çap û Belawkirdinewey Aras, Hewlêr, 2010.
- Yaheqî, Muhemmed C., *Ferhengê Esatîr ve Dastanvareha der Edebiyatê Farsî*, İntişarat-i Ferhengê Muasir, Tahran, 1386/2007.
- Yazıcı, Tahsin, “Destan”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, (c. 9) Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul, 1994.

Yetiř, Kazım, “Destan”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, (c. 9) Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul, 1994.

Yıldırım, Kadri & Pertev, Ramazan & Aslan, Mustafa, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin, 2013.

Yıldırım, Nimet, *İran Edebiyatı Başlangıçtan İslamiyete Kadar*, Pinhan Yayınları, İstanbul, 2017.

Zavotçu, Gencay, *Klasik Türk Edebiyatı Sözlüğü*, Kesit Yayınları, İstanbul, 2013.

Çavkaniyên Elektronîk

Quran, <http://www.multimediaquran.com/quran/turkce/cuzler/cuz29/arap-561.html>

Cindî, Heciyê, “Şaxêd Destana Rustemê Zal”, <http://krd.riataza.com/2017/04/16/>

Öcal, M. Oğuz, “Destan Tanımı ve Eski Türk Destanları”, *Milli Folklor Dergisi*, 2004, http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/m_ocal_oguz_destan_tanimi_eski_turk_destanlari.pdf

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
İNTİHAL RAPORU

Tez Başlığı: DESTANA RUSTEMÊ ZAL (METN-LÊKOLÎN)

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 187 sayfalık kısmına ilişkin 11/11/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından Turnitin adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dahil % 2

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça hariç

Alıntılar dâhil

5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar

Açıklamalar: Benzerlik oranının %2 internet kaynakları ve %1 de öğrenci kaynaklarından oluşmaktadır.

Mardin Artuklu Üniversitesi Turnitin adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Rojbir Çalışır

Öğrenci No: 16711009

Tarih ve İmza

Programı: Kürt dili ve Kültürü- tezli yüksek lisans

Statüsü: Yüksek Lisans

Danışman Onayı

A.B.D. Başkanı Onayı



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

RÜSTEM-İ ZAL DESTANI

(METİN-İNCELEME)

Rojbir ÇALIŞIR

16711009

Danışman

Dr.Öğr.Üyesi Shahab VALİ

Mardin 2019